çîrok

SERDAR ROŞAN

Dara gozê

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

Dara gozê

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Dara gozê

SERDAR ROŞAN

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

Serdar Roşan: Dara gozê

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Serdar Roşan û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-00-0

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

Nêverok

Nameyek ji bircên Amedê 7
Êvara newrozê 7
Li asîmanê Amedê 8
Roja newrozê 9
Piyes 11

Dara gozê 12
I - Dêwê Gola Qorqor 16
II - Bro û »dibistan« 20
III - Bihar û eskerên reş 24
IV - Evîn, xweşî û zilm 27
V - Epîlog, Dara gozê 33

Çiyayê Zêrkan 34
Çîrokên Çiyayê Zêrkan 36
1 - Bajarê qedîm 36
2 - Şêrko 38
3 - Pîra Esma 40
4 - Newala cinan 42
5 - Hahîîîhîîî 46
6 - Xwe gij bike 48
7 - Heqê mesrefê 49

Komûtan 51
Jiyaneke weha bê mane ye! 55
Dergeha Evîndaran 58

BEŞÊ KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ)

Bircanê Diyarbekirî ra mektubêke 71
Şewa newrozî 71
Di asîmanê Diyarbekirî de 72
Rocê newrozî 73
Piyes 75

Gozêre 76
1 - Hûtê Gola Qorqorî 80
2 - Bro û »dibistane« 84
3 - Wesar û eskero siya 88
4 - Hezkerdiş, rindî û zilm 91
Epîlog - Gozêre 97

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Nameyek ji bircên Amedê

Biracan,
Belê, newroz îsal ji salên berê guhertî hate pîrozkirin. Çend meh berê Belediya Diyarbekirê li ser daxwaza rûniştvanên bajêr biryar dabû, da ko newroz bi şêweyeke dewlemend bête pîrozkirin. Vêca ez dê li gorî ko zimanê min bigere, taqeta min ya nivisînê dest bide, ji we re şahî û şêweya pîrozkirina newroza îsal binîm ziman. Bi nivîsê, bi kelîmeyan liberçavraxistina şahiyên newrozê bi hemî xweşî û rengan di vê nameyê de dijwar e. Lê ji ber xusûsiyeta namenivisînê van rêzên han dinivîsim. Heke paşê wextê we hebe û hûn li fîlmên şahiyên newrozê temaşe bikin, hûn dê têbigêhin mebesta min çi ye.

Ez dixwazim şahî û pîroziyên vê rojê di bin çend xalan de nîşan bikim. Li vir ev tiştên, ez dê ji bo we bînim ber çavan ne yên ko tenê min bi xwe dîtine, herweha şahiyên ko li cihên din çêbûne jî bi rêya hevalên xwe ez dê ji we re diyar bikim. Bêî ko dirêj bikim û serê we biêşînim, de ka werin em bi hev re rasterast herin temaşeya operaya Memê Alan.

Êvara newrozê

Êvara newrozê, piştî ko tariyê erd hilçinî, di saet heştan de, li navenda tiyatroyê operaya Memê Alan dest pê kir. Li salonê cihekî tenê jî vala ne mabû. Li gel ko navenda tiyatroyê ciheke mezin e jî, cardin mirov dil dikir ko saloneke mezintir dê çêtir bana. Ji ber ev cara yekemîn bû ko destana Memê Alan li bajarê Amedê bi awayeke rêkûpêk li pêş çavan mîna tabloyeke rengîn ko hunermendek rengên xwe li ser tabloyê bi sebir û diqet bi cih bike dihate vejandin.

Herçiqas êvara newrozê bi sedan kes li ber deriyê navenda tiyatroyê, ji bo ko bilêtek bi dest bixin civiyan jî, çi mixabin hêviya wan bi cîh ne hat. Ji xwe bilêtin vê şevê du meh berê xilas bû bûn. Dihate gotin ko vê carê peyayên bazara reş, reşfiroş bêkar mabûn.

Ez pir dilşikestî me, ji ber ko ez nikarim vê Operayê bi nivîsê, bi hemî

huner û xweşiya wê û di wexta temaşekirinê de ew hestên bi mirovî re peyda dibin, bînim ziman. Lê belê gava mirovî temaşayî operayê dikir, mirov diçû dinya û jiyaneke din. Li wê dinyayê mêr hebûn bi xof û heybet bûn. Jin hebûn bi rindiya xwe horî bûn. Mirov geh li buhiştê geh li dojehê bû. Geh li xewnên şêrîn, geh li zindanê bû. Xewn û xeyal, tirs û heybet, mêranî û bêbextî, qencî û nerindî, hejarî û dewlemendî, hevaltî û neyarî, evîndarî û kîndarî, bi kurtî te digote mirov birek ji dîroka însaniyetê dijî. Hemî ev şêweyên tabloyan li ber çavên mirovî şikil digirtin û dihatin guhertin. Bi rehetî ez dikarim bêjim ko rihê dengbêjên me yên koçkirî şah bû. Dengê hunermendan pêl bi pêl, di nav gelî û newalan, di ser çiyan re li asîmanê welatê me bi çar aliyan ve xweşî û şadî belav kir. Dibêjin, îşev li asîmanê çiyayê Agrî, stêrka Ehmedê Xanî ji her şevê bêtir şewq dida. Gelek kes kelegirî bûn. Keçên ciwan ji ber evîna Mem û Zînê di wê salona tarî de bihar û payîz bi bîr anîn. Xortên ciwan ji wan ne kêmtir bûn. Heke dest bida dê gelek ciwanmêran êriş bibirana ser sehneyê ji bo tolhildana Memê. Belê, mirov nizane di temaşa vê operayê de çi his bi temaşevanan re peydabûn. Tenê Xwedê û hisdarên me dizanin kîjan hest di ruhê wan de vejiyan...

Di êvara newrozê de televîzyonê ev opera yekser nîşan dida. Kesên ko ne karibûn biçin temaşeyê qîma xwe bi televîzyonê anîn. Lê divê bête gotin ko piştî bidawîbûna operayê, vê êvara newrozê temaşevanên operayê, bi xeyalên cûr bi cûr xwe berdan nav tarîtiya şevê. Her mirovek bi xeyal û hêviyên xwe, bi raman û daxwazin xwe kêfxweş an xemgîn...

Helbet pîrozkirina newrozê ne tenê bi operaya Memê Alan dihate pê. Piştî operayê li ser daxwaza hin hevalan em li helîkopterekî siwar bûn da ko em gerekê li asîmanê Diyarbekirê pêk bînin û fekin, ka di vê şeva tarî de ji bilindahiyê bajêr çawa xuya dike. Li min bibihurin. Ez dizanim taswîreke têr nahête pêş. Lê wek min berê jî gotibû ez dê hewl bidim da ko bi kêmasî dîmenekê li ber çavên we biafirînim heke ev dîmen pir rengîn ne be jî.

Li asîmanê Amedê

Belê, em bi helîkopterê li asîmanê Diyarbekirê di tariya şeva newrozê de digerin. Ji siûdê me re, tu ewrek li asîman naxuye. Şeveke çîlsayî. Li asîman stêrk bi hemî xweşiya xwe li me temaşe dikin. Ji her şevê zêdetir bi ronahî ne. Tu dibê qey ew jî îşev newrozê bi me re pîroz dikin. Ji jor de

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

em temaşe dikin, bajar di nav rengan de maye. Ma gelo ev heftreng e, di vê şeva tarî de xuya dibe?! Na na. Ev heftrenga me ye. Heftrenga newrozê ye. Belê, gava em nêzîkî li bajarê Amedê yê kevin, bircên li bajêr pêçayî dikin, bi xweşiya dîmena xuyayî mirov dikeve nav xeyalan. Bircên Diyarbekirê seranser hatine xemilandin. Ronahî wek avê diherike. Bircên rengîn li ber çavên mirovî şiklên pircûre distînin. Carina wek keziyên hunandî yên Xeca li çiyayê Sîpanê dihêne xuyakirin. Heger mirov hay jê nebe ko di helîkopterekê de ye, bê guman mirov dil dike ko xwe ji jor berde nav vê daristana keziyan... Bi tevgera helîkopterê îcar wêneyeke din dihê vejînê. Bircên Amedê kofiyên jinên kurdan dihînin ber çavên mirovî. Ew kofiyên rengîn, bi zêran xemilandî xuya dibin. Amed li ber çavên mirov dibe wek jineke bedew, ko di tariya şevê de dilive. Avahiyên bilind, keziyên hunandî, bircên belek tabloya hunermend temam dikin. Dilê mirov bi pêl dibe, germbûna canê mirov bihêzgerîna xwînê dixe bîra mirovî. Em li asîmanê Amedê, bi dilekî germ li dilê bajêr temaşe dikin...

Li rojhelata bajar çemê Dîcle diherike. Ji ber ronahiya bajêr, dema mirov ji jor mêze dike, dibîne ko Dîcle bi şêweyeke din diherike, ronahiyê ava Dîcle guhertiye. Ji pêl û herikandina avê nebe ez dê bêjim ew ne Dîcle ye... Agirê newrozê li ser birca bakûr ya herî bilind bi hemî pîroziya xwe ber bi asîmanî pêl dide. Tu dibê ji bo rizgarbûna Memo, Tacdîn xaniyê xwe şewitandiye. dî Padîşah li ser siniya ber xwe kakilên gozan nabîne. Agirê newrozê nema dara gozê tenê dihêle. Li asîmanê Amedê fîşekên hewayî diteqin. Belê, bi rengên guhertî li asîmanê bi fîşekên hewayî »newroz Pîroz Be« dihête nivisîn. Li bin asîmanê Diyarbekirê di vê şeva tarî de gelek tişt xuya dibin... Ez serê we neêşînim.

Roja newrozê

Wek hûn dizanin roja newrozê em kar nakin. Cejn e. Piştî taştê em çend heval bi hev re derketin nav bajêr. Me got ka em binêrin di vê roja xweş de diyarbekirî çawa newroza xwe pîroz dikin. Me berê xwe da nav bajêr, bajarê qedîm. Li gel ko ne pêwist e ez bêjim jî, lê rûniştvanên bajêr bi cilên xwe yên neteweyî rengekî din didan vê rojê. Li ser riya xwe em pê hesiyan ko di nav bajêr de trafîk rawestaye. Paşê ji me re gotin ko ji ber şahiyê li nav bajêr trafîk dane rawestanê.

Belê, ez çawa bêjim. Ji çar aliyên Amedê dengê def û zirnê bilind dibû.

Di vê roja xweş de li ser daxwaza belediya Diyarbekirê ji belediyên bajarên me yên din grûbên govendê hatibûn hinartin. Nuha ji çar aliyên bajêr ev grûbên govendê bi lîstikên xwe yên mehelî, bi hunermendî li kolanên Amedê ber bi meydana Şêx Seîd diherikîn. Her grûbek bi kêmasî ji sed kesî pêk hatibû. Xortên çeleng, keçên bedew mil di milê hev de pêl bi pêl di tevgerê de bûn. Te di got qey mêrgên zozanan yên Serhedê ne, bayekî sivik vê deryaya gul û kulîlkan dihejîne. Xelkê bajêr li kêlekên riyan temaşeyî wan dikir. Hin caran, bi tilîlî û çepikên xwe, ew jî beşdarê govendê dibûn.

Piştî grûbeke govendê grûbên tiyatro yên pêkenînê derdiketin. Herçî bi derketina wan komikan, zarok gelekî kêfxweş dibûn. Zarokan bi hewar û qêrîn dixwest li ser milên mezinên xwe temaşeyî wan komikên qeşmeran bikin. Bi rastî wan grûbên pêkenînê jî kêfeke cuda dida vê rojê û ji ser kêfa zarokan re tiştekî tune bû. Zarokan bi gulvedanek rengîn kêf dikir û dikeniyan...

Piştî demekê ew grûbên govendê, hemî gihaştin meydana Şêx Seîdî. Li wê derê serokê belediyê axaftineke kurt kir. Piştî axaftinê vêca hemî grûban bi hev re, bi heft def û zirneyan govend girêdan. Bi vê dîmena xuyayî sosin, beybûn, pirpizêk, nêrgiz û gulvedana darên behîvan dihate ber çavên mirovî. Vê deng û dîmenê, wek vejîn û xumîna tebîetê ko di bihara welatê me de rûdide, bi şêweyeke tesîrkar di kurahiya hestên mirovî de xwe dida hiskirinê. Herê hûn dizanin û min berê jî gotibû; ez êdî nikarim vê tabloyê bînim zimanî. Xwezî şaîra me ya bi nav û deng, Binevşa Xezalê li vir bûya û ji bedêla min wê ji we re binivîsiya...

Li der û dora Diyarbekirê, amedî li seyrangehan, li nav gul û kulîlkan, newrozê bi şahiyên renga reng pîroz dikin. Lê li vir berê ko ez ji bîr bikim, divê ez bêjim: Îro roj roja evîndaran e. Yên evîndar xwe ji malbatên xwe bi dûr diêxin, da ko nêzîkê dildarên xwe bibin. Bi sedan keç û xortên Amedê li rex çemê Dîcle dest li destê hev, di nav xewn û xeyalan de, bi gotinên şêrîn bi hev re dipeyîvin, ramîsanên hingivîn ji hev dixwazin... Gulên sor, gulên pembe û xemrî dibişkifin. Çemê Dîcle bi bar e, barê wî giran e, lê bi ken û kêfxweşî diherike. Ji Mem û Zîna Cizîra Botan re silavên keç û xortên Amedê dibe. Evîndar bi hêviya ko bêgehêjin Mem û Zînê qevdê kulîlkan, nêrgizan, gulên sor û xemrî diavêjin çemê evînê... Û dibêjin her sal di bîst û yekê Adarê de Mem û Zîn divejin û li kolanên Cizîra Botan, li rex çemê Dîcleyê tenê ji yên evîndar re xuya dibin...

Ji birçînan em gêj bûn... Ji kêf û şahiya vê rojê me xwarin ji bîr kir. Em

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rabûn çûn malê. Me bêhna xwe stend û piştre li kêleka sifreyeke mîrane em rûniştin me xwarin xwar... varê em dê herin stadyûma mezin.

Piyes

Belê, em nuha ketine hundirê stadyûmê û em li cihê xwe rûniştine. Hinek paşê dê program dest pê bike. Program ji çend babetan pêk dihê. Lê ez dê tenê ji we ra behsa piyesa Padîşahî bikim. Piyes ji alî Navenda Kulturê hatiye bidarxistin û bi şêweyeke hevdem hatiye şirovekirin. Li stadyûmê cihê vala ne maye. Nêzîkê bîst hezar temaşevan dê li piyesê fekin. Herweha tv jî dê yekser vê lîstikê nîşan bide.

Belê, piyes bi kêmkirina ronahiyê û bi musîkeke xof dest pê dike. Pêlên ricfê mirovî digrin. Padîşahek bi hemî xof û nerindiya xwe, bi tevî leşkerên xwe ve dikeve hundir. Em niha li dinyayeke din, dinyayeke kevnar, ji vir bi hezar salan berê dijîn. Pêlên ronahiyê, cil û bergên padîşah û leşkerên wî, motîfên xuya dibin hemî bi hev re wan hestan bi insanî re çêdikin. Lîstikvan dipeyîvin, lê em dengê wan nabihîzin. Ji tevger û musîkê tiştên ko rûdidin mirov ji seyra piyesê fahm dike. Ji çar aliyên meydana piyesê hêdî hêdî mirovên din xuya dibin. Jiyana însanên wê demê xuya dibe. Em hesinkar, goçkar, şivan, cotyar, rezvan û gelek birên din ji xelkê dibînin. Padîşah ne rahet e. Eskerên wî di lez û bezê de ne. Pêlên xofa leşkerên padîşah tirsek mezin di nav xelkê de peyda dikin. Her roja ko diçe rûyê zemîn ber bi dojehê ve tê guhertin. Jiyan dibe ezabeke giran... Piştî demekê ji xelkê hin mirov dikevin tevgerê... Musîk mirovî dihejîne... Ji çar kenarên stadyûmê deng dihê... Çirûskên agirî dixuyên... Tîrêjên ronahiyê carna geş dibin. Bi kefteleftekе mezin, di nav mij û duxanê de, ronahî tarîtiya şevê hiltîne. Padîşah û eskerên wî nikarin xwe li ber agirî û tîrêjên ronahiyê biparêzin. Musîk dihête guhertin. Kêfxweşî û şahî him bi musîk him jî bi piyesê dihê pîrozkirin... Bîst hezar temaşevan li çepikan didin... Amedî ji »dîroka« xwe rûpelin dijîn. Bi serbilindî û xemrevînî ji stadyûmê bi derdikevin. Ne dûr e ko wekî min di xewnên gelek temaşevanan de jî, piyes bête dubarekirin...

Bi kurtî û bi giştî newroza me ya îsal li bajarê Amedê bi vê şêweyê hate pîrozkirin. Careke din newroza we hemiyan pîroz be. Her roja we bi şahî û kêfxweşiyê ji xeman bi dûr bi dawî bê.

Diyarbekir, 21.03.2021

Dara gozê

Ez li gundekî bi cih bûme; jiyana min, mala min, xweşî û nexweşiyên min, derbasbûna min hemî li vê derê ne. Dixwazim berî ko ez behsa xwe bikim, bi kurtî be jî, gundê xwe bidim naskirin. Berî ko ez bêm dinyayê û rehên xwe bera erdê bidim û bi xweşî li ser rûyê zemînê şax bidim û bilind bibim, avakarên vî gundî hatine li vir bi cih bûne û ev gund ava kirine. Di xortaniya xwe de, min carekê dil hebû ko ez ji gundiyan bipirsim ka gelo ew ji ko hatine, berê li ko bûn, lê çi mixabin min cesaret ne kir. Min got ew dê bi min bikenin; henekê xwe bi min bikin; dê bêjin tu kî yî, yê ko jiyan daye te em in; tu li ber destê me mezin bûyî; tu çawa pirsên welê ji me dikî!

Ev gundê ez tê de dijîm li quntara çiyayekî bilind hatiye ava kirin. Erê rast e pir ne bilind e, lê li gorî der û dora xwe çiyayekî berz dihê qebûlkirin. Li quntara çiyê bi firehî yek-du û bi dirêjahî bi çend km pehnahiyek heye. Biniya vê pehnahiyê bilindahiyek -ku ji zincîra kevir û zinaran pêk dihê- mîna dîwarekî tebiî li biniya gund seranser rêz bûye. Ev cihê gund lê avabûye dişibe sedirekê; tu dibê qey ev gundê ha li ser vê sedirê rûniştiye; pişta xwe daye çiya û lingên xwe jî ber bi jêr ber dane. Li gorî gundên der û dor mezin e. Ji jor, serê çiyayî xaniyên gund mina meydaneke fireh xuya dibin; ji lewre serbanê wan bi hev ve girêdayî hatiye avakirin û pirrê caran dîwarê kêlekan bi cîranan re şirîk hatiye danîn. Kuçeyên navbera komikên xaniyan teng in û ji dûr zêde xuya nabin.

Zivistanan hewa sar e; berf gelekî dibare; ji rojingên xaniyan duxaneke tenik bilind dibe; ji xwe gava yekî xerîb ji gundên pişt çiya bê û ji jor, ser çiyê, mêze bike eger ji duxan nebe dê bîr nebe ko gundekî mezin di bin berfa zivistanê de bi cih e.

Hin bilindahiyên çiyê bi darên mazî pêçayî ne; lê hêla rojava rût û qut e. Niha jî baş tê bîra min, heta dema xortaniya min, ev der û dor hemî daristan bûn. Wê gavê gundê me jî ne zêde qelebalix bû. Di nav wan daristanan de her cure teyr û tilûr, heywan û dirinde peyda dibûn. Gurên har carina dihatin nêzîkî gund û dizûriyan. Daristan warê hirç û berazên nekedî, rovî, kuze, kerguh, sihûrî û gelekên din bûn; li nav daristanê ev

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

cûre heywan li dinya xwe dijiyan. Li ser dirindeyan gelek meselok û çîrok hene; lê niha ne wext e ko ez behs bikim. Bi mezinbûna gund, zêdebûna rûnîştevanan, vekirina erd û jêkirina daran ew daristan winda bûn. Niha mîna seriyekî gurrî li vir û li wir çend dar mane. Ez ji we re sirekê xwe bêjim lê ji kesê re mebêjin. Bi rastî ez gelekî ditirsiyam; min digot wê rojek dor bê min jî, dê werin serî min jî bifirînin; ji xweşî û bextiyariya dinyayê min bêpar bihêlin; ji ber ko li ber çavên min çend xwîşk û birayên min bi xîzarên mezin di erdê rakirin. Ez bi rojan giriyam. Girîna min him jibo wan him jî bi halê min, ji tirsa min bû. Lê şikir ji Xwedê re heta niha dor ne hatiye min.

Ber bi rojhelat çiya ji bilindahî û newalan pêkdihên. Li hêla rojhelat bilandahiyên zincîra çiyan bi carekê qut nabin; xwe bi dirêjahiya bi deh km domdikin. Quntarên bilindahiyan bi rezan pêçayî ne; di nav rezan de cihina darên hirmî û behîvan bilind dibin; ji hêla tirî û berhemên ji tiriyî gundê me gelekî dewlemend e.

Ji cihê xwe ez hemî wan gund û gomên ko li hêla bakur hatine avakirin dibînim. Ji me ne gelekî dûr in. Dûrbûna hin ji wan ji gundê me bi meşê qasê saetekê yên dî jî du saetan rê ye. Gundên ko li paş çiya dikevin ji min ne xuyane; derheqê wan de zêde tiştekî nizanim; lê gava hin mirov ji wan gundan bi mêvanî dihên gundê me, ez bi dizî be jî hin zanyariyan ji wan werdigirim. Gundiyên min û mêvanên ji wan gundan ji xwe re dikevin nav sihbetê, bi saetan bi hev re dipeyîvin; behsa pez û dewaran dikin; li ser erd û zeviyan, rez û bexçan diaxifin. Ew dibên qey hema ew dipeyivin û gotinên wan winda dibin, diçin. Lê ne rast e. Ez şahidê wan im. Dengê ko ji devê wan dertê li hewa belav dibe û pêl bi pêl digêje min. Ez jî bi vî awayî ji şolên wan haydar dibim.

Hûn zanin ez ji çi pir hez dikim? Rebenên Xwedê ma hûn dê ji ko zanibin. De hema bêî ko ez we aciz bikim, ez ê bêjim. Ez ji govendên wan û herweha ji şevbuhêrkên wan yên dawiya payizê û zivistanê hez dikim. Her şev li malekî kom dibin û dipeyîvin. Xwediyê malê li gorî taqeta xwe ji mêvanên xwe re bastêx, benî, mewij û mêweyên hişk, goştê lepikan, dendikê behîvan û gozan li ser siniyê rêz dike. Eger di şevbuhêrkên wan de dengbêjek jî hazir bibe wê gavê kêf kêfa cemaetê û ya min e. Bi bilindbûna dengê dengbêj re bêdengiyeke xwe berdide ser gund û tu dibê qey kesek nefes nade û nastîne. Carina ez difikirim, gelo ev gundî çima hewqas ji van kilaman hez dikin? Eger hûn zanibin û ji min re bêjin ez dê gelekî kêfxweş bibim... Govend. Qet ne bêjin. Ma ji dawetan xweştir çi

heye, gava gundî hemî bi hev re dawetê digerînin; jin, mêr, keç, xort û zarok hemî li meydana dawetê bi şahî kêf dikin û keç û xort bi dilekî lerzok nêzîkî hev dibin; dest di destê hev de xwe dihejînin; ez jî bi vî halê xwe beşdarî şahiya wan dibim; bi pel û şaxên xwe li ber bayê sivik pêl didim. Yek ji xweşiyên dawetan jî, êvaran di dîlanê de li hemberê hev (bêrîte) gotina stranan ji alî du refên govendgêran e. Ya din jî di derengiyên şevê de lêdana bilûrê ye. Bilûrvan bi nazdarî bilûra xwe ji berîka xwe derdixe; hêdî hêdî di nav lêvên xwe de bi cih dike û bêdengiya şevê bi bilûra xwe dişikîne; çîrok û serpêhatiyan bi bilûra xwe dilorîne. Gava bilûrvan şerê gur û seg lêdide tu dibê qey bûyer vaye li ber çavên wan hemî guhdaran diqewime; dema gur zora seg dibe bilûr bi xemgînî û bi êş deng derdixe; ji ruyên wan dixuyê ko guhdar jî li bin tesîrê ne; lê wexta seg zorbirî li gur dike êdî bilûr dikele; şahi ye; pê re rûyê guhdaran vedibe...

Tu rastiyê bêjî, eger ji van govend û şevbuhêrkan nebe li quntara vî çiyayî kuştina wext wê gelekî dijwar be. Li ber bayê bakûrê û berfa zivistanê ez bi van şahî û sohbetên wan germ dibim û sebra xwe tînim. Ma ew jî tunebana Xwedê zane dê çiqas hucreyên canê min bimirana...

Ez bi hebûna xwe deyndarê vî gundî me. Bi saya rûniştevanên wî ez heme û dijîm. Ji lewre ji wan gelekî hez dikim. Çewa ez hez nekim. Kî di şûna min de be, dê her welê bêje. Ez û ew, em bûne dost. Çi baş çi xirab gelek tiştên me têkel bûne; me di zivistanên xedar û havînên hişkegerm de, bi hev re, di ber xwe daye; li vê dinyayê tu kesekî nikare me ji hev biqetîne. Ez wan hemiyan baş nas dikim. Piçûk heta bi mezinên wan, pez û dewarên wan, keç û xortên wan hemî bi min re bi şêweyekî şirîk in. Tu lehzeyekê tune ko ez ji hawirdor tiştekî ne bihîsim an jî nebînim. De vêca ji we re çi bêjim; êdî hûn dizanin em çiqasî nêzîkî hev in.

Ez xwe dêspêrim wijdanê we xwendevanan û berê gotinan piçekî ber bi xwe ve badidim. Ji kengî ve ez li vir im, çawa li vir bi cih bûme nayê bîra min. Ji lewre li min negirin. Tu rastiyê bêjî ez gelekî kal bûme; wek hûn dizanin dema mirov kal dibe êdî nikare her tiştî bi bîr bîne. Ne dûr e ko bi sedan zivistan û havîn min dîtine. Carina difikirim. Ma gelo mimkun e ko mirov hertiştê jiyayî bi bîr bîne. Hûn ji min pirs bikin, eger bi temamî nebe jî bûyerên girîng zû bi zû ji bîra mirovî naçin. Ew bûyer xwe di quncikekê zanyariya mirovî de didin ser hev; bi sebir li hêviya roja xwe disekinin. Eger siûdê wan hebe rojek ji rojan pêlên lêgerînê û bîranînê digehîjin quncika wan û bi awayekî dilxweş an jî xemgîn wan divejînin. Bi

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vejîna wan kevnezanîn û jiyandeyan mirov careke din dijî. Hin mirov bi kêfxweşî vê yeka han her roj bi bîr tînin; di çarçoweya mejî û fikrî de tenê be jî, vê yekê her dubare dikin û pê sebra dilê xwe dihînin. Lê her car mirov rastê kêfxweşî û rindiyê nayê; carina bê hemdê mirov be jî, bûyerên tehl, bûyerên bi kul û derd xwe berpêş dikin û mirovî dixin nav torra xwe. Bi kul û keser mirovî dihejînin; xemgîn dikin. Herçiqas mirov dixwaze ji van bîranînan lehzeyek zûtir rizgar bibe jî, lê ev karekî ne hêsa ye. Loma ez neçar im behsa bûyerên rind û nerind, dilxweş û xemgîn, tehl û şêrîn ango hemî cûre bûyeran bikim; ma jiyan bi xwe ne ev e?

Eger rojek ji rojan di demsala bihar an havînê de riya we bi mekanê min bikeve, werin li cem min pal bidin û guh bidin min, wê gavê hûn dê mebesta min têbigêhin. Bi rastî bi carekê tenê jî çavên we bi min bikevin hûn ê hemî jiyana min ya bihurî di qermîçokên rûyê min de bibînin. Di bin van qermîçokan de deste bi deste jiyana min û herweha bûyer, serpêhatî û bîranînên min bi cih in.

De ka werin ez û hûn em li kêleka hev rûnin, qasê ko ez karibim û taqeta min dest bide; ez dê ji we ra bîranînên xwe bêjim. Lê wek hûn dizanin, ev tiştên ko ez li vir behs bikim bi piranî di payîza jiyana mirovî de xwe dilivînin. Ew jî naxwazin bê wesîqe û qeyd koç bikin. Ji lewre xwe dilivînin û dixwazin eger bi nivisê ne be jî, bi şêweya kultur û zanîna devkî, di zanîna hin mirovên din de jiyana xwe bidomînin û di zincîra bîranînan de cihê xwe bigrin.

Ma hûn dibêjin heqê wan tune ye? Ka ji min re bêjin, gelo tiştek an kesek heye ko bi daxwaza xwe bêî ko rêç û kevnepoşek li pey xwe bihêle, serê xwe hilde û ji vê dinyayê koç bike? Hûn ji min pirs bikin ez bi xwe bi vê yekê ne bawer im. Ji lewre her tiştê ko heye hertim di hewldanekê de ye, da ko karibe xwe bide jiyandin û berdewamkirin. Ji ber vê yekê ji erd heta bi asîman heqê bîranînan jî heye ko ew jî bixwazin hertim xwe nuh bikin û bên vejîn.

Pêlên hizirkirinê di serê min de bi van gerrînekan doş dibin diherikin. Herê, tu bi xwedê tu çi dibêjî, ev yeka hanê dikeve serê te, ango ji te re meqûl e, tu û kêfa te, eger tu meraq nekî ka ez dê çi bêjim, te divê hema li vir bêî ko tu rêzek tenê jî bidomînî xwendinê qut bike, mefikire! Tu yê karibî?!

Vaye ez ji we re ji jiyana xwe û jiyana dostên xwe çend bûyeran, nimûneyan dibêjim.

I - Dêwê Gola Qorqor

Nêzîkî sed sal berê rojek ji rojên payîzê, gundî li maleke mezin runiştî di nava sohbeteke germ de bûn. Behsa mêranî, tirs, cin, perî û hûtan dihate kirin. Derengê şevê, gotin hat ser Dêwê Gola Qorqor. Peyv gerandin; çûn û hatin û li dawiyê gotin, »tu kes newêre bi şev here wê derê.« Husên ji nava cemaetê got »ez diwêrim.« Newêrî, diwêrim, welhasil rabûn şert girtin; gotin »eger tu sibe êvarê herî û şeva xwe li ber gola Qorqor bibuhurînî em dê du çewal genim bidin te". Li hev kirin. Derengê şevê gundî rabûn ser xwe, belav bûn; berê xwe dan malên xwe.

Divê roja dî ji êvarê heta şefeqa sibê Husên bi tena serê xwe li newala Qorqor li ber golê bimaya. Tu rastiyê bêjî Husên bi xwe jî poşman bû bû û ditirsiya; lê carekê soz dabû û bi ser de jî şert girtibûn. Jina wî Zerê bi heyran qurban jê re lava kir; li ber wî gerriya, bê fêde bû. Bi tirs û heyecan heya nimêja esrê Husên li gund ma. Ber bi êvarê rabû tifinga xwe ya qapsulî hilda; du nanên tenûrê, du serî pîvaz, hinek toraq û hin xwey ko xistibû nav kevnikekî, xistin tûrikê xwe û berê xwe da newala Qorqor.

Newal bi qasî çil deqîqe bi meşê ji gund dûr bû. Li ser rê wî xwe bi xwe got »berî ko herim newalê, ez ê herim û dibe ko siûdê min hebe û ez çend kewan bikujim da ko êvarê li ber golê şîva min piçek zengîn be.« Husên riya xwe bi kaniya Maran xist; carina ber bi êvaran ji bo vexwarina avê kew dihatine ser kaniyê; Husên ji xwe re kozikek ji çilo çêkir û bi hêviya ko kewan bikuje kete kozikê. Piştî bîstekê refekî kewan xwe li ser kaniyê danî. Husên tifinga xwe hilanî, qundaxa tifingê baş li milê xwe bi cih kir; nîşan girt û tiliya xwe ya destê rastê li lingê tifingê şidand. Bi gumîna tifingê re hin kew bi hewa ketin hin jî li erdê pirpitîn. Husên rabû û ber bi kewên pirpitî baz da; sê kewên gozel dipirpitîn. Husên her sê jî ser jê kirin û kewên xwe xistin tûrê xwe û ber bi gola Qorqor meşiya.

Tarî hêdî hêdî erd hildiçinî, gava Husên gihaşte ser golê êdî zêde wextê wî nema bû. Bi ecele hin hişkedar û pûş da ser hev û li ber golê cihê xwe nîşan kir. Ji bêsiûdiya wî re şeveke tarî, şevereş bû. Mirov ne dikarî pêşiya xwe bibîne. Husên hin pûşî, heste û berheste ji berîka xwe derxistin; li

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

destê xwe yê çepê pûşî û li kêleka pûşiyê berheste bi cih kirin. Hesteyê agirpêxistinê bi hêz li berheste da. Piştî çend caran ko bi hêz heste û berheste li hev ketin çirûskan pûşî girt. Husên hema bi lez pif kir û bi vî şêweyî agir pê xist. Piştî mideteke kurt der û dor êdî ji ronahiya agir kifş dibû.

Husên kew ji tûr derxistin, perikên wan rakirin; rabû çû ber golê, nava kewan paqij kir û vegeriya; hat li ber agir rûnişt. Bi kêrê sê şivên rast wekî şîşan jibo biraştina kewan teraştin û paqij kirin. Kewên xwe xwê kirin û di şivên bi niyeta şîşan de bi cih kirin û ji bo xwê baş tehma xwe bide goşt, kewên bi şîşkirî li kêleka xwe li ser keviran danîn.

Agir êdî xweş bû bû. Li ber agir rûniştî bala wî çû ser pêtên agirî û bi pêtên agir re ew kete nav xeyalan. Dinyaya cin û periyan, dinyaya dêw û hûtan di mejiyê Husên de vejî. Çîrok û serpêhatiyên tirsê, li ber çavên wî bi rih dibûn. Taritiya şevê wek kaposekî xwe li wî dipêça; nêzîkî wî dibû; bê hemdê xwe, xwe piçeke din jî ber bi agir da; agir jê re bû bû piştmêrekî, bi tena serê xwe li vê newalê di vê şevereşê de xwe bê mecal his kir. Bala xwe bêtir da pêtên agirî. Pêtên agir li ber çavên wî şikilên pirr cûre digirtin. Jina wî Zerê hate bîra wî. Guliyên Zerê li ber çavên wî hil dibûn; direj dibûn; dibiriqîn; birû, çav, lêvên wê yên sorgulî xuya dibûn; çavên Husên ber bi jêr daketin û gerdana wê, pêsîrên wê yên hinarî xuya dibûn, Husên bi niyeta ko dest pisîrên Zerê bide, destê xwe direj kir; şûna ko memikên Zerê bidest bixe, ji şewat û êşa agirî destê xwe paşte kişand û veciniqî. Li der û dora xwe bi awayekî şaşbûyî mêze kir. Mîna ko bêje ez li vir çi dikim, ka Zerê ko de çû? Piştî kêlekî li xwe verqilî; soza wî û gundiyan, şertê wan hate bîra wî. Ji kûrahiya dil axînek kişand. Çiqas wext bi ser re çûbû, wî ne dizanî. Agir sist bû bû. Çend dar avêtin ser agirî û pê agir xweş kir. Rabû çû ser golê ser û çavê xwe şûşt û vegeriya cihê xwe.

Ji bo biraştinê li kêleka agirî kevir danîn, kewên bi şivan ve kirî rakirin û her sê kewên xwe li ser kuçikên çêkirî bi cih kirin. Herçiqas wî ne dizanî lê êdî şev dereng û nîvî bû bû. Şeveke bêdeng, eger ji dengê şewata daran û qir qira qirqurokan nebana tu dengekî din vê bêdengiyê xira ne dikir.

Gola ko ew li ber rûniştî bû, ne ew qas kûr û mezin bû. Kûrahiya golê sê-çar û firehiya wê şeş-heft û dirêjahiya wê jî bi qasê deh metreyan bû. Li nav kevir û zinarên mezin mîna hewzekî xuya dikir. Parek ava golê ji gundên jor bi riya rûbarekî piçûk dihat; para din jî ji binê golê ji nav zinaran derdiket. Li havînan ava rûbar kêm an zuha bibana jî, di golê de

hertim av hebû û di ser re diherikî û ber bi jêr diçû. Havînan xortên gund dihatin, diketin vê golê, lê bi şev kesek ne diwêrî riya xwe bi wan doran bixe... Ji xwe sebebê şertgirtina gundiyan û Husên her ev tirs bû.

A di wê şeva tarî de, wexta Husên li ser golê bû, gundî jî li gund li maleke fireh li hêviya wî bûn. Hinan digot: »Ne mimkun e Huso sax vegere, tirs û cinavir dê wî bikujin«, hinên dî digotin: »Welle cinavir-minavir tune ne, eger ew ne tirs e, dê sax û selamet vegere û du çewal genimê xwe qezenc bike... »

Niha bala Husên li ser biraştina kewan bû; lê ji nişkê ve xumîniyek ji golê hat, te digot qey gol dikele; piştre bi dengekî nebihîstî û şiklekî nedîtî mînayî dêwek, tebayekî ji golê derket û ber bi agirî hat... Xwedê hîfza mirovî bike. Ev çi bobelat bû. Qasê sê metre bi dirêjahî, şiklek wekî mirovan û bi pirç, pirçeke dirêj ji pirça hirçan xirabtir, ser û çav jî mîna yê însanan, lê ew jî bi pirç bû. Eniya wî bobelatî ne dixuya; ser serê wî ecêbî mina bivirekî bû. Husên ji taqet ketibû, ne dikarî xwe bilivîne. Hewl dida ko rabe, biqîre, lê çi mixabin endamên laşê wî bi a wî ne dikir... Dêwê Enîbivir hat li hember Husên li kêleka agirî rûnişt. Li Husên mêze dikir. Piştî midetekê Husên bi ser xwe ve hat, dest û lingên wî êdî diliviyan. Dengê xwe ne kir. Nediwêrî deng bike. Ji kewên bi bez dilopên don diketin nav agir û dişewitîn. Husên bê hemdê xwe şivekî bada jibo hêla din ya kewê jî çêbe. Dêw jî wek wî kir. Her cara ko Husên şiv badida Dêw jî bizariya wî dikir. Husên rahişt şivê û donê kewê di kincên xwe de da, Dêw jî rahişte şivek û teqlîdê Husên kir. Bi vî şêweyî ji serî ta ber lingan her du yan jî xwe di nava don de hiştin. Husên ji nişkê ve rahişte darekî bi pêt û di canê Dêwî da. Bi carekê laşê Dêwî agir girt û di nav pêtan de ma. Bi orînek mezin Dêw ber bi golê reviya û di nav avê de winda bû.

Bi qêjîna Dêwî re ji tirsan Husên ji xwe çûbû. Gava şiyar bû êdî berbanga sibehê bû. Li der û dora xwe mêze kir, agir tefiya û kewên wî şewitî bûn. Rabû ser xwe li golê fekir, bala xwe da der û dora agirî lê tiştek netebiî ne dixuya. Çû, ji golê av avête ser û çavên xwe, hat; devê tûr vekir; xwest ko hin nan û toraq bixwe, lê ne karî... li gel ko birçî bû jî. Rabû ser xwe tifing û tûrê xwe hilda û berê xwe da gund.

Zerê li malê bi çavên bê xew li hêviya mêrê xwe bû. Ji çûyîna mêrê xwe heya sibê li malê bi tirs û kelecan xwe li quncikekê kişandibû ser hev û giriyabû... Bêî ko haya wê jê hebe ko niha Husênê wê ber bi gund dihat.

Ji şefeqa xwedê ve li derveyê gund du xort li ser riya Husên li hêviya wî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bûn, da ko bi hev re herin mala ko gundî lê rûniştî bûn. Bi xuyabûna Husên re xort çûn pêşiya wî. Bi hev re meşiyan, bêdeng. Xortan di bin çavan re mîna ko li lehengan tê temaşekirin li Husên mêze dikirin, Husên li ber çavên wan wek dêwekî dixuya û bi heybet dimeşiya...

II - Bro û »dibistan«

Roja Înê bû. Ev sala yekemîn bû ko xaniyek li mehela jorîn bi lewheyekê hatibû diyar kirin: »Dibistan«. Xaniyekî du ode bû, xwediyê xanî mala xwe biribû bajêr. Bi alikariya gundiyan, necarekî hin kursî û mase çêkirin, xanî sewandin û baş nayê bîra min lê ez dibêm qey duşemekê gundî hemî li ber dibistanê civiyan, zarokên xwe jî bi xwe re anîbûn. Yekê serqot ko jê re digotin »Xoca« peyivî û paşê zarok çûn hundir û bavên wan jî wegeriyan ser kar û xebata xwe.

Gava »memûr« ji bajêr hatin û gotin em dê didistanekê li gund vekin, gundî piçekî tirsiyan; ji xwe li cem wan adet bû. Her tiştê ko ji derve, ji bajêr bihata tirsekê dixist dilê wan, bayê tirsê xwe li wan dipêça. Heta ji wan bihata xwe ji wan »xerîban« didan alî. Ji ziman û axftina wan tiştekî fêm ne dikirin. Neheq jî ne bûn, hema bi vî halê xwe ez bi xwe jî acis dibûm. Çawa nebim, min bi xwe jî ji zimanê wan fêm ne dikir. Erê berê jî çend car hatibûn, lê hatin û çuyîna wan bala min zêde ne kişandibû; ji xwe li gund pirr ne diman; hêkerûna xwe dixwarin û diçûn. Ji ber ko min jî dizanî ew li vir namînin, ez ne zimanê wan fêrbûm û ne jî tiştekî wisa fikirîm. Cil û bergên wan jî ne mîna yên gundiyan bûn. Tu rastiyê bêjî heta niha gundiyan tu xêreke ji wan »xerîban« ne dîbû. Carina yên bi çek -ji wan re esker digotin- dihatin gund hin xortê gund didan ser hev û dibirin; hinên din jî dihatin zêr û pere ji wan dixwestin; carina jî diketin malên gundiyan genim, ceh, nîsk çi bidestbixistana dibirin, digotin ji bo eskeran dibin...

Îbrahîm zarokekî heft salî bû. Wî jî mîna hevalên xwe yên hemsalî dest bi dibistanê kiribû. Xaniyê bavê Îbrahîm li mehela jêr bû. Gava Îbrahîm diçû dibistanê û dihat hertim di ber min re derbas dibû. Ji xwe berê ko dest bi dibistanê bike ez û ew em bû bûn dostên hev. Hûn dê niha bêjin ma çawa tu bi vî emrê xwe yê kal bi wî zarokî re bûyî dost? Baş e, ez jî ji we dipirsim ma kal û pîr çawa bi neviyên xwe re dibin dost? Şikir ji Xwedê re Îbrahîm wek we ne difikirî. Wî bêî ko zêde lê bifikire dostaniya min qebûl kir û hertim dihat cem min. Wî hema bêje ji çêbûna xwe heya

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

îro bi çavên xwe yên hingivîn li min fedikir. Tu rojekê xirabiyek, êşek ji min ne dî. Gava piçûk bû, li nav qumatekê de bû, havînan diya wî ew li bin siya min dixist xew. Parastina wî ji tîrêjên rojê ji min re kêfxweşiyek bû; bi pelên xwe yên mezin, bi bilindahî û gurrbûna xwe bi saetan min ew diparast. Li min mêze dikir û min jî jê re çîrokên xweş digotin. Pê kêfxweş dibû û dikeniya. Eger hinan bidîta ko ew dikene digotin: »Bi melayîketan re dilîze û dikene.« Xem nake, melayîket jî ji min re ne xerîb in, piçek heqê min bi ser wan de diçe, lê...

Îro Bro, bavê wî û meleyê gund çûn li defîneyan bigerin. Mele niviştekê nivisî û di nav kevnikekî de pêça. Li ser daxwaza bavê xwe Bro bê dilê xwe çû dîkê wan yê sipî bi destan girt, lingên dikî girêdan û ew xiste kîsekî fireh. Lê serê dîkî li derve bû. Bêr û kulingekî jî bi xwe re birin. Bi hev re ber bi çiyayê pişta gund meşiyan. Piştî nîv saetê li devereke ko lê hebûna xezîne şik dikirin, dîk ji kîs derxistin; nivişt bi benekî sist li stuyê dîkî girêdan; ji bo dîk nereve benekî dirêj jî avitine lingekî dîk û dîk ber dan. Mele digot: » Dîk li ko derê bang bide û nikilê xwe li erdê bixe, ew der divê bê kolan.« Lê dîkî li tu derî bang ne da. Bro dîkê xwe xist hembêza xwe û hilkişiyan. Du qatî ji cara ewil zêdetir meşiyan. Niha li serê çiya li herî jor bûn. Dihate gotin ko berê li serê wî çiyayî qesra mîrekî hebû ye; di erdhejanekê de xaniyê wî hilweşiyaye. Kesên di xanî de bûne mirine û xezîneya mîr jî li bin axê maye.

Bro careke din dîkê xwe berda; piştî hin gerînê dîkî li du ciyan bang da û nikilê xwe li erdê xist. Cihê ko dîkî nikil lê dabû Bro bi qûçekê nîşan kir. Gava ev tişt qewimî Mele û bavê Bro li ser nimêja nîvro bûn. Piştî ko nimêja xwe xilas kirin hatin û dest bi kolanê kirin. Qasê du metre kolan bêî ko rastê nîşanekê bên. Cihê duhemîn jî kolan ji bilî hin kevirên xirbê tiştek ne dixuya ew jî herweha bê hêvî derket. Çend cihê din jî dîk berdan lê bang ne da. Ber bi êvarê westiyayî û destvala ji çiya daketin, hatin malê.

Li nava gund Mele xatir ji bavê Bro xwest û çû mala xwe; Bro û bavê xwe jî ber bi mala xwe ve hatin; gava Bro nêzîkî li min kir, dilxweş bû û bi dizî dikeniya dîkê xwe ji kîs derxist û ber da; dîk bi lez û bez ber bi malê çû. Bro bi kêfa ko tiştekî nehate serê dîkê wî li kêleka bavê xwe bi gavên xwe yên piçûk meşiya çû malê.

Aha wî dostê min ê piçûk dest bi dibistanê kiribû. Bi tirs û heyecan diçû. Ji rûyî wî kifş bû ko ji çûyîna dibistanê ne zêde razîbû. Rojekê min meraq kir û jê pirsî:

— Bro tu çawa yî?

Bê dilê xwe got: Ez baş im, sipas.

— Tu dixwazî em hinekî ji xwe re bipeyîvin?

— Na, ne îro.

Min jî zêde ew acis ne kir. Bro meşiya çû malê. Lê mirûzê wî daketî û bêkêf bû.

Piştî çend rojan, Bro hat cem min lê ne tenê bû. Çend hevalên wî yên dibistanê jî pê re bûn. Hatin ji xwe re bi kap û gozan bilîzin. Îro ew kêfxweş bû; diqêriya, ew û hevalên wî bi hev re dikeniyan, baz didan...

Min dixwest ez jê pirs bikim, ka dixwaze em bipeyîvin, lê min ji xwe re got, dev jê berde, bi hevalên xwe re vaye dilîze; tu ê ji bo çi kêfxweşiya wan biherimînî. Piştî listikê hevalên wî çûn malê, ew bi tena xwe ma. Li min mêze kir û kenî. Mîna ko bêje, eger tu bixwazî em dikarin bipeyivin. Min got »de ka were.« Hat cem min rûnişt û dest pê kir: »Hevalê min yê hêja, tu zanî ez ji te pirr hez dikim. Ji lewre jî tiştekî ji te venaşêrim. Tu zanî îsal min jî dest bi dibistanê kir. Ev midetek e ko ez diçim û têm; lê bi rastî kêfa min ji dibistanê re nayê. Xoceyê me bi zimanekî dipeyîve ko ez tiştek jê fêm nakim. Ji ber ko zimanê wî û zimanê ko em dipeyivin ne wekhev in, gava dixwazim tiştekî bêjim jî, nikarim. Em yên ko me îsal dest bi dibistanê kiriye hemî bi tirs û matmayî -wek kerr û lalan- li devê Xoce dinêrin. Min carekê ji diya xwe pirs kir, ka çima Xoceyê me yê dibistanê wekî me napeyîve, wê got »Xoce bi zimanê mektebê dipeyîve.« Go, »pêçekî bi sebir bibe tu yê jî fêr bibî.«

"Tu zanî wê rojê dema ko te ji min pirsî çima ez pirr aciz û bêkêf bûm? Ez bêjim, ew hevalê kumspî ko gava din li vir bû, me dilîst; ew hevalekî min î jêhatî ye. Li nav gund di nav hemsalên xwe de yek ji wan zarokên herî jîr e. Çend roj berê Xoce jê re tiştekî got. Wî jî ne dizanî çi bêje, ji ber vê yekê bêdeng ma. Vêca Xoce gelekî lê xist; ji êş û qehran hebû nîv saet giriya. Hevalekî min î din jî wê rojê, wexta me bi nok û hebê fasûleyan tiştên ko Xoce li ser textê nivîsîbû çêdikir, rebeno ne dizanî ji Xoce re bêje »mîza min tê", xwe ne girt û li orta sinifê di bin xwe de mîz kir. De îca tu bêje ma tu bî, tu yê bê kêf nebî?«

Ma min ê çi bigota, bi zimanekî din li dibistanê peyîvîn ji min re meqûl ne dixuya û herweha wek neheqiyekê bû. Lê min bi xwe jî ne dizanî çima welê ye. Ji lewre min ne dizanî ka ez dê ji Bro re çi bêjim. Bro bi min bawer bû; û ji xwe re digot: »Dostê min ê qedîm her tiştî dizane«; ji ber ko heya niha hertim bi dilekî germ û bi bersîvên têr min cewaba pirsên wî dabû. Ez niha ketibûm tengasiyeke mezin. Min his dikir ko nezanî bih-

nê li mirovî teng dike; divê min bi awayekî xwe ji vê rewşê rizgar bikira. Li min bibexşinin, min jî xwe sparte riya kevnar, ango min got: »Bro piçekî sebir bike, gava tu mezin bibî tu ê bersîva pirsa xwe fêrbibî.« Bi nêrînên guhertî li min mêze kir; wekî bêje, »ma tu çima ji min re nabêjî, ka çima welê ye?«

III - Bihar û eskerên reş

Li bin tîrêjên rojê, hilma ko ji erdê radibe bi bêhn û mizgîniya biharê dagirtî ye. Berf li quntara çiyayî ne maye, heliyaye. Li bilindahiyên çiyê li çalên kûr, cihên ko zivistanê ba û gijolekê berf dabû ser hev hîn spî dikin. Lê cihên welê jî mîna pîne dixuyên. Piştî hefteyekê dê ew jî bihelin. Bi barana biharê re rûbarên ko ji çiyê dadikevin ji rengê axa sor û lîşo tije dibin; ji quntarên çiyê û qeraxên rûbaran her sala ko diçe axa li ser erdê zeîftir dibe û herweha çiya bi jiyana xwe ya dûr û dirêj nîşana vê yekê ye. Ji ber lehiyên biharê yekcaran welê lê dihê ko pez nikare ji rûbar derbas bibe; bi alîkariya gundiyan, bi zehmetiyeke mezin pez bi selametî dihê derbaskirin; li gel vê yekê jî carina bizin an mîhek li ber avê diçe.

Dawiya meha Adarê û destpêka Nîsanê êdî bihar bi hemî xweşiya xwe, serî hildide û tebîetê diguhere. Tîrêjên rojê her roj germtir dibin. Ew çiyayê bi berfê pêçayî ewil cihê xwe ji pîneyên reşahî, ji kirasekî gewr û qehwehî re dihêle; piştre hêdî hêdî kirasekî kesk li xwe dike û roj bi roj keskтir dibe. Li qerajên çiyê pirpizêk, pîvok, nêrgiz, binevş û beybûn mizgêniya biharê îlan dikin. Di destê wan de gulçanên wan, zarok li nav zewiyan, li quntara çiya pîvokan radikin; ji pîvokan tacên gilover çêdikin û wan tacan bi kulîlkên rengîn dixemilînin. Giya roj bi roj bilind dibe û bi kulîlkên renga reng dihê xemilandin. Li biniya gund di nav bexçeyan de spîndar ber bi asîman berzbûyî xwe ji biharê re hazir dikin. Li nav gund darên tuyan, tuyên şamî, spî û romî dibişkivin. Darên sêv, bîhok, incas, qeysî û xox bi kulîlkên xwe yên rengîn bexçeyan, darên behîv û hirmiyan li der û dora gund û li nav rezan; û paşê darên hinaran bi kulîlkên xwe yên sorî kêfxweşî û bêhnfirehiyê peyda dikin û rengeke guhertî ko mirovî mit û mat dihêlin didin biharê; vêca ev kulîlk di dema biharê de dîmeneke bihuştî divejînin; tu dibê qey tebîetê di musabeqeya stêrkan de ji bo bidestxistina xelata yekemîn; ji rengên kesk, sor, zer, spî, binevşî, xemrî û pembe sentezek nedîtî afirandiye; û bi firçeya xwe ya tebiî ev dîmena li biharê vejiyayî çêkiriye.

Mêşên hingivî ji xewa zivistanê şiyarbûyî, bi keftelefteke mezin ji ke-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

waran bi derdikevin, ber bi deryaya kulîlkan difirin; li ser kulîlkan reqs dikin; doş dibin; datînin û bi îtînayek mezin cewhera kulîlkan hildidin û ber bi xaniyên xwe ve difirin. Di kewaran de qesrên spî ava dikin; ew qesrên ko bêhna mîmaran diçikînin û cih li wan teng dikin, bi sebreke mezin, kevir bi kevir tên avakirin. Xebatkarên malê di bin serektiya Keybanû de ji dil û can dixebitin û embarên xanî bi cewhera kulîlkan dadigrin.

Gundî li nav bexçeyan, rezan û zeviyan di kar û xebata xwe de ne. Her yek ji wan bi tiştekî mijûl e. Hin ji wan rezan dişelînin (dikezixînin) û dora mêwên rezan dikolin. Hinên din mêwan dipêçin. Hin li nav bexçeyan cot dikin, dora bostanan bi striyan sênc dikin. Li nav bexçeyan birînên ji zivistanê mayî derman dikin.

Çûk, kotel û kekû li ser daran, kew di nav kursan û bin tehtan de, şalûl li nav kendalan û bilbil di zikê zinaran de hêlînên xwe çêdikin. Ji berbanga sibehê bigir heya ko tarî erd digire ji dengê çûkan, xwendina bilbilan ve hewa bi melodiyan tê dagirtin. Hela li pişt gund ber bi êvarê gava kew li ser zinaran dixwînin mirov heyran dimîne. Newal û rez di bin dengê kewan de melûl dibin. Vêca ez nizanim we qet guhdariya xwendina kewan kiriye an na? Eger we ne kiribe çênabe, divê hûn biharekê riya xwe li van çiyayan bixînin û guh bidin wan. Wê gavê hûn dê min fêmbikin, ka di nav tebîetê bi xwe de van tiştê han jiyîn çi ye.

Aha di biharek welê de, berbanga sibê me çavên xwe bi qêrîn û hewarê û bi reyîna kûçikan vekir; em şiyar bûn; lê dengê kûçik û teqîna sîlehan tevlîhev bû. Piştî demeke kurt deng ji kûçikan hat birrîn. Gundî yên ko fersend dîtin bi tirseke mezin ji malên xwe bi derketin û ber bi newalan, ber bi zinaran beziyan; li pişt keviran, zinaran xwe veşartin û li gund temaşe kirin. Yên bi çek hatî Eskerên Reş bûn. Li gundê me mêr kuştin, rehma wan li zarok û jinan jî ne hat. Tiştên nedîtî anîn serê jin û keçên me. Ez şerm dikim li vir qala wan tiştan bikim. Gelek jin û keç ji bo nekevin destê wan bêbavan xwe ji zinaran avêtin, kuştin...

Wan bêbavan xaniyên gund şewitandin; pez û dewar birin; kesên ko ji destê Eskerên Reş xilas bûn bi çiyan ketin. Birçî, perîşan bi hefteyan li çiyan man. Ji bextê wan re bihar hatibû, êdî dinya germ dibû û pincar gelekî bû. Bi xêra wî pincarî ew ji mirinê xilas bûn. Li bin zinarên mezin, li kûrahiya newalan û li şikeftan diman. Piştî çûyîna eskeran ji mintîqê ew vegeriyan gundê xwe. Lê gund ne mabû. Yên ko li jiyanê mabûn, wan ji nû ve gundê xwe ava kirin. Şikir ji Xwedê re vaye em bi hev re ne û car

din li ser erdê xwe ne.

Bi rastî min ne dixwest bi bûyereke welê menzereya bihara herêma me xira bikim. Lê ji destê min çi tê? Ez behs nekim, nabe. Herçiqas bûyerek tehl û naxweş e û mirov naxwaze bi bîr jî bîne lê ev tişt qewimî ye; ji lewre divê bête gotin. Eskerên Reş çima ew gund û gelek gundên din şewitandin sebeb çi bû, Eskerên Reş kî ne? Bi rastî ev serpêhatiyeke gelekî dirêj e!. Ji xwe wek min berê jî gotibû, ez li vir, li vî gundî bi cih im; qasî ko ez li ser erdê xuya dibim ewqas jî li bin erdê me. Nikarim herim, bigerim hertiştî fêrbibim. Ez tenê li gundê xwe û li der û dora xwe baş haydar im. Ax ax, ji xêra Xwedê re li her deverê, li her gund û navçeyê jiyana kevin, nû û her tişt bihatana gotin û nivisîn da ko hemderdên min xuyabana û piçekî barê min sivik bibana.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

IV - Evîn, xweşî û zilm

Îro jî Dîkê Mala Hecî Silêmanê Şaşikxwar hat di ber min re derbas bû, çû nav zeviyên xwe. Hûn dê bêjin ev çi ye, ma bira ew dîk e, an tu welê dibêjî?

Belê, berê ko ez Dîk bidim nasîn, pêwist e ez ji Şaşikxwariya Hecî Silêman dest pê bikim. Li gund çend heciyên bi navê Silêman hebûn, gundiyan ji wan her yekê re navekî peyda kiribû. Vêca berî ko Hecî Silêman şaşikê xwar bide serê xwe, hertim bi rêk û pêk şaşika xwe girêdida û bi usûleke xweş dida serê xwe. Lê rojek Çawîşê qereqolê li nava gund digeriya û li ber dikana Ristem-ku gundî carina li wê derê kom dibûn-, ji gundiyan re got »Nizanim ev bû çend sale ko Serok Komarê me yê nemir înqîlabek çêkir û cil û berg guhertin. Ka bêjin hûn çima hê jî van şaşik û kuman didin serê xwe? Rîha xwe mîna ya bizinan berdidin?« Hecî xwest bêje ko li cem wan edet e, yên kal dibin şaşik an kum didin serê xwe, lê hîn gotina Hecî bi dawî ne hatibû Çawîş şaşika Hecî ji serê wî kişand û avête... Hecî deng ne kir. Şaşika xwe ji erdê hilda. Piştî ko Çawîş meşiya çû, Hecî şaşika xwe cardin da serê xwe lê vê carê rast ne kir, şaşik li serê Hecî bi hêla rastê xwar bû; loma jî gundiyan gava Hecî ne hazir bana jê re Şaşikxwar digotin.

Sebro û Fatê ji can û dil ji hev hezkirin. Li gel ko Fatê jinebî bû jî, Sebro guh ne da gundiyan û bi ya xwe kir. Berê ko bizewicin, gundiyan bi Sebro yarî dikir, digot:

— Erê tu bi xwedê kî Sebro, ka bêje te çi di wê jinebiyê de diye, ko tu welê aşiq bûyî, aqil di serê te de ne maye, hindik maye jibo qotejinek tu bi çolan bikevî...

Sebro dikenî; destê xwe dibir ser serê xwe kumê xwe radikir û digot:

— A ji we re, vî kumê min carekê tenê bidin serê xwe û bi çavên min li Fatê mêze bikin, wê çaxê hûn ê bibînin ka Fatê çawa ye? Bi Xwedê, bi Xwedê ne li vî gundî ne jî li dereke din yeke mîna Fatê ne heye û nejî çêdibe. Hema hîç xwe neêşînin. Fatê yekta ye, yekta.

Sebro xortekî sêwî û feqîr bû. Gava Sebro dehsalî bû, zivistanekê aşît li

ser mala wan de hat û xaniyê wan di bin berfê de ma, heta gundiyan ew ji bin berfê derxistin dê û bavê wî çûn ser heqiya xwe. Gundiyan, Sebro ji mirinê xilas kir. Sebro pêşîn çû ber golikan paşê jî şivanî kir. Piştî ko mezin bû êdî di nav zeviyên xwe de kar dikir.

Rîsipiyên gund rojekê biryar girtin û gotin divê em Fatê ji Sebro re bixwazin û wan bizewicînin. Li gund herkesî bi gorî taqeta xwe alîkariya Sebro kir û bi kêfxweşî û şahiyê daweta wan çêkirin û »evîndarên gund« yên bi nav û deng gihandin hev.

Evîna Sebro û Fatê piştî zewacê jî kêm ne bû. Sebro ji jina xwe pirr hez dikir û hertim alîkariya wê dikir û ne dihişt Fatê karekî giran bike. Eh, de vêca hûn bêjin, li gund di rewşeke welê de ma gelo mirov ji devê gundiyan xilas dibe?

Yê mala Hecî Silimanê Şaşikxwar jî dîkek û çend mirîşkên wan hebûn. Li der dora malê, li ser sergo gava ji xwe re li qût digeriyan wî dîkî eger tiştek bidiya hema nikilê xwe li erdê dixist û dibû tix tixa wî, baskê xwe bi erdê re dikişand; xwe dinepixand; gazî mirîşkan dikir; ew xwarin ne dixwar dida mirîşkan. Ji ber vê yekê gundiyê ko bi jina xwe ve girêdayî û miriyê jina xwe bana, gundiyan ev nav lê dikir: Dîkê Mala Hecî Silimanê Şaşikxwar.

Gundiyan li bin siya min ji bo rûniştinê sekû çêkirine. Kalemêrên mehela nêzîkê min, dihên ji xwe re li ser sekûyan rûdinin û sohbet dikin.

Ji bilî kalemêran carina Mele Ehmed tevî feqiyên xwe dihat û li bin siya min munaqeşe dikirin an jî xwendina xwe, dersên xwe li cem min dixwendin. Xwendina wan bi zimanekî biyanî, ango bi erebî û bi zimanê gundê me bû. Fêrî erebî dibûn lê dersên xwe bi zimanê ez jê hez dikim û fêm dikim şerh dikirin.

Digel kitêbên dînî wan kitêbên din jî dixwendin. Ji Meleyê Cizirî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî helbest dixwendin. Ji Xanî Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê û her cara ko bihatana beşekî ji Mem û Zînê dixwendin. Meraqê bi min jî girt, min digot: »Xwedêyo, Tu rêya wan bi vir bixî ka bizanim çi bi serê evîndaran, Mem û Zînê hat.«

Di nav feqiyên mele de yek hebû navê wî Dilşad bû. Xortekî bejin dirêj û çeleng bû. Dengê wî gelekî xweş bû. Gava bi wî dengê xwe yê xweş Mem û Zîn dixwend kezeba mirov diheland. Carina ez kelegirî dibûm, carina jî hêrs û heybetê min digirt... Lê roja ko Dilşadî beşê şeva zîfafê ya Tajdîn û Stiyê xwend, ez bi asîman ketim; li erşê ala geriyam; firiyam. Min ji can û dil dixwest ko ez jî di şûna wan bama. Min digot xwezî bi

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wan evîndaran...

Dilşad ketibû nozdeh saliya xwe. Ev salek bû ko ne bi tenê bû. Bi Binevşa qîza Mele Ehmedî re zewicî bû. Xwendina xwe zûde xilas kiribû. Eger ji bo meletiyê biçûyana gundekî din, dê û bavê wî bi tenê diman, lê wî ne xwest ji wan veqete ji lewre Dilşad li cem wan ma. Li gund di nav mirovên xwe de, li ser erd û rezên xwe dê baş xirab debara xwe bikirana.

Îsal rezên wan bi têr tirî bûn, hin mêwên tiriyê di bin giraniya guşeyan de xwar bû bûn... Ber bi êvarê bû, germbûna tîrêjên rojê êdî şikayabû.

Binevş yek ji wan keçikên herî xweşik bû li gund. Wê û Dilşadî bi dilketinê ji hev hez kiribûn û zewicî bûn. Niha Dilşad û Binevş li nav rezê xwe yê li biniya Zinarê Mêşhingivan digeriyan. Wî zinarî ji ko derê ev nav girtiye û zinarek çawa ye? Belê, mîna tiştên din çîroka navê wî zinarî jî heye. Nebên ma çi, ser û binê wî ne xwe tev de zinarekî ye, lê ev yeka ne maqûl e; loma ez mecbûr im bêjim ko ew zinar ne zinarekî edeti ye. Teyrên ko dixwazin ji çavên neçê xwe û çêleyên xwe biparêzin, diçin di nîva wî zinarî de hêlîna xwe çêdikin. Zinarek, zinarekî berz. Tu deh xaniyên vî gundê me bidî ser hev bi qasî bilindahiya wî zinarî nabin. Ew zinar çawa li wê derê bi cih bûye û welê mîna ko hatibe çikandin, û bi wî awayî rabûye ser piyan Xwedê dizane. Havînekê wexta mêşên hingivî çêle didin; ji wan çêleyan komek ji gund derketin û dan dû rêbera xwe û çûn di nîva wî zinarî li quleke mîna e kewaran de bi cih bûn. Ji wê rojê vir de navê wî zinarî ma Zinarê Mêşhingivan.

Li kêleka hev li nav rêzên mêwan geh winda dibûn; geh serê wan xuya dibû; bi meşînê re yekcaran kimaxên wan li hev diket û Dilşadî nermbûna kimaxên Binevşê di canê xwe de his dikir. Carina bi lênêrînek nerm û germ li hev dinêhêrîn û dimeşiyan. Binevş li kesekekî axê likumî û li ser dev û rû ket xwarê, lê ji ber nermbûna axa nav rez ew ne êşiya û bi ken »ay« got, li bin kirasê wê yê havînî kimaxên wê diyar bûn; Dilşadî xwest wê rake lê bê hemdê wî nêrînên wî çûn ser kimaxên wê. Di wê bêhnê de gava Binevşê ji kêlekê û di bin çavan re li wî mêze kir, wê dît ko çawên wî li gurmikên wê fedikin; bi niyeta xwe qulubandinê wê kimaxên xwe bi livandineke nerm hinekî din rakirin; bi vê tevgera wê re gurmikên wê bêtir diyar bûn; kirasê wê di nav qelîşteka kimaxên wê de piçek daketî bi cih bû bû; wê xwe quluband û destê xwe dirêjî wî kir; bi dest kişandinek nerm wê mebesta xwe bi wî da famkirinê; li bin mêwên tiriyê hev gevizandin... Bi gestin û maçên evînê deqên sorî di canê hev de mor kirin. Geh li jêr û geh li jor cilên hev şelandin; li bin mêwên tiriyê bi pelên

mêwê pêçayîbûn; ew li bihuştê mîna ew du mirovên cara yekemîn bûn.

Di bin mêweke mezin ya tiriyê reş de, bi dilên têrevîn li hev dinêrîn; wî ji guşiyek tiriyê reş çend heb jê kirin; -di nav lêvên wê de heb bi cih dikir û bi ramîsanên sorgulî wan evîna xwe du par dikirin;- nêrînên wî çûn li ser çalika gerdena wê sekinîn; wî çend hebên din ji guşiyê jêkirin û li ser çalika gerdena wê givaştin; piştî çend heban kortik tije bû û dilopek ber bi jêr bi rê ket; navbera du çiyan re li newalê meşiya hat gihaşt navika wê, »Kaniya Qestelê"; li wê derê ji bêtaqetî serî danî. Dilşad jî bi nêrînên xwe bi dilopê re dimeşiya; ew jî hat li ser »Kaniya Qestelê« sekinî; serê xwe ber bi kaniyê xwar kir; bi ziman û lêvên xwe yên tî ava kaniyê ya reng şerabî zuha kir û rêça peyayê berê ber bi jor ajot; Binevş li bin wî, bi çavên xwe yên nîv vekirî yên karexezalî difiriya; pêlên evînê di bin zimanê wî de mîna lehiyek Binefş dihejand; Dilşad gihaşte çalika gerdenê û ew ava reng meyî miçikand.

Gava deriyê bihuştê bi kêfxweşî li pêşiya wî bi awayeke daxwazkar nîşana xwevekirinê da, siwarî bê teredut kete hundir; li buhuştê ew yekcar li hev sor bûn; can û giyan bûn yek, ji hev dûr ketin; cardin bûn yek, cardin... xwe li ser pêlên deryayê di keştiyeke xewnî de didîtin; gava keştî ji ber pêlên deryayê ji neçarî û bê mecalî gihaşte kerax û lenger avêt bin behrê êdî rêwî mest bû bûn... Midetekî li bin mêwê li tîrêjên rojê yên ko ji rojava li nav pelan diherikîn û rengek sorî dida nav rez temaşe kirin; roj li ber daketinê bû; ji dûr mina lengeriyeke agirî dixuya. Avakar ji rindî û hezkirina wan kêfxweş li asîmanê heftan dikenî.

Payîz wexta çinîna tirî û ser rezan bû. Ev deh roj bû ko Dilşad û Binevş bi rezan ve mijûl dibûn. Wê salê tirî baş bû, du lên (sîtil) kirin bastêx, yek divs û yek jî divsê tîr çêkirin. Lênek jî kirin kesme û lepik. Beranên ji darê dirikan, şivên behîvan, bîhok û hirmî li esîdî xistin û lepik ji bo hişkirinê dan ber tavê. Nîvlênek esîd ji bo beniyên sor çêkirin, beniyê ji kankilê gozan di esîdê re dikirin piştê ko bihneke xwe digirt careke dî dixistin nav esîdê bi vî şêweyî sê çar car tekrar dikirin heta beniyan baş xwe digirt û bi goşt dibûn. Nîvlênek şîre jî ji bo beniyên spî anîn malê. Roja dî çend nas û dost hatin malê ji bo çêkirina çalme. Ji bo çalme, ji darê belelûkan şivên dirêj bi qasê metreyek jêdikirin û diteraştin; serê şivan bi şax dihîştin. Çend şiv didan ber hev û baş girêdidan. Esîd çêdikirin û ji bo rengê esêdê vekirî be hinek dew dixistin nav şîreyê, piştî ko esîd dikelî, esîd bera teştekê didan û berê ko sar bibe, sê çar kesan bi wan şivên çêkirî bi hevre li esîdê didan heya ko esîdê rengê xwe diguhert û spî dibû. Piştê ko rengê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

esîdê hat guhertin û spî bû, bi vê yekê re him tîr dibû him jî bi kef. Ji vir pê ve mîna yê beniyên sor beniyan li esîdê dixin û didin ber tavê da ko zuha bibin.

Li gundê me bi rehetiya bi dawîanîna karên xwe yên rojê bi awayekî westiyayî piştî nimêja eşayê pirraniya gundiyan dinivin. Vê carê jî welê kirin. Bûmekî hat û li ser dara tuyê venişt. Bi çavên xwe yên beloq li tariya şevê fedikir.

Ev berbang wek berbangên din bi xweşî li ser wan ronî ne bû. Bi xwe re esker û cendirmeyên kinc kesk anî. Beriya şefeqê bi du saetan hatin gund û li dora wî bi cih bûn. Bi şefeqê re gazî Mixtar kirin û jê re gotin bila, Bekçî gazî hemî gundiyan bike û ji wan re bêje emrê qumandar e, bila hemî li ber qereqolê kom bibin.

Qereqol li hêla rojhelat li qeraxa gund di xaniyekî yek tebeqe de bû, ew jî li quntarê çiya bû, li kêleka milê rast yê xaniyê qereqolê kaşekî vala bi strî û kevirên birqok hebû. Ji ber nêzîkî qereqolê bû gundî zêde ber bi wî ve ne diçûn.

Sebro û Fatê ji êvarê de li ber mengenê rûniştî demetên titûn ji bo hûrkirinê hazir dikirin. Dê sibeyê Sebro biçûyana bajêr. Ji Fatê re digot: »Hîn piyasa titûnê venebûye, eger ez niha titûnê bibim bajêr û bifroşim, dê pereyekî baş bikeve destê min.« Titûn pel bi pel paqij dikirin, ji pelan damar dikişandin û li ser hev demet dikirin. Bi qasî bîst demetan titûn paqij kirin. Sebro carê çar demet di zikê mengenê de bi cîh dikir. Bi rastî karê bi titûnê ve û mengene kirina titûnê çîrokekê dirêj e. De ka bila titûna qutiya dikandarê Sûka Şewitî ji we ra çîroka xwe bêje:

”Tovê min li biharê li ser axeke bi zibil tê reşandin. Piştî ko wek şitil ez mezin dibim, vêca min ji rehên min ve dikşînin û dibin li nav zevî an bostanan datînin. Piştî çend efar û avdanan lemên min bilind dibin. Ji hêla binî ve gava pelên min bi deqên zer tên nexşîn êdî wext e ko wan pelan jêkin û bibin malê. Min dibin yek an du rojan ji bo ez baş zer bibim dixin xweydanê. Paşê min bi ben an şerîtan ve dikin û didin ber tavê ji bo hêşkbûnê. Piştî ko ez hişk dibim min li ciheke bi nem datînin û di demsala payîzê de ez têm paqijkirin û bi rengên xwe yên guhertî ve têm dabeş kirin. Û niha jî ez li bin kêra Sebro li ber mengenekirinê me. Eger yê mengene dike yekî jîr be, ez dibim mîna porê keçên kej, dirêj û reng zer. Min gelek caran bihistiye, ko hinan gotiye »Mirov dil dike vê titûnê bixwe.« Eger li ser riya bajêr ez ji destê cendirman û li bajêr jî ji destê »qolçiyan« xilas bibim li Sûka Şewitî têm firotin. Vêca dikandarê kiryar

qutiya xwe ji berîka xwe derdixe û tu dibê qey wî bi xwe ez afirandime, dirêjî dostên xwe dike...«

Gundî ne bi dengê mele ne jî bi dengên dîkan şiyar bûn wê sibehê, Bekçiyê gund li ser baniyan digeriya û bi dengê xwe yê li xewê fermana qumandar ji gund re eşkere dikir. Gundiyên ko serê sibehê zû diçûn ser karê xwe li nav zeviyan û yên ko hayiya wan ji fermanê tune bû an jî dixwest xwe li derveyê gund veşêrin, ji alî eskerên ko li kemînan li dora gund bûn hatin girtin; bi xweşî an zorê tevî mêr û xort yên li gund, li ber qereqolê kom bûn.

Sebro tevî du cendirmeyan û li ser milê wî mengene û li pişta wî çewalek titûn ber bi meydanê dihat. Cendirmeyan ew rasterast bir cem qumandarê xwe. Qumandar bi şiva destê xwe mengene nîşan da û ji Sebro pirsî ka »ew çi ye.« Sebro got »ev mengeneya titûn hûrkirinê ye.« Li ber qereqolê li pêş çavên hemiyan bi Sebro hin titûn dan hûrkirinê. Piştî ko dîtin rast e, vêca cendirman Sebro bi defdanan bir nav gundiyên din.

Qumandar hat û li pêş gundiyan sekinî û bi dengek tehdîtkar got: »Hinan ji we îşev mala Çawîş gulebaran kiriye. Ka bêjin kî ye? An na ez ê welê bikim ko hûn dê poşman bibin ko hûn ji diya xwe bûne.« Ji gundiyan tu deng derneket. Temamê gundiyan mîna şagirtên didistanê ketibûn rêzê. Qumandar çovek di dest de li pêşiya wan diçû dihat. Bêdengiya gundiyan ew yekcar hêrs dikir. Bi çovê destê xwe li bin çena wan dixist bi wî şêweyî serê wan radikir û pirsa xwe tekrar dikir. Gundî bêdeng bûn. Qumandar emir da eskerên xwe ko çovên baş ji xwe re peyda bikin û »van ker kurrê keran« bîstek »talîm« bikin. Cendirme û eskeran ji hewşên nêzîk mirdyaq anîn. Bi emrê marş! ve berê gundiyan dan wî kaşa bi strî û keviran, gundî dibeziyan û eskeran jî ji par ve li nav ser, mil, pişt ne digot li wan didan. Dilşad û çend kesên din ko xwestin tiştin bêjin û li dij vê zordestiyê derkevin, ji hemiyan bêtir lêdan xwarin. Eskeran carê rêzek gundî didan ber xwe û ew »talîm« dikirin. Gava hin esker diwestiyan hinên din cihê wan digirt. Ji serê sibê heya bi nimêja nîvro li gundê me li ber qereqola gund, gundiyê ko lêdan nexwar ne ma. Gava eskeran terka gund kir, bêdengiyeke giran û bi êş û nefret xwe li gund pêça.

Dilşad jî tê de gelek kes bi rojan, hin jî bi hefteyan li nav nivînan man...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

V - Epîlog, Dara gozê

Ez hîn li vir im; li gundê xwe li ser axa xwe me; bi rehên xwe ve li bin kûrahiya axa gund rêç dayî me; li ser erdê, bi hêz û heybet im. Bi berên xwe, kankilên xwe xweşiya kêfa zarokan im. Bi hemî êş, jan, xweşî û nexweşiyên xwe ve li vir im. Bi emir im, kal bû me. Ji dostên min yên vî gundî gelek kes çûn ser heqiya xwe. Zarokên wan, neviyên wan, neviyên zarokên wan hatin û çûn; zordestî li wan hate kirin; birçî man; pêlên zilmê li wan rabûn; agir û tofanan xwe li xaniyên wan pêçan... Bi çiya ketin li şikeftan, li gelî û newalên kûr man.

Bi destên hev girtin hatin; cardin li kêleka min rûniştin; bi kul û keder ji dil axîn kişandin... Xaniyên xwe nizanim cara çendan ji nû ve avakirin. Bi destên xwe yên terizî kevir li ser kevir jiyaneke nû danîn; tovên jiyaneke nû çandin...

Çiyayê Zêrkan

Çiyayê Zêrkan çiyayekî bilind û bi darên mazî û hewrsan xemilandî ye. Li der û dora xwe bi bilindbûna xwe ve bi xof e. Newal û dolên dorûdor hemî di bin heybeta wî de ne; û di demên geşbûn û kêfê de berê xwe didin wî. Zelaliya berbangên sibehan ji qotikên wî dertên. Roj bi tîrêjên xwe yên bi şewq û zer li qotikin wî diteqe, germahî û jiyanê ji wê derê li gelî û newalan direşîne.

Gundên cîran, şêniyên wan, di demsalên bi baran û berf de, li wî mêze dikin. Ew, ji bo wan mîna nîşana rewşa dinyayê ye. Gava serê çiyê bi mij û dûman e, dizanên ko êdî şilî nêzîk e. Berf û baran li rê ye. Serma û seqem dê mideteke din xwe bigehîne warê wan jî.

Birûskên asîmanqelêş di zikê wî de deng didin. Gurmîn û xumîna dengên wan birûskan teyr û tilûran, gur û hirçan, rovî û kerguhan bi hebûn û hêza xwe dide hesandin. Di nav zinar û qelîştokên çiyê de her cûre heywan ji xwe re mekanekî peyda dike, ji lewre di şevên tarî de, dibe warê koviyan; ew dil germ e, bi dil germiya xwe ji her babet jiyanê re hembêzvekirî ye.

Ava çeman, ava kanî û golan ji zikê wî dertê. Zivistanê, ew, li dema şiliyê dilê xwe bi berf û baranê paqij dike û ji nû ve dadigre. Bi hêz û heybeta xwe bi gurmîn û şeqînê, bi rehên xwe, ava wek seqemê li der û dor belav dike.

Tê gotin ko şivanekî di dawiya biharekê de gava li ber pez bû, rastî avzêmekê hat; bîstekê ax da alî, di bin kevir û qelîştokan de xumînî ji avê dihat; şivên meraq kir û bilûra xwe avête nav avê, bilûra şivan, pişti çend rojan xeber gihîşt gundê wî ko li gundekî din di kaniyekê de derketiye. Lê hin jî dibêjin şêniyên gundê quntara çiyê, avzêmek hema bêje di nîva bilindahiya çiyê de dîtin û dest pê kirin û kolan, pişti ko di nav zinaran re guh li xumîniya avê kirin, anîn xirarek ka bera nav qelîştokan dan, meraq dikirin ka dê kaya wan li ko derbê. Paşê pê hesiyan. Kaya wan li gelek gundên nêz û dûr, ji avzêm û kaniyan derket. Lê paşê, bi herikandina axê re devê qelîştokan hat girtin; û ew roj ev roj nema kes cihê wê avzêmê, ya

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

li çiyayê Zêrkan, dikare bibîne...

Bi çîrok û nehîniyên xwe ve çiyayekî navdayî ye. Tirsa dilê zarokan, xweşî û germiya çîrokên zivistanê yên şevên dirêj e, cih û warê mehkûm û fîraran e. Stara evîndaran, dilketiyan û veşartoka keç û xortên dil lerzok e. Çiyayekî dil bi rehm e.

Çîrokên Çiyayê Zêrkan
1 - Bajarê qedîm

Derengê şevê di şikefteke piçûk de, li çiyayê Zêrkan ez di xew re çû bûm, xewn û xeyal, ji şikefta ko di navsera çiyê de bû, min hêla rojhilat xweş didît. Geh bi wan re, geh ji dûr mîna ko dûrbîneke baş li ber çavên min be, hertişt pirr xweş û zelal xuya dibû:

Zivistan ber bi dawiyê ve diçû û bêhna biharê êdî dihate mirovî. Hingura sibê bû. Li geliyê Zêrkan peyayên xweşmêr û mêrxas di tevdîreke giran de bûn. Ew dê ber bi bajarekî mezin biçûyana. Şev bû, tarî bû. Di tûrên -serê hespên- wan de ceh û alif... Li qonaxeke mezin serokeşîr û giregirên wan di xewneke sivik de raketîbûn. Li ber deriyê qonaxê esker di nobedariyê de bûn. Beriya berbangê rabûn, xwe hazir kirin. Piştî limêj û taştê, li ber qonaxa giran civiyan. Bi qisekirin, kustepist, bi coş û heyecan bûn. Piştî midetekê Rîspiyek ji qesrê derket. Li cihekî bilind sekinî. Li der û dora wî mirovên qedir bilind hebûn. Hêdî hêdî li dora xwe mêze kir. Bi şêweyeke nerm dest bi axaftina xwe kir, her ko diçû dengê wî xurttir û bilindtir dibû. Axaftina xwe, »Xwedê bi me re ye« bi dawî anî, bi peyiva »amîn« xilas kir. Hemiyan bi hev re »amîn« gotin...

Siwar li pêş, li pey wan peya ketin rê. Hespên li bin siwaran di heyecan û keftelefta bezînê de bûn. Ber bi bajarê qedîm, bajarê hêviyê, bajarê dilê welatê xwe bi rê ketin.

Berbanga sibê bû,
diherikîn,
pêl bi pêl di geliyê Zêrkan re diherikîn...

Dinya sar bû. Roj li ber hilavêtinê bû. Qotikên çiyê tîrêjên rojê ji dûr direşandin. Eskerên Rîspî bi kincên xwe yên sipî, bi şal û şapikên xwe, bi şaşikên xwe, bi kolosên xwe ve parçeyekî wan çiya û newalan bûn. Hin bi çek bûn. Modelî û eyneliyên wan li milê wan û xencerên wan li ser zikê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wan, li ber wan bûn. Yên bê modelî bi xencer bûn, bi çov bûn, bi kêr bûn... Di tûrê hinan de nanê tenûrê, ew diçûn, ber bi bajarê qedîm diherikîn.

dî sibe bû. Li ber dil û çavên wan siwar û peyayan, wê sibehê roj sed qat ronahîtir û germtir li topika çiyayê Zêrkan bilind dibû. Dikeniya. Modelî û eyneliyên çekdaran di şewqa xwe de dibiriqand. Xencerên wan diçûrisîn... dî dunya germ dibû. Pêla germbûnê xwe li eskerên Rîspî pêçabû. Bi dilekî germ û têrcoş li hespên xwe siwar, di nav qedirbilindên civata xwe de ber bi bajarê qedîm diherikîn...

Her ko diçû hejmara wan zêde dibû. Ji gundên derûdor xelk tevî wan dibû. Piştî demekê êdî gihaştibûn qeraxên bajarê qedîm. Bajar bi beden û bircan pêçayî bû, beden li ber tevgera wan ber bi asîman bilind dibû. Zû bi zû rê ne dida kesî ko têkevin nav dilê wî. Gelek bûyer bi serê wî de qewimî bûn. Bajarê kevin li ser bejna deşta fireh, bi dîmen û dilxweşiya xwe, bi ezamet û heybeta xwe, li ber seqem û bayê, di bin perê çiyayekî, li perê çemekî, mîna bûkeke xemilandî li hêviya xwazgîniyê xwe bû. Bi şik bû, bi heyecan bû... Lê gava çiyayî hatin û li der û dora wî civiyan dilê wî germ bû, ji german hema bêje dikir bikeliya. Wî dizanî, yên ko hatine ji dil û can, ji kezebê, ji evîna dil ji wî hez dikin.

Wan dixwest wî hembêz bikin, dil û mejiyê wî paqij bikin, wî di nav evînê de gêj bikin, sermest bikin, jê re govend û dîlanan bi darxinin, kuçe û kolanên wî bibiriqînin, bircên wî bixemilînin, kemerek zêrîn li pişta wî girêdin, ji gulên sor, zer û spî bi fetlokên kesk tacekê çêkin; bi rûmet û qedirbilindî bi destê Rîspî, wê tacê bi coş û şahî, deynên ser serê wî û wî pîroz bikin...

Li ber bircên bajarê qedîm demeke dirêj man. Şer kirin, ketin nava bajêr, di dilê bajarî de dest bi xencer êriş birin... Lê bajarê qedîm ne hazir bû ko xwediyê xwe, evîndarên xwe hembêz bike. Ew di bin giraniya çekên neyaran de ustîxwar bû, neçar bû... Xwazgîniyên wî bi dilekî xemgîn vekişiyan. Bê dilê xwe ji bajarê qedîm, bajarê dilê çiyayiyan, bajarê paye bilind, bajarê bi keleh û birc, bajarê bi minareya çar ling, bajarê çar derî, bajarê bi tolaz û pêxwasên xwe ve bi navûdeng li pey xwe hîştin û ji bo demekê jê xatir xwestin!

Berbanga sibehê di wê şikefta piçûk de li çiyayê Zêrkan, yê ko wê sibehê bi mij hatibû pêçan, ez bi tevzînokên sermayê ji xewê şiyar bûm. Rabûm ser xwe, çûm ber deriyê şikeftê min li dûr mêze kir, lê ji mijê tiştekî xuya ne dikir!

2 - Şêrko

Şêrko xortekî çardeh salî, ji gundekî bakûrê bajarê qedîm û çiyayî bû. Mirovên wan li bajarê qedîm hebûn; ew li mala wan dima û diçû dibistanê. Hemsalê wî Xelef, kurê malê, bi Şêrko re wek bira bû.

Şêrko tevî bavê xwe hefteyek bû ko hatibû bajêr. Şêrko tevî hemsalê xwe ev çend roj bûn, hertim diçûn ser banê xaniyekî -ku nêzî meydana fireh bû- li meydana sêdaran dinêrîn.

Sêdar,
ew darên mirinê,
bi kindir, zirav û berz.
Sêdar,
li erdê dagirkirî,
bi destên bêbextan rastkirî.
Sêdar,
mengeneyên mirina sar,
mirina xof û dijwar.
Sêdar,
kujarê azadiyê.
Sêdar,
sebebê rondikên zelal.
Sêdar,
ezraîlê bi destê insanan çêkirî.

Dinya germ bû, demsala havînê bû. Li meydana sêdaran esker diçûn û dihatin, li kêleka hev gelek sêdar hatibûn rêz kirin. Li jora her sêdarekê kindirek hatibû girêdan, xeleqeyek li nava her sêdaran ber bi jêr daketî bû. Neçar bû...

Ev roja heftan bû ko her roj qefleyek çiyayî dihatine xeniqandin. Gava Şêrko ew kesên ko cil û bergên wan yên wek gundiyên wî bûn didîtin, dilê wî dişewitî, xem û keserê xwe li wî dipêça, ew diêşand. Rondikên

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

çavên Şêrko û Xelefî zuha bûbûn. Dilê wan bi êş lê dida. Ji kerb û hêrsan, bi mad nexweşî, ew ruyên bê guneh û pak hatibûn guhertin û cihê xwe ji êş û derdan re hîştibû... Di wan çend rojan de zaroktiya xwe ji bîr kirin, te digot qey nema zarok in; awir, meş, xeberdan, rabûn û rûniştina wan, her tiştê wan, hatibû guhertin.

Şêrko piştî çend rojan tevî bavê xwe ji bajêr bi derket û berê xwe dan gundê xwe li hêla bakûrê bajarê qedîm, ber bi çiyan meşiyan...

3 - Pîra Esma

Di piçûkiya xwe de Sosinê jî wek hemî zarokan ji çîrokan gelekî hez dikir, ji lewre ew çîrokên dêw, dirinde, cin, perî, pîrebok, mêrên şevê û gelekên din wiha di mejiyê wê de bi cih bûne ko ew dike nake ji wan xilas nabe. Herçiqas hin texlîtên tirsê di salên wê yên kamil de jî li tirsên wî zêde bûn jî, lê yên zaroktiya wê hertim xewa şevan li wê diherimînin û pirê caran wê di nav xwîdaneke sar de dihêlin. Bîranîn û serpêhatiyên tirsê tenê para wê ne bûn; herweha tê bîra wê ko di zaroktiya wî de pîra wê jî behsa tirs û xewnên tirsê dikir.

Derengê şevê berî berbangê, gava pîra Esma ji xew bi tirs û lerz şiyar bû, diricifî. Li dora xwe mêze kir, bêhna xwe stand, maxên xênî, dîwar, derzîdank, Quran û hemalî, tifika agir, li kêleka tifikê pisîng bi nirenirê, hertişt wek hergavî li cihê xwe bû. Pîra Esma ji xwe re got şikir, hezar şikir ji Xwedê re ko xewn bû...

Ew jî bi selawat û duayên pîra xwe, Esmayê, ji xew şiyar bû, wê jê pirsî ka çi bûye? Pîra wî got »derengê şevê ye, niha razê ez ê serê sibê ji te re bêjim.« Pîra wî Esma jiyaneke dirêj jiya bû. Wê gelek zehmetî dîtibû. Carina behsa serpêhatiyên xwe, malbata xwe, gundê xwe dikir. Lê ya herî giran û ya ko di gava behskirinê de jî pê diêşiya dema xelayê bû. Her di wê wextê de nexweşiya taûn ketibû nav wan; û li gund, her roj çend meyt radikirin.

Serê sibê Sosinê ji Pîra Esma pirsî ka ew çi xewn bû ko ew ewqas bi tirs şiyar bû, Pîra Esma xewna jêrîn ji wî re behs kir:

»Di tariya şevê de qêrîn û hewar kete nav gund. Dengê jin, mêr, kal, pîr û xortan tevlîhev bû.

— Ji rojava hatin, bi tîr û kevan in!

— Agir dibarînin.

— Tîrên wan şivên agir in...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Xwedê hîfza mirov bike...
— Bîsmîlahîrehmanîrehîm... keçê diayan bixwînin...
— Gazî ewliyan bikin...
...
— Ha vaye, direvin. Ber bi rojava direvin.
— Mezinên me, ewliyayan li wan xist...

Komikên mirovan li hev civiyan, dest bi axaftinê kirin. Gotin efrît in, efrîtên mirinê ne, yên ko avêtin ser gund. Bi xêra gorbuhiştan, bi xêra ewliyayan, gundî tenê bi du miriyan vê carê ji destê jana mirinê xilas bûn...«

4 - Newala cinan

Ez ji beriyê dihatim û ber bi çiya diçûm. Piştî nimêja esirê min xatir ji mazûbanê xwe xwest û ez bi rê ketim. Ber êvarê ez gîhaştim biniya gundê Birkan, çend malên ko nêzîkî rê bûn, li ser banên wan, gundî diçûn û dihatin. Gava wan ez dîtim, gazî min kirin:

— Ho xortoo!

Li ser pişta hespê xwe di nav ramanên ber bi malê ko min dixwest gavekê zûtir herim; ji ber bangkirinê ez sekinîm, min serê hespê xwe zivirand, berê xwe da hêla ko deng dihat û min hespê xwe ber bi wan ve ajot. Min silav da wan. Silava min hildan û gotin:

— Keremke em derbasî hundir bibin. Îşev li cem me bimîne. Min sipasî wan kir û got:

— Ez dixwazim gaveke zûtir herim.

Kirin ne kirin min got na ez ê herim. Gotin:

— Heyran bi rastî em naxwazin tu niha bi tena serê xwe herî, piştî vî girê hanê ko li ser riya te ye, geliyê cinan heye. Kesek nikare bi şev tê re bibihure. Tirs heye, cinawir hene, gelek mêrxas bêhiş ketine...

Ez ê xort, bi xwe bawer, xencera min li ber min, li milê min modelî, hespê min li bin min, duxan ji serê min radibû. Kirin ne kirin, min got:

— Ez nikarim bisekinim. Li gundê Mendan ez ê bibim mêvanê dostekî xwe. Min xatir ji wan xwest û berê hespê xwe zivirand ser riya xwe.

Ber êvarê dunya hêdî hêdî tarî dibû. Destpêka payîzê, germiya havînê êdî şikestibû. Wexta ez gehîştim gelî, edî wî kirasê şevê li xwe kiribû. Ez, berê bi roj di wî geliyî re derbas bû bûm, ji lewre derûdor ji min re ne xerîb bû. Bi ajotineke nerm gelî saetek wext digirt. Herçiqas ez bi xwe bawer bûm û min ji xwe re digot ez natirsim, lê piştî nêzîkbûyîna min li gelî, ew tiştên ko gundiyan ji min re behs kiribûn di dilê min de weswe-seyek peyda dikir. Min hespê xwe bi diqet diajot. Lê weswe seya dilê min di mejiyê min de bê hemdê min serpêhatiyek vejand:

Heçî wexta ez zarok bûm, li gund şevên zivistanê yên dirêj bê çîrokan ne diborîn. Eger me zarokan keysek bi dest bixistana û xwe bigîhandana

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mala ko yek ji çîrokbêjên gund lê mêvan bû, wê şevê kêf kêfa me bû. Me li ber dîwêr an jî li quncikekê ji xwe re cihekî peyda dikir û em bê sebir li hêviya çîrokan diman. Çîrokên pelewanan, padîşahan, pismîr û dotmîran, dêwan, pîrebokan, çîrokên li ser dirindeyan û gelekên din... Carina çîrokbêj bi xwe dest pê dikir çîrok digot, carina jî daxwaza guhdaran bi cih dianî. Di navbir an bêhnvedana çîrokbêj de, ji qatix an fikiyên hişkirî, piçek para me jî diket. Me bi dilxweşî dixwar... Heçî şeva ko çîrokên tirsê, an dirindeyan bihatana gotin, tirs dikete dilê me, em bê dilê xwe radibûn û me bi tirs û lerz berê xwe dida malê.

Gava li malê jî pîra min ji me re çîrokina li ser dirindeyan digotin, û bi taybetî yên behsa guran nava me diqetand. Şevên zivistanê yek caran ez ne diwêrîm ji malê derkevim, li derve bimîzim, heta ji min dihat min xwe digirt, lê çare tune bû, gava ez diçûm derve jî, bi tirs û lerz min mîz dikir, di vegerê de ez ditirsiyam û berê ko min xwe biavêtana hundir, min ji xwe re digot, wextî gurekî bi min bigire. Gurên har.

Digotin: 'Rojekê zilamekî jêhatî, di şeveke zivistanê de ko berf datê, dinya sar e, dibêje ez dê herim, mala xwezûrê xwe. Mirovên wî jê re dibêjin, heyran zivistan e, berf e, sar e, dirinde hene, gur hene, birçîne, diavêjin ser gundan, li heywanan dixin; kirin ne kirin, zilam dibêje îla ez dê herim. Dêbêje, vaye hespê min heye, şûrê min li ber min, xencera min bi min re, tifinga min bi min re ez ê ji çi bitirsim. Radibe, êvarê dereng ji gund derdikeve û berê xwe dide gundê xwezûrê xwe. Piştî riya du saetan, ko her berf datê, li newalekê dibe zûrîna guran. Zilam dilezîne, lê ji ber berfê hespê wî nikare pirr zû here. Wele dibêjin piştî demekê zûrîna guran nêzîktir bû, her diçû nêzîk dibûn, mideteke kurt de birek gur derdikevin pêşiya wî. Gur birçî bûn, agir ji devê wan diçû. Piştî demekê zilam û hespê wî avêtin... Berf bi xwînê sor kirin.'

Îlahî ezîm, min dikir ne dikir ez ji çîrok û serpêhatiyan xilas ne dibûm. Li newala cinan, vê carê jî serpêhatiyeke min hat bîra min:

*

Dawiya meha Gulanê bû. dî dinya gelek germ bû bû, hema bêje havîn bû. Mîna hemî gundiyan em jî bi şev li ser banan radiketin. Ez wê gavê 5-6 salî bûm.

varê me zarokan bi hev re cihê xwe li dor sifreya xwarinê girt û me zikê

xwe, bi nan û mehîra ko li ser kaniyê hatibû sarkirin, têr kir. Ji ber ko xaniyên me û cîranan bi hev ve hatibûn avakirin, ser banan wek meydaneke fireh bû. Wê şevê çend mêvanên me jî hebûn. Piştî ko diya min nivînên me zarokan danîn, ez rabûm û çûm ketim nav nivînan. Ji cihê min, bi qasê deh metreyan dûr, bavê min bi mêvanan re bû, ji xwe re sohbet dikirin. Li hêla din, ji me bîst metre dûr heft-heşt keç û jin li dora oberiyekê rûniştî şîre dibirîn...

Piştî midetekê ez di xew re çûm. Li pişta xaniyê me ko ji erdê ne gelek bilind bû, ji bo xanîavakirinê cîranê me gelek kevir avêtibûn ser hev, hema bêje bilinbûna koma keviran gihaştibû ser xanî. Hêla pêşiya avahiyê vekirîbû û rêyek derbas dibû, nêzîkî xênî li ber dîwêr gelek teht hebûn. Ji pêşî, xanî bi qasê 5-6 metreyan bilind bû.

Ez di xew de me, lê min hayê jê tune ko xewn e, bi gotina guran dora gund girtiye, min berê xwe da pişta xanî, min dît vaye gurekî devvekirî, diranên wî qîç di ser keviran re meşiya û xwe avête ser banî û ber bi min hat, (îcar ne xewn e, ez bira dibezim) ez hema ji nav nivînan rabûm û Xwedêyo tu quwet bidî piyan, bi qêrîn û hawara »gur hat!« ez reviyam, ji kêleka komika jinan bi bayê bazdanê ez çerixîm û ber bi hêla tehtan çûm, bi hawar û qêrîna min re bavê min, jinên şîrebir, her yekî ji hêlekê gazî min dikir û bavê min li pey min baz dida. Çawa bû ez hîn jî nizanim, berê ko ez ji ser banî gêrî bin banî bibim, ango ji 5-6 metreyan xwe bavêjim ser tehtan, tam li ser sifirneyê ez sekinîm û rûniştim. Edî bavê min jî gihaştibû min...

Ez serê sibê gava ji xew şiyar bûm, ji min re bûyera şevê gotin, lê xewn xeyal bi zor dihate bîra min. Dihate bîra min, lê ew tiştên ko dihatin bîra min hên jî di bîra min de ne. Ez wê carê ji destê guran xilas bû bûm, lê ji firîna min re jî tenê nîv metre mabû.

*

Ez wê carê ji mirinê xilas bû bûm, lê bi van serpêhatî û bîranînan re sawa tirsê li min giran dibû. Heya ji min dihat min dixwest ez xwe ji wê gerîneka bîranîn û fikirên tirsê xilas bikim, lê karê min çi mixabin ne hêsa bû.

Ez midetekê di newalê de çûm; ji nişkê ve hespê min sekinî û rabû ser lingên xwe yên dawî û şîhiya. Baş bû ko hefsar di destê min de şidayî û min hespê xwe baş nasdikir, an na dê min biavêta. Min hewl da ko ez hespê xwe sakin bikim, gava min li pêşiya xwe mêze kir, çi bibînim, vaye

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

heywanek ko wek golikekê bû, li pêşiya min li ser rê sekiniye û rasterast li min mêze dike. Lê ya ecib wî heywanî mîna insanekî mêze dikir. Min dengê xwe bilind kir; bi hêviya ko ew golik xwe bide alî. Lê ji cihê xwe ne liviya. Min destê xwe avêt tifinga xwe, bi wê tevgera min re golikê çil da xwe û li paş hespî peyda bû. Bi tevgera golikê re hespê min jî ew teqîb dikir, mîna ko nexwaze pişta xwe bide wê heywanê. Careke din ji ber çavên min winda bû, min welê his kir ko ew heywan vaye li pey min siwar bûye, hema bi carekê min dest avêt xencera xwe û çend car bi hêz li pey xwe li hewa weşand. Bi rastî ji min re jî şikek çebû wekî ko ew heywan dixwaze li paş min siwarê hespê bibe. Bi xencer weşandina min re ew cardin li pêşiya min li ser rê xuya bû, geh li pêş geh li paş, geh li kêlekê, geh winda, geh xuya, me mideteke dirêj hev gerand heya em gihîştin qeraxa gelî. dî erdê rast û bê daristan, li pêşiya min xuya dibû.

Piştî ko ez ji gelî, ji nava daristanê derketim, bi taqetek mezin min destê xwe avêt tifinga xwe, ji milê xwe danî, min berê hespê xwe vegerand, berê tifinga xwe da gelî û tifinga xwe di taritiya daristanê, newalê û şevê de vala kir. Şîrqînî ji newalê rabû. Min cardin tifinga xwe avête milê xwe, min li newalê mêze kir; di nav taritiya daran de, du çav dibiriqîn. Piştî bêhnekê winda bûn. Min serê hespê xwe zivirand, berê xwe da riya gundê ko ez ê lê bimama mêvan û ajot...

5 - Hahîîîhîîî

Roja înê bû, li mizgefta gund, li dora hewiz sofî û kalên gundî rûniştî, li hêviya wexta limêja înê bûn. Havîn û kelekela germê bû. Hewizê ko gundî li dorê rûniştîne, serê banê wê girtî û aveke sar ji du çirikan datê hewiz. Ji wî hewizî jî av diherike diçe ser hewizekî ser û dor girtî ko gundî ji bo xuslê dikevinê. Ji hewizê pêşîn destmêj tê girtinê û herweha kesên tî bi tasa ser hewiz ava ko bi sarbûna xwe zebeşan diterizîne vedixwin.

Beşîrê Cindî zebeşek avêtiye nav hewzê û bi sebir li bendê ye ko zebeş sar bibe. Sofî wek her carê li dora hewiz rûniştîne. Hecî Osman behsa qudreta Xwedê û qederê dike, dibêje:

— Xwedê qadirê her tiştî ye. Carekê du mirov minaqeşe dikin, yek ji wan dibêje Xweda qadirê her tiştî ye, dikare saniyeyekê bike salekê û salekê jî bike saniyeyekê; yê din dibêje ma çawa dibe? Yê ko baweriya wî piçek sist e, pêrgî serpêhatiyekî tê. Gava rojekê ji bo xuslê dikeve hewiz; pê re xwe li welatekî xerîb li ber çemekî dibîne... Ez meseleyê dirêj nekim, welhasil li wê derê bi salan dimîne, dizewice, dibe bavê du zarokan. Herweha gava rojekê dikeve çem, îca bîlekis xwe li hewizê ko bêhnek berê ketibû de dibîne. Bi wî awayî dibêje: eşedûbîllah Xwedê qadirê her tiştî ye.

Dora avdanê ya mala Xalit bû, wî li nav bostanan avdanî dikir. Ber bi nîvro avdanî xilas kir û berê xwe da mizgeftê. Hat mizgeftê û derbasî ser hewiz bû. Çû jora hewiz li ber çirikan rûnişt, dest bi destmêjgirtinê kir... Bala wî çû ser dev delîngên wî, bi herî bûn. Ji cihê xwe rabû, çû jêra hewiz, delîngên xwe ji heriyê paqij kirin û cardin hat cihê xwe yê berê rûnişt, destmêjgirtina xwe domand...

Li kêleka hewiz yek ji wan sofiyên rûniştî, bi dengekî bilind got:

— Hahîîî hahîîî...

Beşîrê Cindî :

— Înşelah xêr e Hecî Remezan?

Hecî Remezan dest pê kir:

— Heyra ez çi bêjim. Hinek berê ev xortê hanê hat û rasterast derbasî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

jora hewiz bû, çû li ber çirikan rûnişt. Paşê ji wê derê, gava rabû çû jêra hewiz rûnişt, min di dilê xwe de got, »vaye vî xortê hanê qedirê me kalan girt û çû jêr,« min got »wele îcar dinya vaye baş bûye, lê piştê ko cardin rabû çû cihê xwe yê berê, ez ji fikra xwe poşman, min got »na wele dinya her xira dibe.« Hahî ya min ji ber vê yekê bû...

6 - Xwe gij bike

Ev cara sêyemîn bû ko Taco dizewicî. Xwedê rehma xwe li wan bike, her du jinên wî yên berê mirin. Piştî mirina jina wî ya yekemîn, hin kustepist ketin nav gund, lê bi mirina jina duyemîn re êdî kesê ko bi wan kustepistan ne hesiya ne ma. Li ser tenûran dihate gotin: Herê keçê ma te ne bîhîstiye, dibêjin mirina jinên Taco ji ber mezinahiya sit.. wî ye. Rebenên Xwedê!

Lê ya rastî hinan dixwest ew xwe biceribînin lê cesaret ne dikirin. Piştî çend mehan gotinên Nermê ya bî, ko digot ez ji çu tiştî natirsim, gihîştin guhê Taco. Taco mirovên xwe şandin, Nermê hate xwestin.

varê, li mala Taco piştî xwarin û sohbetê heval û mirovên wî çûn malên xwe, Taco û Nermê bi tenê man. Herê ez dibêjim bi tenê man, lê ya rast ev e ko, li ser banî li ber rocinê çend mizirên gund, xwe bêdeng danîbûn û li hêviya tiştine bûn... Taco û Nermê ketin nav nivînan, Nermê ji Taco re weha got:

— Binê, ne hewce ye em fedî bikin. Bi rastî ez piçekî ditirsim. Divê tu hêdî hêdî ... û bi diqet bî.

— Baş e.

Di nav nivînan de laşê wan li hev keliya... Nermê di nav ax û oxîn re ji Taco re got:

— Hêdî, hêdî ..., heya ez bêjim bes!

— Baş eee...

Nermê:

— Piçek dî, piçek dî, piçek dîîî....

Taco:

— Hew...

Nermê:

— De îcar xwe gij bike û lêxeee...

Ji wê şevê û vir de, gava xortan êzing hûr dikir, erd dikola, an karekî din yê giran bikira, derhal henek dikirin û ji hev re digotin: Kuro, xwe gij ke û kar bike...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

7 - Heqê mesrefê

Ew karexezala çiyayê Zêrkan, keçikeke bejin orte, reng genimî, xwediyê çavên reş ên mîna kil bû. Wê dilê gelek xortan bi xweşikbûna xwe dabû ber pêlan; gava ji malê derdiket û diçû ser kaniyê an jî nav bexçe, ji awirên bi kul û keser xilasiya wê ne mimkin bû. Gelek diyan nifir li wê dikir; ji lewre wan di çavên lawên xwe de êş û elema xweşikbûna wê xezalê didît, dilê wan bi zarokên wan dişewitî. Ew xezal ji maleke halxweş bû. Erê xortên gund dikizirîn lê kesî cesaret ne dikir ko xwe li mala bavê wê bigirin û wê ji xwe re bixwazin. Bêbavê bi spehitiya xwe dizanî, ji ber vê yekê jî di nav hevalên xwe de hertim qure û pozbilind bû.

Kurê şêx yê xort û pozbilind ko di salên xwe yên kamilbûnê de bû, li nav gund bi quretî digeriya. Rojekê gava ew xezal ji ser kaniyê dihat, pêrgî wî bû. Bi dîtina wê re qirik li wî ziwa bû. Piştî ko ew bihurî çû jî, awirên wî ji par ve tîr li wê dibarandin. Herê tîr li keçikê dihatine barandin lê kevan bi xwe disincirî, kelên xwestinê babîlosk di dilê wî de radikir. Ji wê rojê û pê ve wî her çavên xwe li wê digerandin. Heta rojekê ber bi êvarê di nav zeviyê pembo de, wî kula dilê xwe, agirê di nav hinavên xwe de, li ser dilê wê sar kir...

»Ax, ax hezar carî ax. Lawo bila ev şîreta min çu carî ji bîra we neçe.« Ev gotin ji devê Şemdîn yê şêst salî û mêrebî her tekrar dibûn. Xortan ji wî pirs dikir û wî jî bêwestan meseleya xwe ya zewacê ji wan re digot. »Nas û dost hatin gotin: 'Xalo, vaye me qîzeke hevdeh salî li gundekî quntara çiyayê Zêrkan ji te re diye. Heke bi dilê te be jî em ê ji te re wê bixwazin.' Em çûn, min keçik dît, bi rastî jî qîzeke pirr xweşik û delal bû. Min çu car bawer ne dikir ko wê keçikê bidin min. Ez li ko, ew keçik li ku. Di xewna şevan de jî min yeke welê ne dîtibû. Ji bo pesindana wê ez çi bêjim jî dê kêm be. Lawo hema bi kurtî ez bêjim, wele û bîle bêbavê mîna horiyên buhuştê bû. Min ji nas û dostên ko alîkariya min dikir pirsî, ka ew henekên xwe bi min dikin, mesele çi ye. Gotin 'Na, ne henek e, vaye heya hefteyekê em te dizewicînin.'

Werhasil ez serê we neêşînim, paşê çûn, keçik anîn mala min, dost û

mirovan me bi hev re xwarin xwar; xewn û xeyal lê ez bi wê re zewicîm. Lawo ma min ji ko dizanî, ew keça bêbav dê serê sibê rabe biçe mala bavê xwe, gundê xwe.« Xortan jê pirs dikir, digot: »Xalê Şemdîn ma te ewqas mesref lê kir ma tu bi wê re raneketî?« Şemdîn di bin zimbêlan re dibişirî û bersîv dida: »Çawa ez raneketim, ez xalê we me, wele ez du caran bi wê re razam. Hema çi be jî min heqê mesrefa xwe derxist.«

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Komûtan

Cara yekemîn bi cîpa eskerî hat û li ber qereqolê peya bû. Avahiya qereqolê li perê gund li hêla rojhelatê, xaniyekî yek qat bû. Di eslê xwe de wî dixwest cîpa xwe li qeraxa gund bide sekinandinê û bi rêçûna xwe ya eskerî di nav gund de piyase bike, da ko temamê gundiyan, wî bi bejn û bala wî, bi kinc û meşa wî ya eskerî, bi rutbeya wî ya »komûtan« bibînin. Di xwest di roja pêşîn de xofekê têxe dilê wan.

Piştî ko xwendegeha leşkerî di sala şêst û nehan de xilas kir, ev cihê wî yê yekemîn bû ko wî dê dest bi kar bikira. Dilê wî germ, bi daxwaz û bi heyecan bû. Bi şewq û serbilindî dê xizmet bikira. »Şaristaniya bilind« ya ko li xwendegeha eskerî fêrbû bû dê li derûdora xwe, li gundan bi reşandana, dê wek çirayekê, di nav tarîtiya newal û çiyan de şewq bida.

Gava di deriyê hewşa qereqolê re kete hundir onbaşiyek û deh esker ketibûn rêzê û li hêviya wî bûn. Piştî silav û teqdîmên eskerî ew derbasî bin çardaxa li hewşa qereqolê bû. Ber êvarê bû, gundî hîn ji karên xwe yên rojane venegeriyabûn malê. Ji lewre komûtan di dilê xwe de meraq dikir ka gelo çima wî kes ji gundiyan ne dîtibû. Hema bêje li ser riya xwe rastî tu kesî ne hatibû, ji bilî zarokan. Ji xwe gava çavên zarokan bi eskeran diket, zarokan xwe dida alî, an jî li pişt daran, keviran, dîwaran xwe vedişartin û bi dizî li rêçûna eskeran dinêhêrtin.

Piştî çend rojan li deverê herkesî êdî dizanî ko komûtanekî nuh hatiye. Ji gund û gundên derûdor kesên ko li qereqolê çay vedixwarin, hatin li komûtan bi xêrhatin kirin, »çaya xwe« vexwarin xwe dan nasîn û çûn. Wî bi xwe jî hemî rapor û dosyayên derheqê gund û gundên derûdor xwendin. Wî êdî dizanî ka kî tê çaya wan li qereqolê vedixwe.

Ev çend roj bûn ko Filo tevî pismamê xwe Mûsa li gundekî nêzî sînor li hêviya »malê« xwe bûn. Roja înê xeber dan wan gotin »malê« we dê îşev teslîmê we bibe û divê di eynî şevê de hûn ji sînor derbas bibin... Filo û Mûsa bi alîkariya rêberan li ser pişta hespên xwe û bergîrek barkirî ji sînor derbasî hundir bûn. Herçî Mûsa ev cara çaran bû, lê Filo ev cara yekemîn

bû ko dihat qaçaxiyê. Filo hin pere deyn kiribû, hin jî ji firotina çend bizin û mêşinên xwe bi dest xistibû.

Ev du hefte bûn ko bi roj li gundên nas an jî di şikeftan de diman, bi şev bi dîqet ber bi gundê xwe diçûn. Jibo ji rêçûna hespan deng neyê simên hespên xwe kulav kiribûn. Niha bi tenê riya çend saetan li pêşiya wan ma bû, jibo ko bigehên malê.

Filo zewicî û bavê du zarokan bû, zarok hîn piçûk bûn, nan û xweya çar kesan ketibû stûyê wî. Jina Filo dizanî karê qaçaxiyê dijwar e, gelek kes hatine kuştin, girtin, an birîndar bûne, wê ne dixwest Filoyê wê here qaçaxiyê, lê Filo carekê biryara xwe da bû, dê biçûya. Filo dixwest bi karê qaçaxiyê hin peran bide serhev da ko paşê karibe ji xwe re zeviyekê bikire. Ji jina xwe re digot: »Ma wek herkesî parçeyekî erdê me jî hebe xirab e?« Şeva ko sibetir dê Filo birêketana, di nav cihan de Filo li ber jina xwe digeriya, dixwest berê çûyîna xwe dilê wê xweş bike, wî soz da wê got »piştî vegerê ez dê bazinekî zêrîn î buha ji te ra bikirim.« Jina wî rondikên xwe di tariya şevê de bi goşeya lihêfê zuha kirin, xwe nêzîkî Filo kir û ket hembêza wî.

Meco bi tirkî digot:

— Komûtanê min, min xeber stendiye ko sibe bi şev dê hin qaçaxçî di newala Kûsiyan re derbas bibin. Pirr mimkun e ko barê wan pirr hêja be.

Komûtan ji kêfan ne dikarî li cihê xwe bisekine, devê wî ji hev diçû; di bin simbêlan re dikeniya.

Nobedar ji komûtan û mêvanê wî re çay anî. Komûtan ji Meco re got » pirr baş e, hertim bila welê çavên te vekirîbin. Ez vî tiştê te kiriye ji bîr nakim. Aferîn ji te re.« Derengê şevê Meco xatir ji komûtan xwest, ket riya gundê xwe .

Komûtan tevî heft eskeran roja dotir ber bi newala ko Meco salix dabû, bi rê ketin. Hatin di newalê de bi cih bûn, ketin kemînan û li hêviya qaçaxçiyan man. Derengê şevê çend qeretûn xuya bûn. Edî dilê komûtan û eskeran bi hêztir lê dida. Piştî ko qeretûn hatin nêzîkî wan, berî ko bi îşareta komûtan li wan bi teqînin, eskerek jibo çîpê xwe yê tevizî rehet bike lingê xwe yê çepê dirêj kir, bi livîna wî re kevirek gêr bû, bi gêrbûna kevêrê re Filo û Mûsa ketin tevdîrê, bi »dengê teslîm bibin, dora we hatiye girtin« li wan hate teqandin, hespên wan veciniqîn. Filo û Mûsa berê hespên xwe dan kêleka şiverê da ko di nav daran de xwe winda bikin. Di wê gelemşeyê de bergîr ji dest wan filitî û ber bi pêş ve çû...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Filo û Mûsa di nav daristanê de rêça xwe winda kirin, lê bergîrê wan kete destê komûtan û eskerên wî.

Derengê şevê hîv bilind bû bû. Dinya di bin heyveronê de bû. Piştî çend saetan gihaştin qereqolê. Bi emrê komûtan anîn barê bergîr danîn, hejdeh mawzer bûn. Komûtan ji kêfan dikir bifire. Eskeran, jê re av anîn ser û çavê xwe bi ava sar şûşt. Li bin çardaxê rûnişt; li hêviya qehweyê bû.

Sebra wî ne dihat, fikrên curbicur di serê wî de diçûn û dihatên, ne dikarî li ser tu hizrekê bisekine, bifikire; tu rastiyê bêjî ji fikrên tevayî bêtir, parçeyên hin ramanan di hişî wî de divejîn û winda dibûn, ew diçûn hinên din peyda dibûn. Piştî qehwe vexwarinê rabû ser xwe, li bin çardaxê çend car çû û hat; her difikirî. Meşiya çû ser banê qereqolê, dest bi piyaseyê kir. Li asîman fekir, berê xwe da rojhelat, di dilê xwe de »ev roj çima hilnayê îro« got, hêrs bû; nifirek kir. Ji hêlekê ji serkeftin û bidestxistiyên xwe sermest bû bû; ne dixwest wê serkeftinê bi hinên din re par ve bike; li hêla din ji kêfa xwe re li şirîkan digeriya, dixwest dinya alem hemî pê bizanin; werin, wî karê payebilind bibînin, bibihîzin û wî pîroz bikin. Li çiya mêze kir, di nav tariya şevê de çiya bi xof û heybet dixuya. »Ev çiya jî nahêle ko roj zû derbê« got, bîstekê sekinî, bi gotinên xwe keniya. »Ez jî ema bûme pitpitok« got û hinek din jî keniya... Çû li ber kevirên li ber banê qereqolê qûçkirî sekinî, piyê xwe yê çepê danî ser koma keviran, di bin roniya heyvê de li siya xwe temaşe kir... Ji berîka xwe paketek derxist cixareyek xiste nav lêvên xwe, pêxist, serê xwe piçek bilind kir; niha pişta wî rast, sînga wî nepixî û zik ber bi hundir kişandî bû; cardin li siya xwe fekir; bi kêf û bi temaşekirina siya xwe çend nefes li cixareyê xistin... Meşiya hat qeraxa pêşîn ya xênî sekinî, ji jor de ji ser banî li çekên ber qereqolê fekir; bîbilkên çavên wî dibiriqîn, eger baskên wî hebûna dê firek bidaya xwe û xwe bera ser wan çekan bida; mîna teyrekî ko nêçîra xwe dixe nav pencên xwe dê wî jî her wisa bikira.

Ji ser banê qereqolê daket hat bin çardaxê, fikireke balkêş hate hişî wî, xwe bi xwe »bila bibînin, bila ji wan re bibe ders« got. Gazî nobedaran kir, ji wan re got »van çekan hildin û li pêşiya qereqolê sêpikan çêkin."

Eskeran sêpik çêkirin. Komûtan rabû, ber bi riya ko di ber qereqolê re derbas dibû çû, di nav rê de sekinî û li sêpikan mêzekir, lê ne eciband. Got »çekan li ber dîwar rêz bikin!« wek wî gote kirin. Careke din çû ji dûr ve li çekan fekir, ji wê derê emir da » bila piçek ji hev firk bin! » ... » temam temam îcar çêbû, muhteşem xuya dikin« got û hat li bin çardaxê rûnişt.

dî sibe bû. Roj ji pişta çiyê bi şewq bilind dibû, tîrêjên wê asîmanê

gund zûde ronî kiribû. Gundî wek her carê pişti limêj û xurîniyê jibo herin nav zeviyên xwe dihatin û di ber qereqolê re derbas dibûn. Lê wê sibehê guhertinek balkêş xwe li pêş awêrin wan dida xuya kirin; namlûyên çekên li ber dîwarê qereqolê rêzkirî dibiriqîn û li bin çardaxa qereqolê ling li ser lingan rûniştî, ji cixara komûtan duxan hildikişiya...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Jiyaneke weha bê mane ye!

Min li ser bircên bajarê xwe ew nas kir. Nuha lê difikirim, lê xwezî min ne ew mirov bidîta û ne jî derdê wî bibihîsta. Ji xwe pişti axaftina me, min ew nema dît. Roja dinê min terka bajêr da; lê gotinên wî baş tên bîra min.

Mideteke dirêj bû ko ez ji bajarê xwe dûr mabûm. Bi çi awayî biba jî divê min serîkî lê bida. Ez çûm. Piştî demeke dirêj vegera min ya welêt, bû bû sebebê pêlên bîranînan. Kolan û taxên bajêr li ber çavên min vedijîn, dibûn dîmenên renga reng. Bajar gelekî hatibû guhertin. Dîmenên ko berê di bîra min de ma bûn an jî di mejiyê min de bi cih bû bûn bi yên nuh re tevlîhev dibûn. Min hewl dida ko ez wan bidim ber hev û lê hûr bibim ka kîjan ji wan bêtir spehî ne. Geh yên kevin geh yên nuh bi ser diketin. Şerê di navbera wan de dijwar bû. Gava ev kolan û avahiyên kevin yên ko kultur û tarîxa bajêr diyar dikir li ser piyan bûn û li ber çavan bi her awayî xwe nîşan didan ez pê kêfxweş dibûm, kela dilê min radibû, pêlên bîranînan di ser hev re diqulubîn; ez dibûm zaroyekî deh salî û di nav wan kolan û awahiyan de dibeziyam. Lê li hin cihan gava min di şûna wan avahiyên kevin de avahiyên 'nuh' didîtin, dilê min dihat givaştin, bîr û xeyalên min tevlîhev dibûn min zarotiya xwe tê de ne didît. Ma malxirabno we ne dikarî li cihekî din ev avahiyên xwe yên 'nuh' ava bikirana. Ma çi heqê we hebû ko hûn jiyana min, xeyalên min, bîranînên min ji hev bikin û bidin ber kêran!

Xeyal, bîranîn... Carina ez welê bi xeyalan re dijiyam ko min derûdora xwe, hevalên xwe ji bîr dikirin. Erê tiştên ko wan digot û dengê mirovan ji hawirdor dihat guhên min, lê mîna ko ji çend sed metreyan wek kustepistê dihat û dibuhurî. Ji xwe min jî guhdariya wan ne dikir. Roj, hefte û meh bihurîn. Herçiqas hîn jî carina mirov an hevalên min bi min re der diketin jî, lê yek caran min dixwest ez bi tenê bigerim.

Kesera dilê min, bircên bajarê min bûn. Erê hin birîn di laşê bircên wî de çêbû bûn; pirr eşkere xuya dibû ko bê xwedî ne û kesek birînên wan derman nake, li gel hawar û fîxanê jî şêniyên bajêr bê deng bûn. Rast e serî li bircan hatibû şikestin, lêbelê hîn jî ji qudret û spehitiya xwe ne

ketibûn. Li derûdora wan avahiyên bilind hatibûn avakirin û wek berê ji dûr ne dixuyan; lê her di cihê xwe de bûn. Bi hemî ezamet û heşmeta xwe mîna ko bêjin 'em hebûn û hene' û bi hev re xwe mîma ejderhayekî reş î gewr li bin rojê kilorkirî vezelandibûn.

Ber êvarê, germiya hewayê şikestibû; ez ji malê derketim û min berê xwe da Deriyê Mêrdînê û meşiyam. Piştî ko ez gihîştim ber bircan ez bi derenceyekê re hêdî hêdî hilkişiyam jor. Li wê derê min bîstekê bêhna xwe vekir, berê xwe da hêla rojhelat û ez li ser bircan meşiyam. Bi hemdê xwe, geh li bajêr, geh li nav bexçeyên Hewselê yên li biniya bajarî, min mêze dikir. Li ser bircan carina rastî hinan dihatim.

Ez ji gera li ser bircan her mîna berê gelekî kêfxweş dibûm. Hefteyê dusê caran miheqeq ez diçûm. Roja yekşemê ez cardin çûm, lê berî wê carê tiştekî bala min kişandibû: Mirovekî dora sîh salî li ser bedenê -dibe ko wekî min ji xwe re digeriya- bû. Lê tiştê balkêş ev du sê car bû dihat û her li eynî cihî rûdinişt, berê wî li başûr li jêr li nav bexçeyên Hewselê mêze dikir. Ji ber ko ev çend car bû em pêrgî hev hatibûn me êdî şiklê hev dinasî. Vê carê jî gava min ew li wir dît min ji xwe re got: ez ê bi vî mirovî re bipeyîvim. Gava ez gihîştim cem wî min silav lê kir, bêî ko ji cihê xwe rabe serê xwe zivirand, piştî ko dît yê ko silav lê kiriye ez im, rabû ser xwe silava min wergirt. Min destê xwe dirêjî wî kir me destê hev hejand.

Em li kêleka hev rûniştin. Bexçeyên Hewselê, çemê Dîcle, avahî û koşkên xuyayî bûn mijarê sohbeta me. Piştî bêhnvedaneke dirêj ez rabûm ser xwe min jê xatir xwest û ez meşiyam. Ew mirov cardin li cihê xwe rûnişt.

Roja dinê ji min re bû meraq gelo ew mirov çima diçe her li eynî cihî rûdine û diponije. Ma ev tiştekî normal bû? Ber êvarê ez cardin ji malê derketim û min berê xwe da bircan. Belê, ew li wir bû. Ez çûm cem wî. Li kêleka wî rûniştim, bi rûniştina min re wek ko ji nişkê ve ji xewnê şiyar bibe li min mêze kir, di demeke pirr kurt de bi awirên xwe mîna ko bêje tu kî yî, nêrî, lê wî ez naskirim an jî ez hatim bîra wî; got »li min bibuhure, hişê min li dereke din bû.«

Piştî halê hev pirsîn û bîstekê sohbetê, min hêviya lêbuhurînê lê kir û got: »Ev çend car in ko ez te li vir her li eynî cihî rûniştî dibînim. Xêr e?«

Wî mirovî berê xwe da min, di awirên wî de gelek pirs û meraq hebûn. Bi awirên xwe 'gelo ez bersîva pirsan bidim an na, gelo ew çima van pirsan dike', digot. Piştî bêhneke xweş, wî destê xwe xiste berîka xwe pake-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ta cixarê derxist, ewil dirêjî min kir, paşê cixareyek jê kişand, xiste nav lêvên xwe, bi pêxistinê re çend hilmên giran kişandin. Derûdora wî di nav duxana cixarê de ma, lê bi xêra cihê me dixan tavil ji hev belav dibû. Wî mirovî dest pê kir û got: »Bira, ez ji ko dest pê bikim, tu rastiyê bêjî min ne dixwest ez pirsgirikên ko min diêşînin ji kesî re bêjim. Lê madem tu pirr meraq dikî, ez dê bi kurtî ji te re bêjim. Mimkin e bersîva pirsên ko min diêşînin û rehet nahêlin li cem te peyda bin? Heke ez rastiyê bêjim, ev halê me ango zêde nenasîna min û te bi kêrî min tê. Ji lewre ez bi şêweyeke rehet dikarim behsa xwe bikim.« Serê xwe rakir li min mêze kir, belkî dixwest ji rûyê min fêm bike ka ez guhdariya wî dikim an na.

»Belê, nuha tiştê ko min diêşîne ev e: Ji zaroktiya min heta nuha min her bi ya derûdor û bi ya mezinan kir. Gava ez zaroktiya xwe didim aqilê xwe her ji min re ji zarokên din re digotin, 'guhdariya dê û bavê xwe û mezinan bikin'; li dibistanê gotin 'bi ya mamosteyan bike, guh bide wan,' li cihên kar gotin 'bi ya patronê xwe bike' bi saya hin hevalan ez bûm endamê partiyeke siyasî û li wê derê her gotin 'bi ya fermanên partiyê û serokê wê bike'; gava min eskerî kir, gotin 'ferman û komutan hertişt in'; piştî eskeriyê ez hatim malê, ez nuha sîh salî me. Jiyana xwe ya borî didim aqilê xwe, li derûdora xwe dinêrim, ji bilî ko min bi ya hinên din kiriye tiştekî din ne kiriye! Ez serê te neêşînim, jiyaneke weha bê mane ye.'

Bêhneke dirêj em herdu jî bêdeng man, paşê wî axaftina xwe domand, 'belê bira, ka tu çi dibêjî?'

Ez mit û mat mam. Ez ji gotinên wî yên dawiyê veciniqîm, tirsiyam; »jiyaneke weha bê mane ye« mebesta wî ji van gotinan çi bû? Dixwest çi bêje, dixwest çi bike? Dihat li ser bircên berz rûdinişt, ma gelo întîxarê difikirî? Ma min dikarî ez bersîva pirsa wî bidim? Min dê çi bigota. Ez midetekê fikirîm; lê çu bersîvek ko ez bi xwe pê razî bim ne hate bîra min, hîn jî ne hatiye!

Dergeha Evîndaran

Aşiqbûyîn awayeke dînîtî ye, Sigmund Freud

Ferhadê Cembelî û hevalê wî yê herî canecan, Metînê Neco, carinan dilê xwe ji hev re vedikirin û hemî ew birîn û êşên ko ji destê jiyan û zehmetiyên jiyanê dîtibûn, eşkere dikirin; lê bi ya wan dostan, dijwariya herî giran, derdê dilan, evîna yaran bû.

varekê ew û hevalê xwe li meyxaneya Derya rûniştibûn û di binê gelek qedehan de bang dabûn; mij û dûmana sermestiyê li ser serê wan kom bû bû û xwe hêdî hêdî li hemî bedena wan dipêça. Ferhad şûşeya dilê xwe careke din vekir û got:

Kekê min ji derdê evînê axx û ax, hezar car ax bi ser hev de ax! Ez yek ji wan mirovan im yên ko zû bi kula evînê dikevin. Hema li ko derê keçikek an jineke xweşik bibînim û eger bala xwe baş bidim û bi baldana xwe re lê hûr bibim û eger ev yeke hanê di nav çend rojan de dubare bibe, wê gavê wey û hezar car wey ji halê min ê belengaz re, êdî min mala xwe bi destê xwe xira kiriye. Hemî alim û zanayên dunyayê bicivin jî nikarin min ji nexweşiya ko ez pê ketime bifilitînin. Hekîmê Lokman li ba min be û şev û roj li ber serê min rûne jî feyde nake; Metîncan ey ne tu nizanî ev derdê bê derman çi bela ye! Bila Xwedê Teala gurên serê çiya û newalan bi vî quzulqurtê nexîne. Ev bela bila bibe para dijminê min yên herî bêbav!

(Ferhad di navê re qedeha xwe radike, »noş« dibêje û axaftina xwe dewan dike.)

Ez bi xwe nizanim ka dunya alem jî wek min e an na? Lê dil eee, him dibêje min hewalbend divên, min hemderd divên; bila ez zanibim ko nexweşê bê derman ne tenê ye, dost û hevalên wî jî hene; him jî dibêje derdê evînê û hezkirinê giran e, ez naxwazim kesek vî barê giran hilde û bi vê nexweşiya bê çare bikeve.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Cano, de ka îşev bibe hemderdê min, bi min re çend qedehên din binoşîne û guh bide birayê xwe, ez ê ji te re çîrokên evîniyê, yên ko hatine serê min, bêjim. Piçekî kula dilê xwe sivik bikim, were bibe rêvekirê birê xwe da ko bi qedehên meyê re ez xwe berdim nav çemê evînê. Bibim mêvanê wan bêbavan, wan gulperiyan. Bihêle kekê min, bila ez di nav pêlên evînê de di nav pêlên şerabê de bêm coşê, bila dil û rih bibin yek, bila tu perde di nav me de nemînin. Bila bi meyê ez meyxoş bibim, bi meyxoşî ez serxweş bibim. Bihêle bila ez bifirim, ji bedena giran derkevim, xwe bigehînim mekana dilxweşan, îskana meyxoşan, dergeha serxweşan; ew dikarin min bibînin, nas bikin, min vexwînin, min sermest bikin, bila ew bêjin eyyy ruhê pak tu bi xêr hatî!

(Şingînî ji qedehan radibe. »Noşşş!« Ferhad axaftina xwe dewam dike...)

(Kejê)

Kekê min, cara yekemîn gava ez bûm aşiqê keçeke xweşik; wê gavê, min hîn di dibistana navîn, di sefa duduyan de dixwend. Li ber dilê min navê keçikê Kejê bû. Keçikeke bejin li hev û dirêj, di bin kirasê wê yê reş yê xwendegehê de memikên wê mîna du hinarên deqandî xuya dibûn. Nebêje hey mal wêran, ma tu ji ko dizanî, ew welê deqandî bûn... Ax ax! Hinarikên ruyê wê hertim pembe bûn. Ruyekî girover, bêvileke li hev li ruyê wê, sipehiya çavên wê zelal û bê leke, rengên çavan kesk, eniyeke fireh, porê wê ji rengên qehweî û zer têvel û bi pêl bû, porekî dirêj, xwe ji jor xelek bi xelek ber bi jêr ber dida, te digot qey hertim li ber sura bayê di pêldanê de ye. (Ferhad li hewayê bi destan wêneya xelek û pêlên porê Kejê çêdike.) Aha ew keçika bêbav di sinifa min de bû. Wê karexezalê hefteyê pênc rojên xwedê, dilê min ê belengaz dida ber pêlên coşê ji hal dixist, ez per û perîşan dikirim. Carina welê lê dihat ko min ji devê mamoste çu tiştek fêm ne dikir. Belê û belê, her çi qas min li mamoste mêze dikir, lê aqil û fikir li cem keçikê bûn. Eger rojek nehata dibistanê, tavilê ez diketim şikê, ji min re wes wese çêdibû, min xwe bi xwe digot: Gelo nexweş e, jibo çi ne hatiye? Min, li cihê wê yê runiştinê, bi çavên xwe yên melûl mêze dikir...

(Ferhad qedehê radike, dibêje »noş kekê min noş, ji roniya çavên wê keçikê re noş.« Bi van gotinên Ferhad re, Metîn dizane ko dawiya vê

çîrokê ye. Ji xwe ne cara pêşîn e ko dibihîze. Dizane ko tayîna bavê keçikê rabû bû bajarekî din û evîna Ferhad hatibû qurmiçandin.)

(Metîn ji cixareya xwe ya destpêçanê nefesek baş dikişîne û mîna ko dora axaftinê ya wî be dest pê dike. Ew jî behsa evîna xwe ya pêşîn dike:)

(Gulperî)

Kekê min, xwezî wî rojê min rojname nekiriya û ez di ber rojnamefiroşê li ber sînemaya Dîlanê nesekînîbama. Ji xwe hertim welê bi serê mirov tê. Mirov pêşîn guh nade û wek tiştekî edetî dibîne; lê gava paşê lê difikire, wê gavê ax û wax êdî fêde nake, kekê min.

Danê êvarê, saet dora çaran bû. Germîya hewayê di wê saetê de dişike. Ez çi bibînim, Ferhadcan, keçikeke bejin zirav, sipî û sipehî, bi meşeke nerm û bi xwe bawer, ber bi qulûbeya rojnamefiroş dihat. Goya min rojname dixwend, lê ne çav ne jî mejî êdî wî karî dikin. Herdu jî biliyê keçikê bûne bi heyranî li wê mêze dikin û difikirin... (Metîn serê xwe radike, mîna ko li asîman mêze bike, dibêje:) Ey Xwedayê erd û asîman, ey Şahê Keremê ma xweşikên wisa li vî welatî, li vî bajarî, li vê taxê, li vê kolanê hene! Bila Zelîxaya Usif, bila Leylaya Mecnûn, bila Şêrîna Ferhad porê xwe kur bikin, bila ji qedera xwe re bigirîn, ma ew çi tofan bû, ma ew çi heyv bû, ma Zîn û Stîyê ew bidîta dê şerm nekira? Kekê min, wele û hezar car wele û bîle, ez wisa fikirîm. Lê, min baş fêm ne kir, keçikê kovarek an jî rojnameyek kirî, piştre zivirî ber bi rojava meşiya. Min jî mîna yekî efsûnkirî da pey wê. Bêî ko ez lê bifikirim an jî zanibim ka ez çi dikim, li pey wê midetek meşiyam. Di ber deriyê avahiyeke berz de ez li xwe varqiliyam. Keçika bejingul di deriyê apartmanê re ket hundir û ji ber çavan winda bû... Ez midetekê bêî ko zanibim çi dikim an bikim li cihê xwe mam...

Ji nişkê ve yekî destê xwe danî ser milê min û tiştekî got ko min fam ne kir. Ez zivirîm, lê mîna yekî ko ji xewê bête şiyarkirin, ez hîn jî, ne li ser hişê xwe bûm. Min his dikir ko çawa xwîn xwe dide serûçavê min. Bû pilpila min, min tiştin gotin lê pîne ne dibûn... Nasekî min bû, paşê min mesele jê re got, pirqînî pê ket...

(Bi van gotinan re pirqînî bi Ferhad û Metîn jî ket. Qedeh cardin hatin rakirin... Metîn nefeseke din li cixareya xwe da û çend beyt li pey hev rêz kirin :)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dilo carek were cem me
Hezar sal e benda te me
Dilo carek were cem me.

Bi evîna Mem û Zînê
Bi taqeta Fer û Şînê
Dilo carek were cem me.

Wê ez birim kebab kirim
Ji bîr û hiş bêpar kirim
Dilo carek were cem me.

Xeman bibe yaran bîne
Derdan bibe derman bîne
Dilo carek were cem me.

Van qedehan binoşîne
Ji xezalan neêşîne
Dilo carek were cem me.

Meyperest im, ez serbest im
Ji evînê ez sermest im
Dilo carek were cem me.

Li gel heval û serxoşan
Di dergeha, di meyxoşan
Dilo carek were cem me.

(Garson ji wan re hin pêvexwarin û mey tîne... Jineke stranbêj strana Hîcranê dibêje. Midetekê guh didin wê. Paşê Ferhad dibêje:)

Kekê min niha ev jinik jî dibêje ez stranbêj im. Bi rastî gava ez guh didim ên wek vê jinikê stranbêjeke mîna Emelê li ber çavê min dibe melîke; melîkeya stranbêjan. Keko gava Emel strana Hîcranê dibêje mirov pê re dihele, carekê dengê wê ji nîva kezebê dertê, dengekî pak û zelal, dengekî ji kûrahiya rih, stranbêj bi xwe pê re dijî, wisa ko mirov dikeve ber pêlên hîcranê, derd û kul bi ser hev ve diqulubin, ax û keser gul vedidin, bi wê

êş û elemê re mirov gêj dibe, serxweşiyeke guhertî xwe dide der, di wê midetê de mirov ji jiyanê ji dunyayê dûr dikeve; dunyayeke xusûsî ji mirov re peyda dibe. Bi strana wê re şikil û şemala wê li ber çavên mirov dibe horiya buhuştê, çavên wê yên binevşî bi hezaran dilan diguvişînin, li ber roniya çavên wê mirov ji taqet dikeve, pê re sist dibe, dunya di nav şewqê de dimîne...

(Metîn dibêje »Ferhad mîna ko tu aşiqê Emelê bî?«, Ferhad »na wele« dibêje. Lê nema pesnê wê dide...)

(Metîn bi rakirina qedehê re gotina Ferhad dibire û pê re dibije »hinekî din jî serê te xweş be tu yê doza Emelê bikî. Noşşş!« Şîngînî ji piyaleyan radibe... Bi bîranîn û evînê li binê qedehên meyê bang didin. Behsa jiyanê, behsa jinan dikin; felsefe, evîn û ruh li ser maseya wan kon vedikin. Geh li hev dikin geh li dijî hev radibin. Di dawiyê de li hev dikin; dibêjin em kapên xwe bavêjin em binêrin ka îşev çi dibe qismetê me; ji mêvanên sohbeta me kî bi ser dikeve!... Derengê şevê bû, rabûn ji meyxaneyê derketin. Berê xwe dan resteûranta Stêrkê. Li rê vêca milmila Metîn bû, gotin li bin guhê hev siwar dikirin:)

Evîn ew e, ew evîn e
Şerab ew e, ew şerab e
Ew oldar e, evîndar e
Vaye diçim wê dergehê.

Mekan ew e, bihuşt ew e
Ew dunya ye, min war ew e
Xweşî ew e, xezal ew e
Vaye diçim wê dergehê.

Ew dergeha me bê hişan
Digel hemî dil serxoşan
Spasdarê wan meyxoşan
Vaye diçim wê dergehê.

Bi hîkmeta şêxê mîran
Bi xelweta şahê dilan

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bi şehweta gula rezan
Vaye diçim wê dergehê

Ger zerî bim, îsewî bim
Ger memoyî an mûsî bim
Ger ateyî an bûdî bim
Vaye diçim wê dergehê.

(Xeyalek jiyayî)

Ferhad û Metîn dikevin restaûranta Stêrkê. Li pêş, li nêzî cihê reqsê rûdinin. Piştî xwestina vexwarin û bîstekê sohbetê li derûdora xwe dinêrin. Li maseyên derûdor gelek jin û mêr hene. Li milê rastê li maseya kêleka wan çar jin rûniştîne. Jin bala wan dikişînin. Çar jinên sipehî, dido ji wan piçekî qelew in li herduyê din zirav in. Çavên Ferhad li remzekê dikeve, remz li piyê keçika bejinzirav ko kirasekî reş î teng heya bi ser çokên wê dadikeve û bê pî ye; û hemî mêbûn û sipehîbûna bedena keçikê dide der, lê ye; Ferhad meraq dike jê dipirse gelo ew çi ye? Keçik bi kêfxweşî piyê xwe hinekî ber bi Ferhad dide û dibêje ev gul e ev jî tor e. Rengê remzê keskekî tarî nêzî rengê şîn e. Wisa ye an jî Ferhad wisa dibîne. Gava Ferhad vê pirsê ji keçikê dike bala keçikên din jî dikişîne. Piştre ew jî piyên xwe nîşan didin, remz li ser piyên wan jî hene. Remzên cuda...

Ferhad bi ser Metîn ve dizivire... Noş dibêjin, qedehên vexwarinê radibin. Stranbêj û koma muzîk karê xwe dikin. Jin û mêr cot bi cot li cihê reqsê, her cotek li gorî zewqa xwe li ber muzîkê direqese. Hevbeşiya reqsê heye lê bi qasî wê, ferq jî di navbeyna kesên direqisin xuya dibe.

Metîn ji maseya kêlekê jinekê dawetî reqsê dike. Diçin direqisin. Ferhad li derûdora xwe, li meydana reqsê dinêre, vê êvarê tişt li ber çavên Ferhad piçekî guhertî dixuyên; dixwaze bala xwe bide nuxteyekê û lê binêre. Belê dikare lê binêre, him jî çiqasî bixwaze, tişt li ber çavên Ferhad pir zelal dibin. Lê Ferhad xwe ji baldana nuxteyê vedikişîne; ji piyaleyê qurtek din vedixwe. Dixwaze bedena keçikekê bifikire; ji xewnên şevan, ji xeyalxaneya mejiyê xwe yekê dineqîne, keçik bi hemî spehîbûna xwe, çîp tazî li ber çavên Ferhad vedije. Ferhad şaş dimîne, haho haho dibêje, ev çi bejin û bal e, ev çi horî ye? Li ber serê keçikê rûdine, porê wê miz dide û ji ber serê wê li bedena wê dinêre, ji memikên wê dibuhure, li navika wê dinêre, nêrîna xwe ber bi jêr dibe, pûncek mûyên zer, berzika wê

dibîne... Li gotinek digere ko bi lêv bike; divê gotin sipehîbûna keçikê binimîne, bi tenê gotina mikemel tê bîra wî.

Metîn ji reqsê vegeriyaye, vêca Ferhad radibe keçika bejinzirav dawetî reqsê dike. Li gel ko keçikê cixareya xwe hîn nuh pêxistiye jî radibe. Ferhad û keçika bejinzirav li meydana reqsê li ber muzîkeke nerm ko ji deng û aletên koma muzîsyenan bilind dibû, di hemêza hev de li gorî rîtim û teqla muzîkê direqisin. Piştî du reqsan hatin li cihê xwe rûniştin...

Piştî sohbeteke kurt û çend qurt vexwarinê, dengê muzîkê cardin bilind bû. Vê carê keçika bejinzirav destê xwe li piyê Ferhad xist û jê daxwaz kir ko bireqisin. Ferhad bi kêfxweşî ji cihê xwe rabû, ket piyê keçikê û çûn cihê reqsê. Muzîk muzîka reqsa nerm a hemêzkirinê bû. Ferhad û keçika bejinzirav xwe bera nav pêlên reqsê û muzîkê dan...

Ferhad berê jî şik kiribû ko rewşa wî ne ya hergavî ye; derûdor, insan, muzîk, deng bi aweyekî din, bi awayekî nejiyayî, nebihîstî, nedîtî li ber çavên wî, guhên wî, vedijiyan. Birûskan li mejiyê Ferhad cîrît diavêt, li ser hev mîna fîşekên hewayî diteqîyan. Wêne û dîmenên ko li ber ronahiya birûskan dixuyan, wisa zelal wisa zelal bûn ko Ferhad dikarî li nuxteyeke herî hûr û piçûk hûr bibe, wêneyê wê nuxteyê li ber çavên xwe bi hemî xweşî û rengên xwe ve hezar carî mezin bike... Lê birûskan zêde rê ne dida, li pey hev şîrqînî ji wan radibû, xumîn û gumîna dengê wan bû. Ferhad fikirî, ez li ko me, ev xewn e, xeyal e, ev çi ye? Ferhad li dora xwe nêrî, belê li meydana reqsê bû, bi keçikekê re reqs dikir; Ferhad da aqilê xwe, ji xwe re fikirî, got gelo ez li ser hişê xwe me yan na? Destê rastê li pişta keçikê pêçayî bû, destê Ferhad yê din û destê keçikê yê rastê di nav hev de bûn. Ferhad destê xwe ji destê wê vekir. Niha herdu dest li hember hev vekirî bûn; lê kefa destê wan li hev bû; Ferhad xwest biceribîne ka şiyar e an na? Hersê tiliyên xwe xistin nav tiliyên keçikê, lê biryar da ko tiliya piçûk û ya mezin di rasta tiliyên wê de bigire û bi wî awayî fam bike ko li ser hişê xwe ye an na? Ferhad wisa jî kir û dît ko li ser hişê xwe ye; dev ji lîstika tiliyan berda.

Dengê muzîkê, dengê stranbêj ji berê hezar car zêdetir zelal û safî dihat guhên Ferhad. Ferhad, biryar da ko çavên xwe bigire; bi girtina çavan re Ferhad xwest ko ew û keçika bejinzirav li wê meydana reqsê bi tenê bimînin. Niha meydana reqsê vala bû bû, bi tenê du kes li ber muzîkê direqisin, stran ji bo wan tên gotin, Ferhad li gorî rîtim û teqla muzîkê gavên xwe diavêje; canê Ferhad sivik bûye, wisa sivik bûye ko bi keçikê re li ba ketiye, êdî nizane ka ew reqsê digerîne an keçik? Ferhad dixwaze

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dengê stranbêj bibihîze, birûskek lê dide, hemî wêneyên din tar û mar dibin, niha Ferhad bi tenê dengê stranbêj dibihîze, di nav gotinên stranê de »I love you« bi nermî mîna şîfonê xwe li canê Ferhad dide, muzîk hestên Ferhad vedijîne, dilê wî li ber pêlên muzîkê, li ber pêlên gotinan li ber pêlên hestan, dikele; xwîna Ferhad niha di rehên Ferhad de wek birûskan lê dide, tê coşê, pêl di ser hev re diqulibin, di yek saniyeyê de ji ber pêçiyên wî dest pê dike, di eynî saniyeyê de, li tememê rehên bedena wî digere û vedigere cihê xwe yê berê; lê nasekine dewrî daîm dibe. Digere, digere û digere... Ferhad cardin, difikire ev xewn e, xeyale, jiyan e, çi ye? Ferhad çavên xwe vedike, li dora xwe dinêre, dibîne ko vaye gelek kesên din wekî wî direqisin. Xwe bi xwe dibêje ez di xew re çûme, bi vê keçikê re li gel ko ez di xew de bûm, reqisîme û vaye direqisim. Ferhad dide aqilê xwe dibêje dem çi ye, dem heye, saniye, deqîqe, saet, roj, meh, sal, sedsal, hezar sal hene, çi ne? Çawa mirov dikare di çend saniyeyan de ewqas bifikire, di xew re here, bireqise, çi bixwaze karibe wî bifikire, bi bîr bîne, lê hûr bibe, gelo mimkin e? Heke mimkin be wê gavê maneya wext çi ye? Ma wext heye an me insanan wext daniye? Mekan mekan dibêje, min karî ez vê rasteyê ji xelkê vala bikim. Bi tenê li gel vê keçika bejinzirav bimînim. Ma mekan heye, ez heme, ev keçika ko bi min re direqise heye? Ev dengên ko tên guhên min, ev muzîka ko min dihejîne, dilê min dike volqan heye? Ferhad dibêje, looo Ferhadoo, tu heyî, tu direqisî, ew tiştên ko tu difikirî tev hene...

Birûskeke din lê dixe, wexta ko mirov pê li pişkoja awizeyeke ji krîstal dike û bi ronahiyê re, çawa ko tîrêjên ronahiyê li hebên krîstalan didin û dibin hezar parçe û derûdor di bin ronahiyeke xweş, e ji hezar rengan pêkhatî û neqişandî dimîne, niha derûdor li ber çavên Ferhad wisa zelal, wisa pak û wisa rengareng bû. Bînahiya çavên Ferhad pir xurt bû bû, her tişt wek kefa destê xwe didît; Ferhad piçekî veciniqî, fikirî, ji xwe re got ma gelo îşev ev bêbavên awîzeyan, lembeyan çima wisa dibiriqin, çima ronahiya wan wisa sed qat zêde bûye?

Ferhad di nav xeyal, wext, cih, xewn, şiyarbûn, hebûn û tunebûnê de diçû û dihat. Bedena wî sivik bû bû, xwe mîna perikek his dikir, sivik, nerm û rehet. Ferhad difikirî, li bedena xwe difikirî, li teqla muzîkê difikirî, li ahenga gav avêtinê ya reqsê difikirî... Erê bi riya guhan muzîk dibihîst, lê deng û rîtma muzîkê ketibû nav canê Ferhad, tevî xwîna wî bû bû, ew notayên ko muzîk pê dihat xuluqandin niha di rehên Ferhad de bûn, êdî Ferhad lê ne difikirî ka teqla muzîkê çawa ye? Ji ber ko muzîk di

dilê wî de bû, ew bi xwe bû bû parçeyek ji muzîkê, an jî muzîk bû bû parçeyek ji wî, ahenga muzîk û reqsê û gav avêtina Ferhad bi keçika bjinzirav re sedî sedî li hev bûn, ne sedî sed, sedî milyon li hev bûn. Bi qasê zereyek jî xeletî, bêahengî tune bû.

Brûskeke din li serê Ferhad lê dide. Erd û asîman dihejin, asîman diterize, şaxên ronahiyê li rûyê asîman vedibin, bi her şaxekê re hezar wêne divejin, bi her wêneyê re bi milyonan gul û kulîlk peyda dibin. Birûsk li pey hev lê didin, dunya bi asîman re dibe yek, valahî namîne, erd û asîman digîjin hev, di nav hev de dikelin, dipijiqin, kaînat di nav roniyê de dimîne, niha her der roniye, ji bilî ronahiyê Ferhad tiştekî nabîne. Ronahî ronahiyeke bê dawî, yeke abadîn. Ferhad di nav wê ronahiyê de cismen tune ye, ew jî bûye parçeyek ronahiyê, di nav ronahiyê de li xwe nagere, hewce nabîne, ji hemî êş û elemên bedenî û ruhî xilas bûye...

Di nav wê ronahiyê de brûskeke din lê dide, Ferhad dengê muzîkê nema dibihîze. Ew û keçik sekinîne, reqs bi dawî hatiye... Li hev dinêrin... Ferhad nizane ka dê çi bêje. Keçik dibişire, Ferhad jî dibişire... Muzîk cardin dest pê dike, reqsa duyemîn dest pê dike... Ferhad bi dilxweşî û nermî serê xwe ber bi jinikê dibe, rûyê wan digihîje hev. Ferhad nermî û germiya alûşka wê his dike. Bi destê xwe yê rastê newqa keçikê heya bi ser kulîmekan miz dide. Keçik xwe bêtir bi Ferhad ve dizeliqîne. Ferhad dev ji mizdanê berdide, dixwaze fena berê di hemêza keçikê de di xew re here, bi keçikê re bibe yek. Îşev siûda Ferhad heye. Ferhad çi bixwaze, çi daxwaz bike, mejî fermanên wî pêk tîne, an jî mejî fermanên xwe, daxwaza xwe pêk tîne.

Birûskeke din lê dide. Ferhad radihêje keçikê û bi firê dikevin. Sivikbûna Ferhad derbasî keçika bejinzirav bûye. Ew jî bûye mîna Ferhad, Ferhad difikire, dibêje min digot qey ez tenê sivik bûme, vaye ev keçik jî mîna min e, ew jî dikare bifire, bi min re bigere... Boraq, boraq tê bîra Ferhad. Ferhad dibêje ev bejinzirav jî boraqa min e. Lê ez li boraqê siwar nabim, em di hemêza hev de difirin, niha wisa xweştir e. Ferhad û bejinzirav di ber gelek stêrkan re dibuhurin, stêrkên sor, stêrkên sipî, stêrkên zer û şîn dibînin. Ferhad difikire, dibêje em li stêrkekê daynin, av û hewa tên bîra Ferhad, difikire ko bê av û bê hewa ne mimkin e bijîn. Feylesofên yûnanan tên bîra wî, yên ko behsa jiyanê dikirin, behsa hewa, ax, av û agir dikirin... Ferhad tî bûye, dixwaze avê vexwe dibêje av jiyan e, jiyan bê avê nabe, av av!!!

Birûskeke din lê dide, Ferhad nermî û germiya bejinziravê his dike,

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ferhad difikire, xwe bi xwe dibêje jiyan çi ye? Em çi ne, ez û ev keçik em çi ne, em çima li vir direqisin? Ma xweşiya jiyanê reqs e, vexwarin e, hebûn e, gelo çi ye? An jiyan ev keçika bejinzirav e? Mimkin e ko ev keçik jiyan bi xwe be. Dibe ko bi xêra wê ez van xewn û xeyalan dibînim, dijîm, his dikim, di kûrahiya dilê xwe de, di mejiyê xwe de bi lêdana birûskan re beden û rihê min têkel hev dibin, cih diguherin, rih dibe can û can dibe rih, beden sivik dibe, sivik. Bi rih re dibe yek, dubendî, giraniya beden, hebûna beden ya şikilî namîne, ji hev dikeve, dihele, dibe ronî, di nav ronahiyê de digehîje bêsînoriyê, dem, mekan, ev der û ew der namînin...

Di mejiyê Ferhad de şîrqînî ji birûskeke din tê. Ferhad çavên xwe vedike, lê ya rastiyê çavên wî hertim vekirîbûn, lê gava difikirî, xeyal dikir, çavên wî nema tiştekî didît. Îşev mejiyê Ferhad hakimê wî ye. Ji xwe Ferhad ji bilî mejiyê xwe, tiştekî din his nake. Gava his dike jî bi fermana mejî kare his bike. Deriyê fikirîn û hiskirinê îşev tenê û bi tenê bi birûskan vedibe û bi birûskan tê girtinê.

Ferhad bi wê keçika bejinzirav re, wê êvarê, li wê cihê reqsê, li ber wê muzîka sihrî, di nav wan xeyal û xewnên efsûnî de, di bin lêdana heybeta birûskan de, bi ezameta şîrqîn û gumîna dengê wan, li ber tîrêjên roniya wan, li mehîneke sipî û bi bask siwar bûye; hefsarê ramanê xistiye destê xwe, bi qamçiya destê xwe birûskan divejîne; direqise û direqise... naxwaze şiyar be; mîna derwêşên dergeha mewlewî zîz dibe, li dergeha evîndaran direqise, direqise û direqise...

Û Metînê Neco, li rewşa hevalê xwe dinêre, dibişire û xwe bi xwe dibêje:

Gelo xêr e, îşev cardin bayê evînê lê rabûye?

Beşê kirmanckî (zazakî)

Bircanê Diyarbekirî ra mektubêke

Birawo,
Belê, newroz emsarr serranê verî ra ciya hame pîrozkerdiş. Çend aşmî ra ver bi waştişê şarê Diyarbekirî, belediyey Diyarbekirî qerar dabi ko newroz bi awayêke weş bêro pîrozkerdiş. Ez do (go) etya qaso ko taqetê min ê nûştişî dest bido û ziwanê min bigeyro, şima rê şahî û pîrozkerdişê newrozî binûsî. Bi nûştiş, bi kelîman îfadekerdişê heme weşî û renganê newrozî zehmet o. Labelê semedê xusûsiyetê mektubnûştişî ez enî rêzan nûsena. Eger dimacû wextê şima bibo û şima temaşey fîlmanê newrozî bikerê şima go qestê min fam bikerê.

Ez wazena şahî û pîroziya enî rocî ra çend nimûnan binûsî. Etya, enî çiyanê ko ez do biyarî şima çiman ver, çiyê ko min bi xu diyê û çiyê ke hevalanê min, min rê behskerdê yê. Bê ko ez derg bikerî û serey şima bidecnî, de bêrê ma piya raşteraşt şêrê temaşeyê operaya Memê Alanî.

Şewa newrozî

Şewa newrozî, badê ko tarî kewte erdî ser, di seet heşt de, di banê tiyatroy de operay Memê Alanî dest pa kerd. Di salone de cayêke tenê zî veng nêmendbi. Herçiqas banê tiyatroy pîl o zî, cayêke pîlêr do baştir bibiyayêne. Semedo ko ena raya ewilîne bî, destane Memê Alanî bi awayêke weş di şaristanê Diyarbekirî de, verê çimanê temaşe-kerdoxan de ze tabloyêke ko hunermendêke renganê xu bi sebir û dîqqet, ser o bi ca bikero hameyne xuliqnayîş.

Herçiqas di şanê newrozî de bi seyan kes semedo ko yew bilet xu dest fîno di verê berê tiyatroy de kom bi zî hêviya îne bi ca niyamî. Bilêtê ena şewe, di aşmî verocû qedyaybî. Hameyne vatiş ko ena ray peyey bazarê siyay, siyarotoxî bêkar mendîbî.

Ez zehf zereşikiyaye wa, semedo ko ez nêeşkena bi nûştiş ena opera bi heme huner û weşiya cay û ay hissê ko di wextê temaşekerdişî de merdimî

de peyda benê, biyarî ziwan. Belê, wexta merdimî temaşey operay kerdêne, merdim şîne dinya û heyatêke bîn. Di a dinya de ciwamêrdî bî bi xewf û heybet bî. Cinî bî, bi rindiyey xu horî bî. Merdim geh di cenet, geh di cehnim de bi. Geh di hewno şêrîn, geh zindan de bi. Hewn û xeyal, ters û heybet, merdî û bêbextî, başî û nebaşî, feqîrî û pêtî, hevalî û neyarî, hezkerdiş û kîndarî, bi kilmî to vatêne qey merdim parçeyêke tarîxê însaniyetî ciwiyêno. Heme tabloyan di verê çimanê merdimî de şikil girotêne û hameyne bedelnayîş. Bi asanî ez şikena vacî ko rihê dengbêjanê ma yê merdan şa bi. Vengê hunermendan pêl bi pêl di miyanê dol û newalan de, serê koyan ra, di asîmanê welatê ma de, çar goşan ra weşî û şayî kerde vila. Vanê emşo di asîmanê koy Agrî de, estarey Ehmedê Xanî hergo hewe zehfêrî şewq dayne. Zehf merdimî kelegirî bî. Keynanê ciwanan semedê heskerdişê (sînayîşê) Mem û Zîne, di a salona tarî de wesar û payîz xu vîrî ard. Xortê ciwanî îne ra kemêr nêbî. Eger destbidayne do zehf ciwamerdan semedê heyfê Memî êriş bikerdêne sehnî ser. Belê, merdim nêzano di temaşekerdişê ena opera de çi hissî şarî de peyda bî. Tenê Homa û hiskerdoxê ma zanê kamco hissî di rihê îne de newe ra xuliqiyay...

Di şanê newrozî de televîzyonî ena opera dîrekt mocnay (nawite). Merdimê ko nêeşkay şêrê temaşe, qîmê xu bi televîzyonî ard. Labelê ganî merdim vaco ko qediyayîşê opera dima, di şanê newrozî de, temaşe-kerdoxan bi xeyalanê ciya-ciyayan xu verra da miyanê tariyê şewe. Her merdimêke bi xeyal û hêviyê xu, bi fikir û waştişê xu, kêfweş yan zî xemgîn...

Helbet pîrozkerdişê newrozî tenî bi operay Memê Alanî nêbi. Badê opera, waştişê henî embazan ser ro, ma helîkopterêke wenîştî ko ma di asîmanê Diyarbekirî de bigeyrê û bivînê ko di ena şewa tarî de cor de şaristan senîn eyseno. Zege min verî zî vatbi, ez do hewl bidî ko qe nêbo menzerayêke biyarî çimanê şima ver, eger ena menzera zehf rengîne nêbo zî.

Di asîmanê Diyarbekirî de

Belê, ma di tariyê şewê newrozî de, bi helîkopter di asîmanê Diyarbekirî de geyrenê. Siûdê ma esto, hewr di asîman de nêeyseno. Şewêke çîksayî ya. Di asîman de estarey bi heme weşiyê xu temaşey ma kenê. Heme şewan zêdeyêr (vîşêr) roşin ê. Ti vanê qey ê zî ma dir newroz pîroz kenê. Ma cor de temaşe kenê, şaristan di miyanê rengan de mendo. Gelo ena keskî-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

sor a di ena şewa tarî de eysena? Nê nê. Ena keskîsorê ma wa. Keskîsorê newrozî wa. Belê, wexto ko ma nizdî ro bajarê Diyarbekirî yê kanî kenê, bi weşiyê menzerawa eysayî, ma konê miyanê xeyalan. Bedenê Diyarbekirî seraser hamewo xemelnayîş. Roşnayî zey aw herekêna. Bedeno rengîn çimanê merdimî ver de şiklanê zehf bedeliyayeyan gêno. Henî rayan zey gilayanê mûndan ê Xeca Koy Sîpanî eysenê. Eger merdim hayî ro ci nêbo ko di helîkopterêke de wo, bêguman merdim wazeno cor de xu berzo miyanê enî daristanê gilayan... Bi têdiyayîşê helîkoptere ena ray rismêkew bîn yeno xuliqnayîş. Bedenê Diyarbekirî kofiyanê ciniyanê kurdan anê verê çimanê merdimî. Ay kofiyê rengînî û bi zêran xemalnaye eysenê. Diyarbekir di verê çimanê merdimî de beno zey ciniyêke rind e ko di tarî şewe de tê geyrena. Banê berzî, gilay mûndey, bedeno nexşîn tabloya hunermendî temam kenê. Kela zerê merdimî wirzena, germbiyayişê canê merdimî hîna lez geyrayişê gunî ano vîrê merdimî. Ma di asîmanê Diyarbekirî de, bi zerêka germine, ro zerê bajarî temaşe kenê...

Rochelatê şaristanî de çemê Dîcle herekêno. Roşnê şaristanî ver, wexto ko merdim cor de hanêno, vîneno ko Dîcle bi awayêkew bîn herekêna, roşnayî awê Dîcle bedelnawa. ko hereknayiş û pêlanê aw ra nêbo ez do vacî ena Dîcle niya... Adirê newrozî, di serê bedenê vakurî yê en berzî de bi heme pîroziya xu, ver bi asîman pêl dano. Ti vanê semedê rizgarkerdişê Memî, Tajdînî banê xu veyşnawo... Hendî Padîşah di serê sîniya xu de kankilanê gozan nêvîneno. Adirê newrozî hendî gozêre tenî nêverdeno.

Di asîmanê Diyarbekirî de fîşekê hewayî teqenê. Belê, bi renganê ciya-ciyayan, di asîman de bi fîşekanê hewayiyan »newroz Pîroz Bo« yeno nûştiş. Di binê asîmanê Diyarbekirî de, ena şewa tarî de zehf çî eysenê... Ez serey şima nêdecnî.

Rocê newrozî

Zege şima zanê, rocê newrozî ma kar nêkenê. Roşan o. Badê arahî, ma çend embazî piya veciyay miyanê bajarî. Ma va ma banî ka di eno roco weş de diyarbekiricî newrozê xu senîn pîroz kenê. Ma verê xu şa miyanê şaristanî, şaristanê kanî. Herçiqas lazim niyo ez vacî, la şarê şaristanî bi cilanê xu yê mîlliyan rengêkew bîn dayne enî rocî. Di serê rehîrê xu de ma pê hesiyay ko di miyanê şaristanî de trafîk vinderto. Badî coy ma ra hame vatiş ko semedê şahî, di miyanê bajarî de trafîk dawo vindertiş...

Belê, ez senîn vacî? Çar hetanê Diyarbekirî ra vengê def û zirna bîne berz. Di eno roco weş de, bi waştişê belediya Diyarbekirî, belediyanê ma yê bînan ra govendgêrî (koçekî) hameybî şirawtiş. Enka çar hetanê bajarî ra enî grûbê govende, bi govenda xu ya mehellî, bi hunermendî, kuçanê Diyarbekirî ra ver bi rastey Şêx Seîdî herekiyayne. Hergû grûbe en tay se kesî ra viraziyaybî. Xortê çelengî, keyney bedewî dest bi dest, pêl bi pêl leqayne. To vatê qey mergê zozanan ê Serhedî yê. Hewayke şenikî eno deryay gul û vilan şanayne tê. Şarê bajarî di kiştê rehîran de, temaşey îne kerdêne. Henî reyan bi tilîlî û çepikan ê zî têkilê govende bîne.

Badê grûbêke govende, grûbê komedî veciyay. Herçî bi veciyayişê nê komikan tûtî zehf kêfweş bîne. Tûtan bi hewar û qîrrî waştêne kolikanê pîlan ser o temaşey komikanê komedî bikerê. Raştiko ê grûbanê komedî zî kêfêkew ciya dayne enî rocî û kêfê tûtan ser ra çîke çinêbi. Tûtî bi zerweşî hewayne û kêf kerdêne.

Badê demêke, enî grûbê govende pêro resay rastey Şêx Seîdî. Ewca serekê belediye kilm xeberî da. Badê xeberdayîşî ena ray heme grûban piya bi hewt def û zirnan govende girote. Ena menzera sosin, beybûn, pirpizêk, nêrgiz û vilê bihvêran ardêne vîrê merdimî. Enî veng û menzereyan, xuliqnayîş û xumiyanê tebîetî ko di wesarê welatê ma de ameynê meydan, bi awayêkew tesîrin di xorîniya hissanê merdimî de cay xu girotêne. Herê, şima zanê, min verî zî vatbi, ez hendî nêşkena ena tablo teswîr bikerî. Werreka şaîra ma wa namedare Binefşa Xezale etya bibîne û di cay min de şima rê binuştêne.

Di dormarê Diyarbekirî de, diyarbekiricî di seyran-gehan, miyanê gul û vilan de newrozî bi tewir tewir şahiyan pîroz kenê. La etya verî ko ez xu vîr a kerî, lazim o ez vacî, eyro roc rocê hezkerdoxan o. hezkerdoxî xu keyeyanê xu ra fînenê dûrî ko nizdî waştanê xu bibê. Bi seyan xort û keyney Diyarbekirî, di verê çemê Dîcle de, dest destê jobînî de, di miyanê xeyalan de, bi vatişanê şêrînan pê dir xeberî danê, lewanê engemînan jobînî ra wazenê. Gulê sûrî û gulê pembey vişkoyênê. Çemê Dîcle bi bar o, barê yê giran o la bi kêfweşî herekêno, Mem û Zîna Cizîra Botanî rê silamanê xort û keynanê Amedî beno. Hezkerdoxî bi hêviya ko biresê Mem û Zîne, qevdanê vilan, nêrgizan, gulanê sûr û pembeyan erzenê miyanê çemê hezkerdişî... Û vanê hergû serre, di vîst û yewê Edare de Mem û Zîne newe ra xuliqênê û di kuçanê Cizîra Botanî de, di verê çemê Dîcle de tenî hezkerdoxan ra eysenê.

Veyşanî ver ma gêj biy. Kêf û şahiya enî rocî ra ma wer kerdibi xu vîr a.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ma werişti şî keye. Ma boya xu day, dima ra ma verê sifreykew mîrankî de nişti ro, wer werd. Şan de ma do şirin stadyûmê Pîlî.

Piyes

Belê, enka ma kewtê zerey stadyûmî û ma di cay xu de roniştê. Qasêke badê cûy do piyes dest pa kero. Program çende babetan ra viraziyawo la ez do şima rê tenî behsê piyesê Padîşahî bikerî. Piyes bi destê merkeza kulturî hamewo amadekerdiş û bi awayêke hemdem hamewo şîrovekerdiş. Di stadyûm de cawo veng nêmendo. Nizdî vîst hezar temaşekerdoxî do temaşey piyesî bikerê. Tv zî do raşterast piyesî bimocno.

Piyes bi kemîkerdişê roşnî û bi muzîkêkew xofin dest pê keno. Pêlê recfe yenê merdimî. Padîşahêke bi heme xof û nebaşiya xu, bi eskeranê xu wa kono zere. Ma enka di dinyayêka bîne, dinyayêka kane de, enka ra bi hezar serran verî ciwiyênê. Pêlê roşnayî, cilê Padîşahî û eskeranê cê, motîfê ko eysenê heme têdir nê hissan însanî de peyda kenê. Kaykerdoxî xeberî danê, la ma vengê îne nêşinawenê. Hereket û muzîk, çiyê ko benê, merdim seyrê piyesî ra fam keno. Çar kenaranê meydanê piyesî ra hêdî hêdî merdimê bînî eysenê. Heyatê însananê ay çaxî eyseno. Ma şarî ra asinkar, koşkar, şiwane, citêr, rezwan û gelekî xebatkaranê bînan vînenê. Padîşah rehet niyo. Eskerê cê, di lez û bez de yê. Pêlê xofê eskeranê Padîşahî tersêkew pîl di miyanê şarî de peyda kenê. Her gama ko şina, riyê erdî ver bi cahnim yeno bedelnayiş. Heyat beno ezabêkew giran... Badê demêke, miyanê şarî ra tevgerê henî merdiman dest pê keno. Muzîk merdimî şano tê. Çar kenaranê stadyûmî ra veng yeno. Çirûskê (çiqlikê) adirî eysenê. Tîrêjê roşnî ra-ray benê geşî. Bi keft û leftêke pîle, di miyanê mij û dumanî de, roşnayî tariya şewe darena we. Padîşah û eskerê xu nêşkenê xu vera adir û tîrêjanê roşnayî bipawê. Muzîk yeno bedelnayîş. Kêfweşî hem bi muzîk hem zî bi piyes yena pîrozkerdiş. Vîst hezar temaşekerdox çepikan kuweno. Diyarbekiricî »tarîxê« xu ra riperran vînenê. Bi sereberzî û xemremnayeyî stadyûm ra vecênê. Beno ko zey min, di hewnê gelekî temaşekerdoxan de zî piyes bêro tekrarkerdiş.

Bi kilmî newrozê ma yê emsarrî di şaristanê Diyarbekirî de, bi enewa hame pîrozkerdiş. Reyna zî newrozê şima heminan pîroz bo. Heme rocê şima bi şayî, bi kêfweşî û xeman ra dûrî bivêrê...

Diyarbekir, 22.03.2021

Gozêre

Min di dewêke de cayê xu girot. Heyatê min, kê min, weşî û nêweşiya min, viyarteyê min heme etya yê. Wazena verê ko ez behsê xu bikerî, bi kilmî bo zî dewê xu bidî naskerdiş. Verê ko ez bêrî dinya û kokê xu vera bidî binê erdî û di serê riyê zemînî de şax bidî û berz bibî, awankerdoxê cê hameyê etya ronawo û ena dewe awan kerda. Di xortaniya xu de, min reyêke waşt ez dewican ra perskerî ka gelo ê ça ra hameyê, verûcû ça biyê, la heyf min cesaret nêkerd. Min va, ê go (do) bi min bihewê; yariya xu bi min bikerê; go vacê ti kam a, yê ko heyat dawo to ma yê; ti seyîn persanê anakî ma ra kena?

Ena dewa ko ez tede wa, di qerajê koyêke de viraziyawa. Erê raşt o, no ko zehf berz niyo; la gorey dormarê xu koyêkew berz yeno qebûlkerdiş. Di qerajê koy de hîrayî ser o yew-di û dergî ser o bi qasê çend kîlometreyan raşteyêke esto. Di binê enî raştî de berziyêke -ku rêzila sî û zinaran ra viraziyêna- ze dêsêkew tebiî di binê dewe de seraser derg biya. Eno cawo ko dewe tede hameya awankerdiş maneno sedirêke. Ti vanê qey ena dewe di serê a sedire de nişta ro; paşta xu dawa koy û lingê xu veredayê acêr. Gorey dewanê dormarê xu, dewêka pîl a. Qeybê ke serê bananê îne pê wa hameyê awankerdiş û zehf reyan dêsê kiştan bi şirîkî hameyê viraştiş; cor ra, serê koy ra banê dewe ze raşteyêko hîra eysenê û kuçeyê miyanê banan teng ê, dûrî ra weş nêeysenê.

Zimistanan hewa serd o; vewre zehf varena; locinanê banan ra dûyêkew tenik beno berz; loma zî wexto ko yewo xerîb dewanê pey koy ra bêro û cor ra, serê koy ra banîro, eger dûyê locinan ra nêbo go niyaro xu vîrî ko dewêka pîle di binê vewre de wa.

Hinî berziyê koy bi daranê mazêran pişte yê; labelê hetê rocawanî rût û repal o. Enka zî weş yeno vîrê min, heya wextê xortaneya min, eno der û dor heme daristan bi. Ay çaxan dewa ma zî zehf qelebalix nêbî. Di miyanê ay daristanan de heme tewir teyr û tebûrî, heywanê koyî peyda bîne. Vergê harî gege hameyne nizdiyê dewe û zûrayne. Daristan mekanê heş û wehşanê koyiyan, liwan, kuzan, arwêşan, pilûran û gelekî bînan bi;

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di miyanê daristanî de enî tewir heywanî di dinyay xu de ciwiyayne. Derheqê koyiyan de zehf meseley û estanikî estê, labelê ez etya behsê îne nêkena. Bi pîlbiyayîşê dewe, vêşîbiyayîşê dewican û ramitişê erdan, verra verra ay daristanî biy vinî. Enka zeke sereyêkew keçel, etya û ûca çend darî mendê. Ez şima rê sirrêke xu vacî la yewî ra mevacê. Raştiko ez zehf tersayne; min vatêne go rocêke dore bêro min zî, go bêrê serey min zî tera bikerê; weşî û bextiyariya dinya ra min bêpar verdê; çimkî di verê çimanê min de çend way û biray min bi xîzaranê pîlan kerdbî erd ra. Ez bi rocan bermawa. Bermayişê min him semedê îne ra him zî semedê halê min, tersê min ra bi. La şikir Homay rê, heta enka dore niyameya min.

Ver bi rochelat ko berziyan û dolan ra viraziyêno. Di hetê rochelatî de, berziyê rêzilanê koy di reyêke de nêbiriyênê; hetanî des kîlometrey dewam kenê. Qerajê koyan bi rezan pişteyê. Di miyanê rezan de ca-ca vamêr û miroyêrî benê berzî; hetê engure û şîrney engure ra dewa ma zehf pêt a.

Ez cay xu ra heme enî dewan û gomeyanê ko di hetê vakûrî de hamey awankerdiş vînena. Ma ra zehf dûrî niyê. Dûriya yew yewî bi pay qasê seetêke, yê bînan zî di seetî rehîr o. Dewê ko di pey koy de yê min ra nêeysenê; derheqê îne de ez zehf çî nêzana; labelê wexto ay dewan ra yew bi meymanî yeno dewa ma, bi nimitikî bo zî ez îne ra tanî xeberan gêna. Dewicê min û meymanê îne xu rê konê miyanê terraqe; bi seetan yewbînî dir xeberî danê; behsê pes û dewaran kenê; erd, rez û bexçan ser ro qisey kenê. vanê qey hema yê xu rê xeberî danê û xeberîdayişê îne beno vinî. La raşt niyo. Ez şahidê îne wa. Vengo ko fekê îne ra vecêno, di hewa de beno vila û pêl bi pêl reseno min. Ez zî bi enawa kar û xebata îne ra haydar bena.

Şima zanê ez çi ra zehf hez kena? Rebenê Homay, şima go ça ra bizanê! Baş o, bê ko ez şima aciz bikerî, ez go vacî. Ez govendan û şewbêrkanê îne ra -ayê ko peyniya payîz û verniya zimistanî de yê- hez kena. Dewicî, hergû şewe di keyeyêke de kom benê û terreqnenê. Vahîrê keyî bi gorey taqetê xu meymananê xu rê bastêx, meşlûlan, eşkican û fîkiyanê wişkan, lepikan, dendikanê vaman û gozan di serê sînî de ronano. Eger di şewanê îne de dengbêjêke zî hazir bo, ay çaxan kêf kêfê min û cematî yo. Bi berzbiyayişê vengê dengbêjî bêvengiyêke xu veradana serê dewe û merdim vano qey yew cîf (nefes) nêgîno û nêdano. Gege ez fikiriyêna vana, gelo enî dewicî çî rê ende enî dêran ra hez kenê? Eger şima bizanê û

min ra zî vacê ez go zehf kêfweş bibî... Govende. Qet mevacê. La veyveyan weştir çi esto? Wexto ko dewicî heme konê govende; cinî, camerdî, keyney, xort û tûtî heme di raştey govende de bi şayî kêf kenê; keyney û lacî bi zerêka lerzaya nizdiyê yewbînan benê û dest di destê yewbînan de govende gênê; ez zî bi enî halê xu kona miyanê şayiya îne; bi pelan û şaxanê xu, di binê hewayêke honikî de pêl dana. Yew weşiya govendan vera yewbînan dêrvatişê grûbanê govendgêran o, yê diyîne zî di ereyê şewe de pirodayîşê bilûre wo. Bilûrvan (lulîbend) bi naz luliya xu taneka xu ra veceno, hêdî hêdî di miyanê lewanê xu de ca dano serey lulî û bêvengiya şewe şikneno; xeberoşkan û meselan bi bilûra xu lûrîneno. Wexto ko lulîbend qaydey vergî û kutikî ceneno ti vanê qey hanî yo pêrodayişê îne di verê çimanê heme goştaritoxan de qewimêno; wexto ko verg zorê kutikî beno, lulî bi keder û xem veng vecena; riyê îne ra fam beno ko goştaritoxî zî di binê tesîrî de yê; la wexto ko kutik zorê vergî beno, hindî lulî girêna; şayî ya, te dir riyê goştaritoxan beno a...

Ti raşte vacê, eger enî govend û şewbêrkan ra zî nêbo, di qerajê enî koy de viyartişê wextî go zehf zehmet bo. Vera vay vakûrî û di binê vewre zimistanî de ez bi enî şayî û terraqanê îne bena germ û sebrê zera xu ana. Ay zî çinêbîne Homa zano go çiqas vîşêr hucrey min bimerdêne.

Ez bi biyayişê xu deyndarê ena dewe wa. Sayey dewican de ez esta û ciwiyêna. Loma zî ez îne ra zehf hez kena. Seyîn ez hez nêkerî? Kam di cay min de bo go ana vaco. Ez û ê ma biyê birakî. Çi baş, çi xirab, zehf çiyê ma kewtê tê miyan, ma di xidareya serdê zimistanan û kelakela amnanan de piya xu ver ro dawo; di ena dinya de yew nêeşkeno ma yewbînan ra abirno. Ez îne hemine weş şinasnena. Qican ra heta pîlan, pes û dewarê îne, keyney û lacê îne heme min dir bi awayêke şirîk ê. Vîstikêke çinya ko ez çîke nêeşnawî yan zî nêvînî. Ez hindî şima ra vacî çi? Şima nanîk ê zanê ma çiqas nizdî yewbînan ê.

Ez xu erzena vijdanê şima wendoxan û verê vatişan biney ver bi xu tadana. Key ra ez etya wa, seyîn min etya ca girot, nîno vîrê min. No semed ra min efû bikerê. Şima raşte persê ez zehf biya pîre; zeke şima zanê, wexto ko merdim beno pîr hindî kes nêeşkeno heme çî biyaro xu vîrî. Beno ko min bi seyan zimistan û amnanî diyê. Ez gege fikirêna; gelo mumkin o merdim heme çiyanê heyatê xu yê verî biyaro xu vîrî? Şima min ra pers kerê, eger bi temamî nêbo zî çiyê muhîmî lezalez vîrê kiçî ra nêşinê. Ay çî di kujêke hêşê merdimî de xu danê pêser; bi sebir pabey rocê xu vindenê. Eger siûdê îne bibo, rocan ra rocêke pêlê geyrayîşî û vîrardişî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

resenê kujê îne û bi awayêkew zerweş yan zî xemgîn îne newe ra xuliqnenê. Bi newe ra xuliqnayîşê ay zanayîşanê kanan û ciwiyayeyan merdim reyna ciwiyêno. Tanî merdimî bi kêfweşî enî çiyan hergû roc anê vîrê xu; di çarçîbaya mezg û zanayîşî de, tenî bo zî enî çiyan tekrar kenê û pê hewiya xu anê. Labelê merdim hergû hewe raştê weşî û rindî nîno; gege bêhemdê merdimî bo zî meseley nêweşî, tahlî xu aver danê û merdimî dekenê miyanê torra xu. Bi kul û keser merdimî tê şanenê; milûl kenê. Herçiqas ko merdim wazeno gamêke verêcû te ra xelas bibo zî eno karêkew asan niyo. Cuwe ra ez neçar a ko behsê meselanê weşan û nêweşan, meselanê zerweşî û xemgînan, tahl û şîrînan hemine bikerî; ma heyat bi xu enawa niyo?

Eger mowsimanê wesar yan zî amnanî ra rocêke rehîrê şima bi enî cayan bikewo, bêrê min hete, di binê verestiya min de xu derk kerê û goşê xu bidê min; şima go ay deme qestê min fam bikerê. Raşta zî reyêke tenî çimê şima biguno min, şima go heme heyatê min di binê qirmiçanê riyê min de bivînê. Di binê ay qirmiçan de game bi game heyatê min, rocê min ê viyartey û xatirayê min estê.

De hela bêrê ez û şima ma kişta yewbînan de roşê; henda ko ez bieşkî û taqetê min dest bido ez go şima rê tanî xatirayan û meselanê dostanê xu vacî. La enî çiyanê ko ez behs bikerî, zehf rey xu di payîzê heyatê merdimî de leqnenê. zî nêwazenê bê qeyd û belge bimirê, şêrê. Cuwe ra xu tê danê û eger bi nuştiş nêbo zî wazenê bi vatiş di zanayîşê tanî merdiman de heyatê xu bidê dewamkerdiş û di rêzila vîran de cay xu bigîrê.

Gelo şima vanê heqê îne çiniyo? Hela min rê vacê, gelo çîke yan yew esto ko bi vaştişê xu, bê ko çîke di pey xu de verdo, serey xu bigîro û ena dinya ra şêro? Eke şima min ra pers kerê, ez bawer nêkena. Cuwe ra her çiyo ko esto, semedo ko bieşko heyatê xu bido dewamkerdiş timûtim di xebate de wo. Enî semedan ra heqê xatirayan erd ra heya asîman esto ko yê zî biwazê hergû hewe xu newe bikerê û bêrê vîrê ma.

Pêlê fikiriyayişî di serey min de bi enî hewayan geyrenê. Erê ti bi Homay kenê, ti vanê se? Enî çî konê serey to, to rê maqûl ê, ti û kêfê xu. Eke ti meraq nêkenê ka ez go vacî se, ti wazenê hema etya, bê ko ti rêzêke tenî zî biwanê wendiş ra fek vera de, mefikiriye. Ti go bieşkê?

Belê, ez heyatê xu û dostanê xu ra şima rê çend nimûneyan û xatirayan vana.

1 - Hûtê Gola Qorqorî

Nizdî se serre verûcû, rocêke rocanê payîzî ra, dewicî di keyeyêkew pîl de ronişte û di miyanê terraqêka germ de biy. Îne behsê camêrdî, ters, cin, perî û hûtan kerdêne. Ereyê şewe de vatiş hame Hûtê Gola Qorqorî ser. Qalî derg biy; ronîştey şî-hamey û di peynî de va yew nêeftareno bi şewe şêro ûca. Husênî miyanê cematî ra va ez eftarena. Nêeftarenê, eftarena, welhasil îne şert kerd. Dewican va eger ti meşte şan de şêrê serê Gola Qorqorî û şewe ûca bimanê ma go di çiwalan genim bidê to. Husênî û dewican pê kerd. Ereyê şewe dewicî werîştî vila biy, hergû yew şi kê xu.

Lazim bi ko Husên meşte şan ra heya şefeqî, tenî, di Newala Qorqorî de di serê gole de bimendêne. Ti raşte vacê Husên poşman bibi û tersayne, labelê reyêke soz dabi û ser ra zî şert kerdbi. Ciniya yê Zerê, bi heyran û qurban ci rê lavayî kerde; yê ver ro geyra la fayde nêkerd. Heya nimacê yerî Husên bi ters û heyecan di dewe de mend. Ver bi şan vişt we, tifingê xu yo qapsulin girot; di nanê tenûre, di serey piyanzî, tanî tantûr û tanî sola ko kerdibî miyanê potikêke, pêro kerdî tewrey xu û verê xu şa Newala Qorqorî.

Newale henda çewres deqîqa bi pay dewe ra dûrî bî. Di serê rehîrê xu de Husênî xu bi xu va verê ko ez şêrî newale, ez go şêrî Yeniyê Maran; beno ko siûdê min bibo û ez çend zerecan bikişî û şan de di verê gole de biney şamê min weş bo. Husênî rehîrê xu tada ver bi Yeniyê Maran. Rey rey ver bi şan semedê aw ra zerecî hameyne yenî ser. Husênî velg ra xu rê kozikêke viraşt û kewt miyanê kozikî, bi hêviya ko zerecan bikişo. Badê wextêke, refêke zerecan xu di serê yenî de nişt. Husênî tifîngê xu girot, qundaxê tifîngî weş sîney xu şana, nîşan girot û gişta xu ya destê raştî -giş-ta şade- di linga tifingî de şidêna. Gumiya tifîngî ra çend zerecî perray û çend hebî zî di verê yenî de perpiziyayne. Husên wişt we û ver bi zerecanê perpiziyayeyan vazda; hîri zerecê gozelî tepiştî. Heme hîri zî sere birnay, dekerdî tewrey xu û verê xu şa Gola Qorqorî, şi.

Tarî hêdî hêdî kewtêne erdî ser. Wexto ko Husên resa serê gole, hindî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

zehf wextê yê nêmendbi. Lezkanî biney percînî, pûş û darê wişkî day pêser û di verê gole de cay xu nîşan kerd. Bêsiûdiya yê rê şewêka tarî û dermate bî. Merdimî nêeşkayne verniya xu bivîno. Husênî biney pûşî, heste û berheste taneka xu ra vetî; bi destê xu yê çepî pûşî û di kişte pûşî de berheste tepişt, hesteyê adirî pêtkanî da berheste ro. Badê ko çend rey heste û berheste pêtkanî gunay pê ro, çiqlikan pûşî girote. Husênî ca de puf kerd û adir tê vist. Hindî dormarê yê sayey adirî kifş bîne.

Husênî zerecî tewre ra vetî, ruçiknay; wişt we şi gole ver, zerey zerecan pak kerd û ageyra; adirî ver de ronişt. Bi kardî hîrê hebî şivî heway şîşan semedê pewtişê zerecan ra taştî û pak kerdî. Zerecê xu sole kerdî û semedo ko sole weş tehmê xu bido goştî, zerecê bi şîşan wa di kişta xu de siyan ser o nay ro.

Adir hindî girr bibi. Di verê adirî de ronişte, bala yê şî kilanê adirî ser û we kewt miyanê xeyalan. Dinyaya cin û periyan, dinyaya dêw û hûtan di mezgê Husênî de xuliqiyayne. Xeberoşk û meselay tersî, di verê çimanê yê de ganî bîne. Tariyê şewe ze kaposêke xu yê ro piştêne; nizdî yê bîne. Bêhemdê xu, xu bineyna ver bi adirî ant; adir ci rê bibi paşmêrêke. Di ena şewa tarî de xu di ena newale de tenî û bêçare his kerdêne. Bala xu hina zehf da kilanê adirî. Kilanê adirî, di verê çimanê yê de şiklê ciya-ciyay girotêne. Ciniya yê Zerê hamî vîrê yê. Gêsê Zerê di verê çimanê yê de bîne berz; bîne derg; bereqiyayne; birû, çimî û lewê ya yê sûrgulî eysayne. Çimê Husênî ver bi cêr tadiyay; gerdenê ya û sîney ya wo hinarîn eysayne. Husênî bi niyeto ko destê xu çicikanê Zerê ra no, destê xu ver bi ya berd; la semedê veyşayiş û dicnayişê ra, yê destê xu ant û veciniqiya; bi awayêkew matmende haniya dormarê xu ra. Zege vaco »ez etya se kena, ka Zerê ko ra şî?« Biney badûcû xu hesiya; sozê yê û dewican û şertê îne hame vîrê ci. Axiyêka xorîne ante. Çiqas wext şibi yê nêzanayne. Adir sist bibi. Çend darî eştî adirî ser û pê adir geş kerd. Wişt we şi verê gole, sere û çimê xu şitî û ageyra hame cay xu.

Semedê pewtişê zerecan, di kiştanê adirî de siy nay ro; kuçike viraşte; zerecê bi şîşan wa dartî we û kuçike ser nay. Herçiqas yê nêzanayne la hindî erey bi û şewe nîme bîbî. Şewêke bêvenge. Eke vengê veşayîşê daran û qurr-qurrê qurrqurrokan ra nêbîne vengêke bînî ena bêvengiya şewe nêherimnayne.

Gola ko we ver de bî, zehf xorîn û hîra nêbî. Xorîneya gole hirî-çar, hîrayeya ya şeş-hewt û dergeya ya zî henda des metreyan bî. Di miyanê siyan û zinaran de ze hewzêke eysayne. Tanî awa gole dewanê corînan ra,

pey dereyêke hameyne, qismo bîn zî di binê gole de miyanê zinaran ra veciyayne. Amnanan wexto ko dere bîne ziwa zî tim aw serê gole ra herekiyayne; ver bi cêr şîne. Amnanan xortî hameyne kewtêne ena gole, la şewan tersan ver çi kesî nêefterayne rehîrê xu bi enî cayan bifîno... Xura sebebê şertkerdişê Husênî û dewican zî eno ters bi.

Di a şewa tarî de, wexto ko Husên di gole ver de bi, dewicî zî di keyeyêkew pîl de pabey yê biy. Hinan vatêne mumkin niyo ko Husên weş ageyro, go ters û cinawirî yê bikişê, tanînî zî vatêne willahî cinawirminawirî çiniyê, eger o nêterso, go sax û silamet ageyro û go di çuwalî genimê xu zî qezenc bikero...

Enka bala Husênî pewjiyayişê zerecan ser o bî; la nişka va xumiyêke gole ra hamî, to vatê qey gole kel dana. Dimacû şiklêkew ecêb ze dêwêke gole ra veciya û ver bi adirî hame... Homa merdimî bipawo. O çi bobelat bi. Henda hîri metreyan derg, şiklêke zey însanan û pirçin, pirço derg, heşî xirabêr; sere û çimî zî zey yê însanan la yê zî pirçin. Miyanê çimanê yê nêeysayne, la serê serey yê zey torzînêke bi. Husên hêz ra kewtbi û nêeşkayne xu têbido. Waştêne werzo, biqîrro; la çi heyf ko azayanê ganê yê zey waştişê yê nêkerdêne... Dêwo seretorzînin hame verê adirî, di qarşî Husênî de ronişt. Haniyayne Husênî ra. Badê wextêke hêşê Husênî hame sere, dest û lingê yê hindî leqayne. Vengê xu nêkerd. Nêeftarayne vengê xu bikero. Zerecanê vezdinan ra ron kewtêne miyanê adirî û veşayne. Husênî bêhemdê xu şivêke tada ko kişta bîna zerece zî bi pewjiyo. Dêwî zî zey yê kerd. Her reya ko Husênî şive tadayne, Dêwî zî bêzariya(teqlîdê) yê kerdêne. Husênî şivêke girote û ronê zerece cilanê xu sawit. Dêwî zî şivêke girote û teqlîdê Husênî kerd. Bi enawa, sere ra heya verê lîngan wirdînan zî xu di miyanê ronî de verda. Husênî nişka va piskoniyêke girot û Dêwî ra na; kile yo girot û Dêw di miyanê kilan de mend. Bi qîjiyêka ecêbe Dêw orra û rema şi, di miyanê gole de bi vinî.

Bi qîjiya Dêwî, Husên tersan ver xereqiyabi. Wexto ko bi xu hesiya hindî şefeq bi. Haniya dormarê xu ra, adir tefiyabi û zerecê yê veşaybî. Wişt we, haniya gole ra, haniya dormarê adirî ra, la çîkew fewqalade nêdî. Şi gole ver, sere û çimê xu şitî; hame fekê tewrî akerd, waşt ko biney nan û tantûr boro, la nêeşka... Herçiqas ko veyşanbi zî. Wişt we, tifing û tewrey xu girotî û verê xu tada dewe...

Zerê, di keye de bi çimanê bêhewnan pabey mêrdey xu bî. Şiyayîşê mêrdey xu ra heya serê sibay di quncikêke de xu antbi pêser û bi ters û

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

heyecan bermaybî... Bê ko hayiya ya te ra bibo ko mêrdey cay ver bi dewe yeno.

Şefeqê Homay ra, di xortî, di teberê dewe de, di serê rehîrê Husênî de pabey yê bî ko piya şêrê keyewo ko dewicî tede pabey Husênî vinderte biy. Senî ko Husên eysa xortî şî verniya yê, piya rey ra şiy, bêveng. Xortan di binê çiman ra zeke merdim hanêno egîdan ra temaşey Husênî kerdêne. Husên di verê çimanê îne de zey dêwêke eysayne û bi heybet rey ra şîne...

2 - Bro û »dibistane«

Roco yene bi. Ena serra ewlîne bî ko banêke di meheleya corîne de bi namey »Dibistane« hamebi nawitiş. Banêkew di odeyin bi, wahîrê banî kê xu berdbi şaristan. Bi yardimê dewican necarêke tanî kursî û masey viraştî; ban hame sîwaxkerdiş û weş nîno vîrê min labelê ez vana qey rocêkew dişeme bi, heme dewicî piya bi tûtanê xu, di verê banê dibistane de kom bî. Yewê serqotî ko tera vatêne »Xoca« qisey kerd û dimacû tûtî şî zerre û bay îne zî ageyray serê kar û xebata xu.

Wexto ko »memûrî« şaristan ra hamey û va »ma go di dewe de dibistanêke akerê", dewicî biney tersay; xu ra di barê îne de edet bi, çiyo ko tebera, şaristan ra bihameyne tersêke vistêne zerra îne; vayê tersî xu îne ro piştêne; û heya îne ra hameyne xu ay »xerîban« ra dûrî girotêne. Dewican ziwan û qisekerdişê nê xerîban ra çîke fam nêkerdêne. Neheq zî nêbî, hema bi enî halê xu ez zî ay »xerîban« ra aciz bîne. Seyîn nêbî, min bi xu zî ziwanê îne ra fam nêkerdêne. E verûcû zî çend rey hameybî dewe, la hameyîş û şiyayîşê îne zehf balê min nêantbi; xu ra di dewe de zehf nêmendêne; hakerûna xu werdêne û şîne. Semedo ko min zanayne etya nêmanenê ez ne ziwanê îne mûsawa û ne zî min çîkew anayîn fikiryawa. Cilê îne zî zege dewican nêbî. Ti raşte vacê heya enka dewican çi xêrêke yê »xerîban« ra nêdîbi. Gege ê -îne ra vatêne esker- bi sîleh hameyne dewe û tanî xortê dewe pêser kerdêne û berdêne; gege tan bînî zî hameyne dewican ra zerd û perey waştêne; yew yew rey zî kewtêne kê dewican genim, cew, nîske çi dest bikewtêne berdêne, vatêne semedê eskeran benê.

Brahîm tûtêkew hewtserre bi. zî zey amveranê xu dest bi dibistane kerd bi. Kê bay Brahîmî di mehelaya cêrîne de bi. Wexto ko Brahîm şîne dibistane hameyne hergû hewe di verê min ra viyartine. Xura verê ko dest bi dibistane bikero ez û we ma bîbî embazê yewbînan. Enka şima go vacê seyin ti bi enî emrê xu yê vêşî ti yê dir bî embaz? Baş o, ez zî şima ra persena, gelo kal û pîrî seyin torinanê xu dir benê embaz? Şikir Homay rê ko Brahîm zey şima nêfikiriya. bêfikirkerdêşêkew derg embaziya min qebûl kerde û hergû hewe hameyne min hete. We biyayişê xu ra heya bi eyro bi

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

çimanê xu yê şirînan hanyayne min ra. Çi rocêke xirabî an nebaşiyêke min ra nêdî. Wexto ko qic bi, di miyanê qumateke de bi; amnanan daya yê we di binê verestiya min de kerdêne hawn a. Tîrêjanê rocî ra pawitişê yê min rê kêfweşî bî; bi pelanê xu yê xişnan, bi berzbiyayîş û gurriya xu min bi seetan we pawitêne. Hanyayne min ra û min zî ci rê xeberoşkê weşî vatêne. Pê kêfê yê hameyne û hewayne. Eger yewî bidiyne ko heweno, vatêne: »Meleketan dir kay keno û heweno.« Xem nêbeno meleketî zî min rê xerîbî niyê, biney heqê min îne ser ro esto, la.

Eyro Bro, bay xu û melay dewe şî li xizînan bigeyrê. Melay nûşteyêke nûşt û di miyanê girrêşê de pişt. Waştişê bay xu ser ra Bro bêzerra xu şi dîkê îne wo sipe bi destan tepişt; lingê dîkî girêday û we kerd zerrey tewreyêke hîray, la serey dîkî teber ra bi. Îne huwe û kulingêke zî xu dir berdî. Piya ver bi koyê pey dewe şî. Nîm seetê rapey di cayêke de ko şikê xizînan kerdêne dîk tewre ra vet; bi layêke sist nûşte milê dîkî wa girêda û semedo ko dîk nêremo layêkew derg zî lingê dîkî wa girêda û dîk vere da. Melay vatêne »dîk ça weng do û nikulê xu bido erd ro lazim o ûca bêro kendiş.« Labelê dîkî çi cayêke de veng nêda. Broy dîkê xu kerd verika xu û yê ko ro kewtî diyar. Reya ewilî ra di qatî vîşêr şî. Enka di serê koy de cawo en berz de bî. Vatêne ko verûcû di serê enî koy de qesrêka mîrêke biya; a qesre di erd zelzeleyêke de biya xira. Merdimê ko di qesre de bî pêro merdê û xizînay Mîrê zî binê xirba qesre de menda.

Broy rayêka bîne dîkê xu vere da; badê biney geyrayişî, dîkî di cayan de veng da û nikulê xu da erd ro. Cayê ko dîkî nikulê xu dabi piro Broy bi qûçan nîşan kerdî. Wexto ko enî çî bî, Mela û bay Broy nimacê nîmerocî ser o bî. Nimacî ra pey ê hamey û dest bi kendiş kerd û hinda di metran erd kend bê ko raştê çîke bêrê. Îne cay diyîne zî kend la ew zî veng veciya, bê xirba siyan çîke nêeysayne.

Çend cayanê bînan de zî îne dîk vere da la dîkî nêwend. Ver bi şan ê bi awayêkew rincan û destveng ver bi dewe kewtî rehîr.

Di miyanê dewe de Melay bay Broy ra xatir waşt û şi kê xu; Bro û bay xu zî ver bi kê xu hamey. Wexto ko Broy nizdî min kerde zerweş bi û bi nimitikî hewayne; ê dîkê xu tewre ra vet û vere da; dîk bi ecele ver bi keye vazda. Semedo ko çîke nêhame bi serey dîkê yê Bro di kişte bay xu de bi kêf bi gamanê xu yê qican şi keye.

A enî hevalê min ê qicî dest bi dibistane kerdbi. Bi ters û heyecan şîne. Riyê yê ra kifş bi ko şiyayişê dibistane ra zêde kêfweş nêbi. Rocêke min meraq kerd û min tera persa:

— Bro ti seyîn ê?

Bê zerra xu va: Ez baş a, spas.

— Ti wazenê ma xu rê biney qise bikerê?

— Nê, eyro nê.

Min zî we zehf aciz nêkerd. Bro şi keye. Labelê we bêkêf û mirûzê yê tirş bi.

Badê çend rocan Bro hame min hete la tenî nêbi. Çend hevalê yê yê dibistane zî tedir bî. Hamey xu rê bi kap û gozan kay bikerê. Ew roc kêfweş bi; qîrrayne, we û hevalê xu hewayne û vazdayne...

Min waşt ko ez te ra persî ka we wazeno ma qisey bikerê, la min xu bi xu va »Fek tera verra, nanik o embazanê xu dir kay keno, ez go semedê çî kêfê îne biheremnî". Badê kaykerdişî embazê yê şî keye, we tenî mend. Hanya min ra û hewa. Zeke vaco »eger ti biwazê ma şikenê qise bikerê". Min va »de ka bê". Hame min hete nişt ro û dest bi ci kerd: »Hevalê min o erciyaye, ti zanê ko ez to ra zehf hez kena; cuwe ra zî ez to ra çîke nêlimnena. Ti zanê ko min zî emsarr dest bi dibistane kerd; eno midetêke wo ez şina û yena; eke ez raşte vacî kêfê min dibistane rê nîno. Xocay ma bi ziwanêke qisey keno ko ez te ra çîke famnêkena. Qeyboke ziwanê yê û ziwano ko ma qise kenê zey jobînan niyo, wexto ko ez wazena çîke vacî zî ez nêeşkena. Ma eynanê ko emsarr dest bi dibistane kerdo heme bi ters û matmende -zey kerr û lalan- hanênê fekê Xocay ra. Min reyêke day xu ra pers kerd, ka çirê Xocay ma zey ma qise nêkeno, ya va »Xoca bi ziwanê mektebe qisey keno. Bimey sebir bike ti zî go bimûsê".

"Ti zanê ew roc wexto ko ti min persay ez çirê bêkêf û acizbiyaye biya? Ez vacî, ew embazê min o kelawsipî yo ko gama bîne etya bi, ma piya kaykerdêne, embazêke min o jêhati yo. Çend rocî verûcû Xocî te ra çîke va, labelê yê nêzana vaco çi, cuwe ra bêveng mend. Ay ser ra Xocî zehf da piro; qehr û dicayîş ver qasê nîm seetêke berma. Yew embazê min ê bînî zî di ay rocî, wexto ma bi nehan û fesûlyan çiyêke Xocî textî ser ro nûştîbî viraştêne, nêzana Xocî ra vaco »mîza min yena", nêeşka xu tepişo û di ortey sinife de binê xu de mîze kerde. Gelo ti bê ti go bêkêf nêbê?"

Gelo ez eşkayne vacî çi? Bi ziwanêkew bîn di dibistane de qisey kerdiş min rê meqûl nêameyne û zey neheqî eysayne. La min zî nêzanayne çirê ana wo. Coka zî min nêzanayne ka ez Broy ra vacî çi. Broy min ra bawer kerdêne û xu bi xu vatêne »Hevalê min o qedîm heme çî zano;« çimkî heta enka min hergû hewe cewabê persanê yê dabi. Labelê ez enka kewtebiya miyanê tenganî. Min his kerdêne ko nêzanayîş cifê merdimî

peysneno; lazim bi ko ez xu bi awayêke bifeletnî. Min efû bikerê min zî xu li metodê kanî girot; yanî min va »Bro biney sebir bike, wexto ti bibê pîl ti go cewabê persanê xu bimûsê.« Bi hanyayişêkew xerîb hanya min ra; zeke vaco »Ti çirê min ra nêvanê, ka çirê ana wo?"

...

3 - Wesar û eskero siya

Di binê tîrêjanê rocî de, hilmo ko erd ra wirzeno bi boy û mizginiya wesarî dekerde wo. Vewre di qerecanê koy de nêmenda, heliyawa. Di serê koy, cayanê berzan û çalan de, cawo ko zimistanî va û gijoleke vewre daybî pêser hema zî sipî kena. Hefteyêke ra pey go ya zî biheliya. Bi varte, wesarî, dereyê ko ko ra ver bi cêr yenê bi awa sûre û lîşine benê pirrî; erdê qerecanê koy û kiştanê dereyan her serra ko şina hîna sist beno; ko bi xu zî bi emrê xu yê dergî şahidê enî awayî yo. Laserê wesarî ver, gege ana beno ko pes nêeşkeno dere ra bivêro; dewicî bi zehmetî pesî viyarnenê; la hewna zî rey-reyan bizêke yan mêşinêke aw de şina.

Di peyniya aşma Edare û aşme Nîsane de hindî wesar bi heme weşiya xu sere hewa dano we û tebîetî bedilneno. Tîrêjê rocî hergû roc hîna germ benê. Aw koyo bi vewre pişte ewilî cay xu pîneyanê siyayan, fistananê gewran û qehweyiyan rê verdeno; dimacû hêdî hêdî fistanêkew zergûn dano xu ra û roc bi roc hîna zergûn beno. Di qeracanê koy de pirpizêk, pîvok, nêrgiz û gelêka çîçekê bînî mizginiya wesarî îlan kenê. Di destê îne de gulçanî tûtî di qeracê koy û miyanê erdan de pîvokan vecenê û aynan ra tacanê giloveran virazenê; ay tacan bi vilanê rengînan xemelnenê. Vaş roc bi roc beno derg û bi vilanê rengînan xemelêno. Di binê dewe de dehlî ver bi asîman berzbiyaye, xu wesarî rê kenê hadre. Di miyanê dewe de darê tuyan, tuyê şamî, romî û sipey vişkoyênê. Darê sayan, biyok, incas, mişmiş û xoxan bi vilanê xu yê rengînan di miyanê bexçeyan de; darê vaman û miroyan di dormarê dewe û gege miyanê rezan de, dimacû darê hinaran bi vilanê xu yê sûran kêfweşî û boyweşî peyda kenê, rengêkew ciya ko merdimî mit û mat verdeno, danê wesarî. Ena rey enî vilî di wextê wesarî de menzerayêka zey cenetî xuliqnenê. Ti vanê qey tebîetî di musabeqey esteran de semedê xudestviştişê xelata yewine, renganê sûr, zerd, sipî, binevşî, xemrî û pembeyan ra sentezêke nêdiyaye xuliqnawo û bi firçeyê xu yê tebiî ena menzera viraşta.

Mêsê engemînî hanê zimistan ra şiyarbiyaye; semedê xebatêka pîle kariyan ra vecênê; ver bi deryayê vilan perrenê û vilan ser o kay kenê, doş

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

benê, nişenê ro, cewherê vilan gênê û ver bi kariyanê xu perrenê. Di zerey kariyan de qesranê sipiyan virazenê; ay qesrê ko mîmaran ro ca teng kenê û cîf piro peysnsnê, bi sebrêkew zaf hîra sî bi sî yenê viraştiş. Paley keyî di binê emrê kebanî de zerre ra xebetênê û embaranê banî bi cewherê vilan kenê pirr.

Dewicî di miyanê bostanan, rezan û erdan de, di kar û xebata xu de yê. Hergû yew bi karêke mijûl o. Tanî rezan şelênenê, dormarê mewanê engure kenenê, tanîna mêwan pêşenê, tanî zî di miyanê bostanan de cite kenê yan zî dormarê bostanan sinc kenê û birînanê bexçeyan ko zimistan ra mendê derman kenê.

Mirîçikî, koterî û kekûy daran ser ro, zerecî di miyanê leman û binê tehtan de, şalûlî di binê kendalan de, bilbilî di caw berz de miyanê zinaran de hêlînanê xu virazenê. Şefeqê sibay ra heya şan vengê çûçikan û wendişê bilbilan ra hewa bi melodiyan debeno. Ver bi şan, wexto ko di pey dewe de zinaran ser ro zerecî wanenê merdim heyran û heşmetkar beno. Rez û newalî di binê vengê îne de milûl benê. Ez nêzana şima qe goştariya wendişê zerecan kerdo yan nê? Eger şima nêkerdo lazim o şima wesarêke rehîrê xu etya ro bifînê û goştariya îne bikerê; ay çaxan şima go fam bikerê ka di miyanê tebîetî de ciwiyayîş çi yo.

Di wesarêke anayîn de, şefeqêke, ma çimê xu bi qîrrayîş, hewar û bi lawayîşê kutikan akerdî; ma bî hêşyarî; la vengê kutikan û çekan têkilêyewbînan bibi; badê wextêke kilmî veng kutikan ra biriya. Dewicanê ko fersend dî bi tersêkew zehf keyanê xu ra veciyay û ver bi newalan û zinaran remay; îne di pey zinaran û siyan de xu nimnayne û hanyayne dewe ra. Ay ko bi çekan hamey Eskerê Siyay bî. Di dewa ma de camêrdî kiştî; rehma yîne bi tûtan û ciniyan zî nêamî. Çiyê nêdiyayey ardî serey ciniyan û keynanê ma. Ez şerm kena behsê ay çiyan bikerî. Gelêke cinî û keynay semedo ko nêkewî destê ay bêînsafan xu zinaran ra eşt û merdî.

Ay bêînsafan banê dewe weyşnay, pes û dewarî berdî. Merdimê ko destê Eskerê Siyay ra feletiyay bi koyan kewtî. Veyşan, perîşan bi hefteyan koyan ra mendî. Bextê îne rê wesar hamebi, hindî dinya germ bî û tar zehf bi; bi xêrê ay tarrî (pincarrî) ra ê merg ra feletiyay; di xûrîneye newalan û zerrey şikeftan de mendî. Badê ko eskerî mintîqa ra şî, yê ageyray dewa xu. La dewe nêmendebî. Dewicê ko weş mendîbî newe ra dewa xu awan kerde. Şikir Homay rê, ma nanik ê piya yê û di erdê xu ser o yê.

Raştiko min nêwaştêne bi meselayêka anayîne menzarayê wesarê

mintîqey ma xira bikerî. La destê min ra çi yeno? Ez behs nêkerî nêbeno. Herçiqas meselayêka nêweş û tehl a û merdim nêwazeno biyaro xu vîr zî, la eno çî qewmiyawo; loma zî lazimo bêro vatiş. Eskeranê Siyayan çirê ena dewe û gelêke dewê bînî veyşnay û sebeb çi bi, Eskerê Siyay kamê? Bi raştî ena mesela zehf derga! Xura zeke min verûcû zî vatbi, min cay xu ena dewe de giroto; qaso ko ez di serê erdî de eysena hende zî di binê erdî de wa. Ez nêeşkena şîrî bigeyrî, heme çî bimûsî. Ez tenê dormarê dewa xu û mintîqey xu ra weş haydar a. Ax ax, xêrê Homay rê di hergû ca de, di her dewe û mntîqa de heyatê verûcû û enkay bihameyne vatiş û nuştiş ko pê hemderdê min bivirazyayne û barê min pê şenik bibibayne.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

4 - Hezkerdiş, rindî û zilm

Eyro zî Dîkê Kê Hecî Silêmanê Şaşikçewtî hame û min ver ro derbas bi; şi miyanê erdê xu. Şima go vacê eno çi yo, ma we bira dîk o, yan ti ana vanê?

Belê, verû ko ez Dîkî bidî naskerdiş, lazim o ez bi Şaşikçewtiya Hecî Silêmanî dest pa bikerî. Di dewa ma de çend hecî bi namey Silêmanî bî; û dewican îne hergû yewî rê leqamêke peyda kerd bi. Ena rey verê ko Hecî şaşike çewt bido serey xu ser, hergû hewe weş şaşêke girêdayne û bi usûlêkew weş nayne serey xu ser. Wexta ko rocêke Çawîşê qereqole di miyanê dewe de geyrayne û di verê dikanê Ristemî de -dewicî gege ûca kom bîne- dewican ra va »ez nêzana, eno bi çend serrî ko Serekkomarê ma yê nêmerdey înqîlab kerd û cil û belgî bedelnay. Ka min rê vacê şima çîrê hema zî enî şaşikan û kelan danê serey xu ser? Erdîşa xu zege bizan veredanê?« Hecî waşt vaco ko di barê îne de edet o, wexta ko ê benê kalî şaşike an kela danê serey xu ser, la hema vatişê Hecî nêqedyabi Çawîşî şaşike Hecî serey ê ra ante û eşte erd... Hecî vengê xu nêkerd. Şaşika xu erd ra darte we. Badê ko Çawîş şi, Hecî şaşika xu na serey xu ser la ena rey rast nêkerde; şaşike serey Hecî ser o ver bi destê rastî çewt bî; cuwe ra wexta Hecî di cemaet de hazir nêbayne dewican tera vatine »şaşikçewt".

Sebro û Fatê yewbînan ra bi zere û gan hez kerd. Welew ko Fatê ciniya viyaye bî zî, Sebro goş nêda dewican; zey xu û bi zera xu kerd. Verê ko ê bizeweciyê, dewican yarî kerdêne, vatêne:

— Erê ti bi Homay kerê Sebro, ka vace to çi di ya viyay de diyo ko ti ana aşiq biyê, aqil di serey to de nêmendo, semedê qotêke cinî wexta ti bikewê çolan...

Sebro hewayne, destê xu berdêne serê serey xu, kelay xu dartêne we û vatêne:

— Ha şima rê, ena kelay min reyêke tenê bidê serey xu ser û bi çimanê min banîrê Fate ra, şima go bivînê ka ya seyîn a. Bi Homay, bi Homay ne ena dewe de ne zî cayêkew bîn de yewa zey Fate ne esta ne zî bena. Hema xu qet aciz mekerê. Fatê yew tenya wa, tenya...

Sebro xortêkew êtîm û feqîr bi. Wexto Sebro des sere bi, zimistanêke hewrês kewt banê îne ser û kê îne di binê vewre de mend; heya dewican ê binê vewre ra vetî da û bay ê merdî. Dewican Sebro merg ra feletna. Di dewe de Sebro ewil şi golikan ver û dimacû şiwaneyî kerde. Badê ko bi pîl hindî di miyanê erdanê xu de kar kardêne.

Erdîşsipeyanê dewe rocêke qerar da û va lazim o ma Fatê û Sebroy bizewecnê. Dewican hergû yewî bi gorê taqetê xu îne rê yardim kerd; veyveyê îne viraşt û »aşiqê dewe« ay namdarî resnay yewbînan.

Hezkerdişê Fate û Sebroy badê zewacî zî kemî nêbi. Sebroy ciniya xu ra zehf hez kerdêne û tim ya rê yardim kerdêne û nêverdayne ya karêkew giran bikero. Eh, de ena rey şima vacê ma di dewe de di halêkew anayîn de merdim fekê dewican ra feletêno?

kê Hecî Silêmanê şaşikçewtî zî çend kergî û dîkêke îne bî. Di dormarê banî de, di serê sergoy de wexto ko yê xu rê qut geyrayne, yê dîkî eger çîke bidîne hema nikulê xu dayne erd ro û bîne tix tixe yê, baskê xu erd ra kaş kerdêne; xu nepexnayne, veyndayne kergan; ew wer nêwerdêne dayne kergan. Cuwe ra zî wexta yew dewic bi ciniye xu wa girêdaye û merdey ciniya xu bibayne, dewican eno name nayne pa: Dîkê Kê Hecî Silêmanê şaşikçewtî.

Dewican di binê verestiya min de semedê roniştişî sekû viraşta. Kalê meheleya nizdî min yenê di serê sekûyan de nişenê ro û xu rê sohbet kenê.

Bê kalan yew yew rey Mela Ehmed û feqiyê xu hameyne di binê verestiya min de munaqeşe kerdêne an zî dersê xu di binê verestiya min de wendêne. Wendişê îne bi ziwanêkew xerîb, yanê bi erebî û bi ziwanê dewa ma bi. Erebî mûsayne la dersê xu bi ziwano ko ez tera hez kena şerh kerdêne. Xeyrê kitabanê dînî îne kitabê bînî zî wendêne. Mesela şiîrê Melay Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî wendêne. Kîtabê Ehmedê Xanî »Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê« û her rey ko hameyne qismêke »Mem û Zîne« zî wendêne. Ez zî kewta miyanê meraqî, min vatêne, Homawo Ti rehîrê îne etya ra fînê, ez bizanî ka çi bi serey Mem û Zîne hame.

Di miyanê feqiyanê Melay de yew xortêke bi namey Dilşadî bi. Xortêkew derg û çeleng bi. Vengê yê zehf weş bi. Wexta ko bi vengê xu yê weşî Mem û Zîne wendêne zera merdimî heliyayne. Gege zera min zîz bîne, yew yew rey zî hêrs û heybetî ez girotêne. Labelê roco ko Dilşadî qismê şewa zîfafa Tajdîn û Stî wende, ez bi asîman kewta; di erşê alay de geyrawa; perrawa... Min zere û gan ra waşt ko ez di cay îne de bayne. Min

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vatêne, were bi ay aşiqan, were bi hezkerdişê îne...

Dilşad kewtbi newyes serriya xu. Serêke bî ko yo tenê nêbi. Binefşe keynay Mela Ehmedî dir zeweciyabi. Wendişê xu rewra qedêna bi. Eger semedê melayî bişîne dewêka bîne da û bay ê tenê mendêne; loma yê nêwaşt ko ê tenî bimanê, cuwe ra di barê îne de mend. Di dewa xu de, di serê erd û rezanê xu de weş-xirab go îdarey xu bikerdêne.

Emsarr rezê îne baş bî; hinî mewî di binê giraniya weşanê engure de bibî çewtî. Ver bi şan bi, hindî germayiya tîja rocî şikyaybî.

Binefşe di dewe de ay keynanê rindan ra yewe bî. Ya û Dilşadî wirdînan zî yewbînan ra hez kerdbi û zeweciyay bî. Enka ya û Dişad di miyanê rezê xu yê binê Zinarê Hingan de geyrayne. Enî zinarî çara eno name giroto û zinarêkew seyî no? Belê, zey çiyanê bînan meselay namey enî zinarî zî esta. Mevacê ke ser û binê ê heme zinarêke wo. Eno çî meqûl niyo, coka ez mecbûr a ez vacî ko eno zinar zinarêkew edetî niyo. Teyrê ko wazenê leyrekanê xu nefes ra bipawê şinê di nîmey enî zinarî de hêlînê xu virazenê. Zinarêke, zinarêkew berz. Ti des bananê ena dewa ma bidê pêser qasê yê berz nêbenê. Eno zinar seyin ûca bi ca biyo û ana zeke bêro çiknayîş werişto lingan ser, Homa zano. Amnanêke wexta mêsanê engemînî şitil daynê, yê şitlan ra yew qefleyî şa rêbere xu dima, dewe ra veciyay, şî di nîmey yê zinarî de, di qulikêka zey kariyan de ca girot. Yê rocî ra nata namey yê zinarî bi Zinarê Hingan.

Di kişta yewbînan de, di miyanê rêzanê mewan de geh bîne vinî, geh serey îne eysayne; şiyayîş de gege hêtê îne ginayne pêro û Dilşadî nermeya hêtê Binefşe di ganê xu de his kerdêne. Yew yew rey bi hanyayîşêkew nerm û germ hanyayne yewbînan ra û reyra şîne. Binefşe kesekêke herî qelebya; fek û rî ser kewte war; la semedo ko erdê miyanê rezî nerm bi ya nêdeciya û bi hewayîş va »ay". Di binê fistanê ya yê amnanî de qorikê ya bewlû bî; Dilşadî waşt ko ya werizno, la bêhemdê yê hanyayişê yê şi serê hêtanê ya. Di a vîstike de wexta ko ya di binê çiman ra hanya, dî ko o hanênê hêtanê ya ra, bi niyetê xu qelebnayîşî ya bi awayêkew nerm bineyna zî hêtê xu berz kerdî; bi enî livyayîşê ya ra hêtê ya bineyna bîne eysay, fistanê ya di miyanê şeqanê hêtanê ya de hînke bi ca bibi. Ya xu qelebna û destê xu ver bi yê wa derg kerd; bi antêşêkew nerm ê fikrê ya fam kerd; di binê mewanê engure de îne yewbînan gevezna... Bi gazkerdiş û lewan îne di ganê yewbînan de deqê sûrî mor kerdî. Geh cêr û geh cor ra îne cilê yewbînan şelênay; di binê mewanê engure de bi pelanê mewan piştebî. di cenet de zey ê di merdimanê verînan bî...

Di binê mewêka engura siyay de, bi zerêka pirr hezkerdiş hanyayne yewbînan ra; ê weşeyêke engura siyay ra çend hebî tera kerdî; -di miyanê lewanê ya de ronayne û îne bi lewanê sûrgulan hezkerdişê xu pare kerdêne;- çimê yê tadiyay çala gerdenê ya ser; ê çend hebê bînî weşe ra tera kerdî û di serê kortika gerdanê ya de di miyanê gîştanê xu de peleznay; çilkê engure kewtêne çalike gerdenê ya; peleznayîşê çend gilliyan dima kortike bî pirr û dalpeyêke ver bi acêr kewt rehîr; di miyanê di koyan ro newale de şi, hame resa naka ya, »Yeniyê Qestelî"; ûca bêtaqetî ra sere na ro. Dilşad jî bi hanyayîşê xu çilke dir şîne; o zî hame serê »Yeniyê Qestelî« vindert; serey xu ver bi yenî nizim kerd; bi ziwan û lewanê xu yê teyşanan awe yenî ya rengşerabe ziwa kerde û rehîrê peyay verûcû ver bi cor ramit; ya di binê yê de bi çimanê xu yê nîmakerdan yê karexezalan perrayne; pêlanê hezkerdişî di binê ziwanê yê de zey laserêke ya şanayne tê. O resa çalike gerdenî û a awa rengmeyî peysna...

Wexta ko beryay cenetî di verê yê de bi weşî nîşanê xuakerdişî da, espar bê teredut dekewt zere; di cenet de, ê yewrey bi yewbînan ro sûr bî; gan û rih bî yew; yewbînan ra dûrî kewtî; reyna bî yew; reyna... Xu di serê deryay de di gemiyêka hanî de dîne; wexta ko gemî pêlanê deryay ver bêçareyî û bêmecalî ra, ver bi qerax şî û lenger eşt binê deryay, hindî rêwî mest bîbî. Midetêke di binê mewa engure de, ê hanyay tîrêjanê rocî ra, ko miyanê pelan ra herekiyayne û rengêkew sûr dayne erd û mewanê rezî. Roc ver bi awan şîne; dûrî ra zey lengeriyêka adirî eysayne. Awankerdox rindî û hezkerdişê îne ver bi kêfweşî di asîmanê hewtine de hewayne...

Payîz wextê çînayişê engure û serê rezan bi. Enî des rocî bî ko Dilşad û Binevşe rezan de meşxul bî. A serre engure zaf bî; îne di lênî şîre kerd bastêx, yew kerd dims û yew zî aqît; lênêke zî kerd kesme û lepikî. Dirikan ra beranî, şivê vamêran, çend fikiyê beyan û miroyan day esîde ro û verê tîce de nay ro ko bibê wişkî. Nîmlênêke semedê meşlûlanê sûran viraşte; meşlûlê gozan dayne esîde ro û îne ko midetêke xu girotêne reyna dayne esîde ro; enawa hîri çar rey tekrar kerdêne, heya ko meşlûlan xu weş girotêne û bîne goştin. Nîmlênêke şîre zî semedê meşlûlanê sipeyan ard keye.

Semedê çalmî darê çalmî viraştêne; dare belelûke ra çend şivî tera kerdêne û taştêne; dergiye şivan henda metreyêke bî; serê şivan zî tera kerdêne labelê çiqlê serê şivan pa verdayne û çend şivî dayne pêser û girê dayne. Helîre xu viraştêne û semedo ko rengê helîre ver bi sipeyî bibo hînke do verdayne miyanê helîre; dimacû ko helîre peyşa verdanê teştêke,

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bi ay şivanê belelûkan daynê piro heta ko ya reng bedelnena bena sipey û kef dana. Badêcû zey meşlûlanê sûran meşlûlanê xu çend rey danê esîde ro û danê verê tice.

Di dewa ma de dewicî karê xu ra pey bi awayêkew rincan badê nimacê eşay konê ra. Ena rey zî îne ana kerd. Kundêke hame û di dare tuye şamî ra nişt. Bi çimanê xu yê biloqan hanyayne tariyê şewe ra.

Eno şefeq zey şefeqanê bînan bi roşin nêame; xu dir esker û cendirmeyê cil zergûnî ardî. çend seetî verê şefeqî hamey û di dorê dewe de cay xu girot. Serê şefeqî eskeran venda muxtarê dewe û muxtarî ra va »devican ra vace wa pêro di verê qereqole de kom bibê. Emrê qumandari yo...”

Qereqole di hetê rochelatî de di banêkew yewqat de bî, o zî qeracê koy ra bî, di kişta qereqole de, di destê rastî de kaşêkew veng bi telê û siyanê bereqnayan bi. Semedo ko kaş nizdî qereqole bi, dewicî zêde ver bi uca nêşîne.

*

Sebro û Fatê şanê Homay ra di verê mengeney titûnî de ronişte demetê titûnî hazir kerdêne. Serê sibay go Sebro bişîne şaristan. Fatê ra va »hema piyasey titûnî nêbiyo a, eger ez enka titûn berî û biroşî go pereyêkew baş bikewo destê min.« Titûn pel bi pel kerdêne pak, damarî tera antêne û kerdêne demet.

Îne davîst cema titûn kerd pak. Sebroy her raye çar cemey titûn dekerdêne kozikê mengenî. Raşt a karê titûn û mengenekerdişê cê mesalayêka derg a. De ka titûnê qutiye dikandarê Çarşiyê Veyşnayî wa şima rê mesalay xu vaco:

”Toximê min wesarî di serê erdêkew zibilin de yeno eştiş. Badê ko ez ze şitil bena pîl, min bi kok ra ancenê û benê di miyanê bostanan û erdan de nanê ro. Badê çend efar û awdayîşan lemê min benê pîlî. Di hetê binî ra wexta ko deqê zerdî ginenê pelanê min ro hînî wext o ko min tera bikerê û semedê araqnayîşî berê di keye de bikerê binê çarşefan ko ez weş reng bedelnî, bibî zerd. Dimacû min bi layan an şerîtan ra kenê û semedê vişkkerdişî danê vera tîcî. Wexta ko ez bena vişk min di cayêkew hutin de nanê ro; heya payîzî ez weş bena nerm û a çaxî bi gorê renganê min ê bedelnayeyan min yewbînan ra ciya ciya demet kenê. Enka zî ez semedê mengenekerdişî di verê karde Sebroy de wa. Yo ko min mengene keno eger yewo jêhatî bo ez zey porê keynanê kejan bena zerd û derg. Min zehf rayan şinawito ko tanî merdiman vato, »merdim wazeno ko enî titûnî boro.« Eger ez rehîrê şaristanî ra destê cendiman ra û di şaristan de zî

destê qolçiyan ra xilas bibî, ez di Çarşiya Veyşnayî de yena rotiş... Ena ray dikandaro erînayox, ti vanê qey ê bi xu ez xuliqnawa; bi qutiye xu min taneka xu ra veceno û dano embazanê xu...”

Dewicî ne bi vengê melay ne zî bi vengê dîkan şiyar bî di ay şefeqî de; bekçiyê dewe banan ser o geyrayne û fermane qumandarî bi vengê xu yê hewninî dewican rê eşkera kerdêne. Dewicê ko serê sibay rew şîne erdanê xu ser, karê xu ser û ay ko hayiya îne ferman ra çinîbî; an zî waştêne xu di teberê dewe de bilimnê, bi destê eskeranê ko dormarê dewe girotbi hameyne tepiştiş û komkerdiş; peynî de heme xort û camêrdê dewe, bi weşî an zor verê qereqole de kom bî.

Sebro cendirman reyre û di serê polê yê de mengene û çuwalêke titûn ver bi qereqole hameyne. Cendirman we raşteraşt berd barê qumandarê xu. Qumandarî bi şiva destê xu mengene mocna û va »eno çi yo?« Sebroy va »eno mengeney titûn werdîkerdişî yo.« Di verê qereqole de, di verê çimanê heminan de qumandarî biney titûn bi Sebroy da werdîkerdiş. Dimacû qumandarî dî ko raşt o, îşaretê yê ser ra cendirman bi nuskidayîş û paskilan Sebro zî berd miyanê dewicanê bînan.

Qumandar hame û dewican ver de vindert û gefî vendî va »şima ra yewî emşo tifîng banê Çawîşî ra nawo. Ka vacê şima kamî ana kerdo? Eger şima nêvacê ez go ana bikerî ko şima poşman bibê ko şima day xu ra biyê.« Wit dewican ra nêveciya. Heme zey telebanê mektebe rêz bîbî. Qumandar, di dest de şivêka barî, dewican ver ro şîne hameyne. Bêvengiya dewican ew yewrey hêrs kerdêne û ê bi şiva xu dayne binê çeney dewican ro, persê xu tekrar kerdêne.

Dewicî bêveng bî... Qumandarî emir da eskeranê xu, va: »Xu rê çiwanê başan peyda bikerê û enî heran ra kewtan biney talîm bikerê.« Eskeran hewşanê nizdî qereqole ra çiway zixmî ardî û bi emrê »marş”î verê dewican şa ay kaşê kişta qereqole. Dewicî vazdayne û eskeran zî pey ra, nêvatêne sere wo, paştî ya û mil o, dayne îne ro. Dilşad û çend merdimanê bînan ê ko waşt qise bikerê an zî qarşî zilmî bêrê, hemine zêdetir kutiş û derbî werdî. Eskeran her rey rêzêke dewicî dayne verniye xu û ê »talîm« kerdêne. Wexta ko tanî eskerî bîne rincan tanî bînan cay îne girotêne. Serê sibay ra heya wextê nimacê teştarî dewicê ko di verê Qereqole de kutiş nêwerd nêmend... Wexta ko eskerî dewe ra şî bêvengiyêka bi dec û nefret xu dewe ro pişt...

Dilşad zî di miyan de, zehf tenî bi rocan, tanî zî bi hefteyan di miyanê nivînan de mendî...

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Epîlog - Gozêre

Ez hema zî etya wa; di dewa xu de di serê erdê xu de wa; min bi kokê xu di binê dewe de ristim dawo; ez di serê erdî de bi hêz û heybet a. Bi kankilanê xu weşiya zera tûtan a. Bi heme dec, jan, weşî û nêweşiyanê xu ez etya wa. Bi emr a, kal biya. Dostanê min yê dewicanê ena dewe ra zehf şî rehmet. Torinê îne, torinê torinanê îne hamey û şî; zilm bi îne bi; veyşan mendî, pêlê zilmî îne ro wiştî we; adir û tofanan xu li bananê îne pişt. Bi koyan kewtî, di şikeftan de, di dol û newalan de mendî...

Destê yewbînan girot û hamey; reyna kişta min de ronîştî; bi kul û keder axî antî... Nêzana reye çendine banê xu newe ra viraştî; bi destanê xu yê terkayeyan sî nay sîyan ser, heyatêkew newe na ro; toximê heyatêkew newe ramit...

06.06.1995